BERBANG

KOVARA FEDERASYONA KOMELÊN KURDISTANÊ LI SWEDÊ



DR. QASIMLO HAT KUŞTIN

BERBANG

Organ för Kurdiska Riksförbundet
Kovara Federasyona Komelên Kurdistanê
li Swêdê

Ansvarigutgivare/Berpirsîyar:
Keya İzol

Şefredaktor:
Dara Reşid

Redaksiyon/Redaktion
Asî Rabbatî, Aso Germîyanî,
Xelîl Dihokî, M. Mayî,
Mirhem Yigit, N. Kirîv
S. Rêving

Sättning och layout:
Bavê Rojbîn, N. Kirîv

Adress:
Box 45205
S-104 30 Stockholm
Telefon: 08/668 60 60

Postgiro: 64 38 80-8

Abonetî/Prenumeration
Kes/Enskilda: 100 Skr./Sal-år
*Meqam/Myndigheter:*200 Skr./Sal7år

Îlan/Anons
Rûpelên navîn/Insidor: 1000 Skr.

Redaksîyon ne berpirsîyara nivîsarên bi îmze an nivîs û gotinên Federayonê ye. Nivîsarên ku ji Berbangê re tên şandin, heke çap jî nebin, li xwedî nayên vegerandin.

ISSN-0281-5699

Sal: 8, Hejmar: 6/89 (59)
Tebax - 1989

Författares Bokmaskin
Stockholm

NAVEROK

Beşa Kurmancî ..... **Rûpel**
Dr. Qasimlo hat kuştin 3
Kurdên Sovyetistanê doza mafên xwe dikin, Bavê Nazê 4
Rewşa kurdan li Azerbêcana Sovyetê, Prof. Şakiro Xido Mihoyî 5
Cezayê muebed ji bo Christer Pettersson 8
Hevpeyvîn bi Noşîrwan Mustefa re 9
Strana kurdî, M. Ezîz Zekî 14
Qaçaxo Silo (Strana folklorî) 16
Rewşa kurdan li welatên îskandînavî, Omer Şexmus 17
Rewşa kurdan li Hollandayê, Baran 19
Rewşa kurdan li Elmanya Rojava, 'Eli Tuko 20
Sê gotin ji ferhenga rastîyê (helbest), H. Hirorî 21
Tirşik 22
Berbanga me 24
Ji çîya agir dibare (Çîrok), Lokman Polat 26

Beşa Zazakî (Dimilkî)
Zerencî (Deyîr) 27
Way û Bira, O. Wedat Kaymak 28
Surgun, Diloyo Dêrsimic 29
Înikê Axirmatî 30

"DÎROK DUBARE DIBE"

Di roja 13.07.1989'an de sekreterê giştî yê Partîya Demokrat a Kurdistana Îranê; Ebdulrehman Qasimlo, endamê komîta merkezî ya P.D.K.Î Ebdulla Qadirî û Dr. Fazil Resûl li Vîyanayê hatin kuştin.

Di sedsala 18'an de Mihemed Paşayê Kor, berî niha bi 59 salan Simkoyê Şikak û 51 salan Seyîd Riza û di sala 1947'an de jî Qazî Mihemed bi destên dijminên kurdan, bi bêbextî hatibûn kuştin. Bê guman wê ji nav gelê kurd Simko, Riza, Qazî û Qasimloyên nû derkevin. Lê şik tuneye ku kuştina serokên tevgerekê yek ji mezintirîn darbeyan e bo wê tevgerê. Û xuya ye ku di vî warî de rawestandina "dubarekirina" dîrokê yek ji giringtirîn erkên li pêşîya gelê kurd e.

Di roja 19.08.1989'an de wê li Stokholmê li dijî rejîma terorîst a Îranê meşek bêt çêkirin. Em ê di hejmara bê de hem li ser jîyan û xebata sîyasî ya Qasimlo û hem jî li ser meşa bêt çekirin, binivîsin.

Di vê hejmarê de Pr. Şakiro li ser rewşa kurdên li Azerbêcanê dinivîse. Berbang ji bo xwendevanên xwe bi Noşîrwan Mustefa re li ser Kurdistana Îraqê peyivî. Her weha Omer Şêxmûs li ser rewşa kurdên li Îskandînavyayê, Baran li ser rewşa kurdên li Hollandayê, 'Elî Tuko jî li ser rewşa kurdên li Elmanya Rojava lêkolînên xwe pêşkêşî xwendevanan dikin. Xwendevanên me dikarin lêkolîna M. Ezîz Zekî ya li ser strana kurdî di nav rûpelên vê hejmarê de bixwînin.

Di beşa Kurmancîya Xwarê de hevpeyvînek bi Noşîrwan Mustefa û heypeyvînek bi Welîd Canpolat re cî digre. Mahabad Kurdî nivîsarek li ser pirtûka M. Emîn Zekî Beg ya bi navê "Du Hewldanên Bê Sûd" nivîsîyê. Her weha nama kurdên penaber ên li Pakistanê di nav rûpelên beşa Kurmancîya Xwarê de ye.

Hêvîya me ji xwendevanên hêja ew e ku rewşa aborî ya Berbangê bînin pêş çavên xwe û abonetîya xwe ya sala 1989'an bişînin.

Bi silavên germ.

Redaksîyon

www.arsivakurdi.org

DR. QASIMLO HAT KUŞTIN

Di roja 13.07.1989'an de têkoşerê mezin, sekreterê giştî yê Partîya Demokrat A Kurdistana Îranê: Dr. Ebdulrehman Qasimlo û hevalê xebatkar, endamê Komîta Merkezî ya Partîya Demokrat A Kurdistana Îranê, berpirsê P.D.K.Î li derveyî welêt: 'Ebdulla Qadirî li bajarê Wîyana, bi destê dijminên gelê kurd, bi bêbextî hatin şehîdkirin.

Dr. Ebdulrehman Qasimlo di sala 1930'an de li Kurdistana Îranê, li bajarê Ûrmîye tê dinê. Xwendina xwe ya destpêkî û navendî li Ûrmîyê û Tehranê bi dawî tîne, sala 1948'an ji bo xwendina bilind diçe Parîsê û ji wir jî diçe Çekoslavakyayê û li Unîwersîta Pragê, beşa Zanista Civakî û Sîyasî dixwîne. Qasimlo sala 1952'an vedigere Kurdistanê û piştî 5 salên xebat û têkoşîne car din diçe Çekoslavakyayê. Di sala 1962'an de li Unîwersîta Pragê doktora Zanista Aborî werdigre û heta sala 1970'an li Unîwersîta Pragê li ser aborîya sosyalîzm û aborîya kapîtalîzmê dersan dide. Her di vê salê de ji bo rêxistin û geşkirina xebata gelê kurd li Kurdistana Îranê, vedigere Kurdistanê. Dr. Ebdulrehman Qasimlo di navbera salên 1976 û 1978'an de li Parîsê, li Unîwersîta Sorbonê di beşa Ziman û Şaristanîya Kurdî de dixebite û di sala 1979'an de car din vedigere Kurdistanê û heta roja şehîdbûna xwe li çîyayên Kurdistanê, li dijî rejîma kevneperest a îslamî têdikoşe. Dr. Qasimlo di sala 1945'an de dest bi xebata sîyasî dike. Paş çend salan li Ûrmîyê bi serokatî û xebata wî Yekîtîya Xortên Demokrat ên Kurdistanê tê damezirandin. Di sala 1970'an de ji bo pêşxistina xebatê bi çend hevalên xwe re program û destûr û niqtên giring yên stratejî û taktîkên P.D.K.Î. amade kirin. Dr. Qasimlo di sala 1973'an, di 3. kongra Partîya Demokrat a Kurdistana Îranê de ji bo sekreterîya partîyê têt hilbijartin. Ji wê salê heta şehîdbûna xwe, Qasimlo di hemû kongrên partîyê de ji bo endametîya Komîta Merkezî ya partîyê û paşê jî ji bo sekreterîya giştî ya partîyê têt hilbijartin.

Dr. Ebdulrehman Qasimlo di hevpeyvîneke xwe de weha digot: " Gelê ku ji bo azadîyê bitêkoşe, divê bihayê wê azadîyê jî bide. Çi milet bê zehmetî û têkoşîn, bê fedakarî, bêyî qurbankirina lawên xwe, negihiştîye azadîyê. Gelê kurd jî ji mêj e dizane ku azadî: fedakarî dixwaze, xwegorîkirin dixwaze. Karwanê şehîdên me dirêj e û wê hîn dirêjtir jî bibe. Lê me ji mêj e biryara xwe daye ku em di rojên şehîdbûna şehîdên xwe de, di rojên bîranînên wan de, negirîn. Me biryar daye ku bi tenê û bi tenê riya wan bidomînin ku li pêş çav û bîrên wan şermizar nebin. Weke wan xebata xwe bibin serî. Ji çi nexweşî û probleman netirsin, xwe ji çi zehmetîyan nedin paş. Xebata me, xebateke bi heq e; xebata azadîya miletekî ye. Xebatek e ji bo paşeroja nifşên din. Eger nifşê me wezîfa xwe bi çakî bi cih bîne, em ê piştrast bibin ku nifşên bên wê bê şehîd bin."



Dr. Qasimlo: Ez ji sîyasetê hez nakim. Lê ji ber ku ez kurd im, bi sîyasetê mijûl dibim.

XUSARETEKE MEZIN JI BO TEVGERA RIZGARÎXWAZ A KURD

Di roja 13.07.1289'an de têkoşerê serbilind, sekreterê Partîya Demokrat a Kurdistana Îran, Dr. Ebdulrehman Qasimlo û xebatkarê mezin, endamê Komîta Merkezî a PDKÎ, berpirsê rêxistina PDKÎ li derveyî welêt Ebdulla Qadirî bi destê dijminên gelê kurd li bajarê Wîyana hatin şehîdkirin.

Eşkere ye ku şehîdbûna Dr. Qasimlo û Ebdulla Qadirî bo tevgera rizgarîxwaz a kurd li her çar perçên Kurdistanê û bi taybetî li Kurdistana Îranê xusareteke pir mezin e .

Dr. Qasimlo hîn ji xortanîya xwe dest bi xebata sîyasî kir. Di kongra 3. a Partîya Demokrat a Kurdistana Îranê de (Îlon 1973) bo sekreterîya giştî ya partîyê hat hilbijartin û bi salan bêwestan beşdarî doz û xebata rewa ya gelê kurd kir.

Dr. Qasimlo ne bi tenê rêberekî sîyasî, lê yek jî zana û entelektuelên gelê kurd jî bû.

Berî hilweşîyana paşatîya li Îran bi çar mehan, Dr. Qasimlo vegerîya Kurdistanê. Di van 10 salên bûrî de di organîzekirina xebata sîyasî û çekdarî ya gelê kurd de Dr. Qasimlo xwedîyê rolekî serekî bû. Dr. Qasimlo, Partîya Demokrat a Kurdistana Îranê û gelê kurd li Îranê tevî jidestçûna bi hezaran kes, malwêranî, derbederî û bi destê rejîma Cumhurî Îslam mîlîterîzekirina Kurdistanê, bi mêrane li ber xwe dan.

Bi şehîdbûna Dr. Ebdulrehman Qasimlo û Ebdulla Qadirî em serxweşîyê radigihînin binemal û dostên şehîdan, endam û tagirên Partîya Demokrat a Kurdistana Îranê û xema xwe ya mezin dîyar dikin.

Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê

www.arsivkurdi.org

Kurdên Sovyetistanê Doza Mafên Xwe Dikin

Bavê Nazê-Moskova

*** Nîvê dawî ji meha gulanê, bi sedan kurdên sowyetî ji hemû komarên ku lê dijîn, berê xwe dan paytextê Yekîtîya Sovyet, Moskova, daku daxwazên xwe pêşkêşî berpirsîyarên dewletê bikin.**



Kurdên Sovyetê, 20'ê gulanê, roja şemîyê ji Meydana Pûşkîn dest bi meşa xwe kirin. Ji vir berê xwe dan Meydana Sor û qevdên gula danîn ser gora Leşkerê Nenas û gora Lenîn. Di 21'ê gulanê de kurdan ji Parka Îzmaîl dest bi meşa xwe kirin. Li cihê meşê Telewizyona Sovyetê hevpeyvîn bi nûnerên kurdan re çêkir û wê êvarê di qenalê "Moskow, êvara te xweş be" de pêşkêşî temaşevanan kir.

Gelo çima piştî ewqas salên bêdengîyê, kurdên me ji nişkê ve dest birin xwe û qala zordestîya li ser xwe kirin? Helbet çi şik tê de nîne ku rewşa nuh ya demokrasîya li Sovyetê rola yekemîn dilîze. Lê rewşa kurdan ya xirab ne kêmî vî tiştî dihêle ku ew xwe bixurcilînin û doza mafên xwe bikin. Û cara pêşî jî ji bo gihiştina armanca xwe, Kurdên sovyetî rêxistinek bi navê "Yekbûn" damezirandin.

Roja îro em pê dizanin ku kurdan di salên 20'î de herêma xwe ya otonomîyê hebûn. Û em pê dizanin ku piştî demekê ev maf ji wan hat stendin û di salên 1937 û 1944'an de kurd bi darê zorê ji cihên xwe hatin rakirin û li komarên Asya Navîn hatin belavkirin. Îro desthilatên van komaran ji kurdan dixwazin ku ew ji welatên wan bar bikin. Û mixabin li cîna qewirandina kurdan dest pê kirîye jî. Ji ber van sedeman nûnerên Kurdan ji hukûmeta Sowyetê xwestin ku:

1- Parastina jîyana kurdan

2- Bicihkirina Kurdan li herêma wan ya ku sala 1923'an hatibû avakirin, an jî komkirina wan li cihekî wek navça Kirasnedarê.

Ev her du daxwaz jî li ser zimanê nûnerê kurdan, Eqîdê Milîşya Wekîl hatin gotin. Bi bawerîya wî, bi riya komkirina kurdan li cihekî dê gelek problem bêne çareserkirin.

Di civîn û meşa kurdên Sovyetê de gelek Kurdên sowyetî yên bi navûdeng peyivîn ku akademik N.Nadirov, helbestvan Elîyê Ebdulrehman, Tosinê Reşîd hin ji wan bûn. Bi navê Kurdên welêt Dr. Nasîhe Xefûr peyivî. Li jêr gotina nûnera jinên kurd Gurçeka Mihemed:

"Gelî hevalên hêja.

Ez ji Qirqizîyayê hatime. Cihê ku ez lê dijîm, nêzî 10 hezar kurd hene û ji wan 6000 jin in. Wan ji min xwestin ku ez ji we re li ser jîyana wan a sext û dijwar bipeyivim.

Bixwe hûn pê dizanin ku em bi fermana Stalîn, di salên 1937 û 1944'an de ji warên xwe hatin rakirin û li komarên Asya Navîn û li Kazaxistanê hatin belavkirin. Hingê, li cihên nuh, di malên xwe de em di bin kontrola desthilata cî de diman. Xelkê rastîya qewirandina me nedizanî û ji ber vê yekê jî wan bi çavên dijminan li me dinêrîn. Di nêrîna wan de em "dijminên gel" bûn.(1) Ev muhra bêrûmetîyê heya niha jî ji me neçûye.

Di vir de pirsek tê kirin; di rewşek weha de keça kurd dikarîbû bixwenda? Heger wê nikarîbû bixwenda wê çilo bikaribîya beşdarî xebata sîyasî bibe? Bi windakirina mafên sîyasî, me mafên însanî yên herî biçûk jî winda kir. Jinên cihanê hemû ji zarokên xwe re çîrok û destana li ser qehremanên milletê xwe dixwînin an dibêjin. Wan bi gîyanê wan xwedî dikin. Lê qehremanên me bûne yên xelkê û em ji vê şahîyê jî bêpar mane. Lê belê ne tenê qehremanên me ji me stendin, her weha kultura me jî birine. Di rewşek wilo de xwedîkirina zarokan dijwar e. Em nikarin bi gîyanê hezkirina gel û welatê xwe zarokên xwe perwerde bikin. Lewra jî em li ber xwe dikevin û em şerm dikin ku em "kurd" ji diya xwe bûne. Bi bawerîya me li cihanê kes wek jina kurd bê maf nîne.

Me zarokên xwe li malê hiştin û em hatin Mosko da ku em dengê xwe bigihînin we. Em hatin û hêvîya me ev e ku moskoyî dê bi êşa dilê me bihesin. Mane em jî wek hemû kesan mirov in û xwedî heysîyet in. Roja îro, li gel van qiriktalîyan, rewşa me li cihên ku em lê dijîn ne xweş dibe û xeter tê ser jîyana me. Em ji pêşeroja zarokên xwe pir ditirsin. Destê me li ser dilê me ye, ji ber ku ew dikarin bibin qurbanên hin kesên ekstrîmîst.

www.arsivakurd.org

Rewşa Kurdan Li Azerbêcana Sovyetê

Prof. Şakiro Xido Mihoyî



navê Piştî 60 salan Rûniştvanên Azerbêcanê, Bakû, 1982, r. 55 binêrin.)

Bixwe rewşa kurdên Azerbêcanê, ji mêj ve, çi li cem me û çi ji der ve di nav bisporên dîroknivîs ên etnografî û bisporên pirsa netewî de, bûye meydana lêkolîn û nîqaşan.

Problêm ne tenê windabûna mafên netewî yên rûniştvanên kurdan e. Lê pirs ew e ku ji sala 1979'an û vir de, resmîyen hate gotin ku kurd li vê komare nemane. Û vî tiştî hişt ku nerînên rengo-rengo peyda bibin...

Ji bo zelalkirina vê pirsê emê berê xwe bidin delîlên dîrokî. Li heremên Laçîn, Kelbajar, Kubatlîn û Zangîlanê kurd ji mej ve dijîn. Gelek rûniştvanên kurd beşdarîyek aktîf di biserketina şoreşa sosyalîzmê de kirin. Ji wana, yê herî bi nav û deng Cengiz Yildirim bû. Ew bi xwe xelkê Kubatlî ya herêma kurdan bû. Li gora hejmartina sala 1921'an, tenê li gundên li Azerbêcana sovyetî hejmar Kurdan 32.780 bû. (Xebata giştî ya Komîta gel a ZSFSR, Tiflîs, 1923, r.16) Sala 1926'an li Azerbêcanê hejmara wan gihişt 41 hezaran. (Li pirtûka K. B. Mamedov a bi

Temmûza sala 1923'an di eynî wexta ku Nagorne-Karabax wek otonomîyeke herêmî damezirî, Kurdistaneke Uyezd (mintiqe, qeymeqamî) jî tê danîn û Laçîn dibe navça wê. Ev dayîre (nivîskar bixwe ev peyv di teksta rûsî de bi kar anîye) Kerakuşlak, Kelbajar, Koturlî, Kubatlî, Kurd-Gacî û Muradxanlî bû. Li van dayîran rûniştvanên kurd ne wek hev belav bûbûn, lê tiştê mintiqe pê dihat nasên ew bû ku piranîya xelkê wê kurd bûn. Û ji ber vê yekê ev wehda îdarî ya Kurdan hate avakirin. Weha bû ku Kurdistankî Uyezd hat damezirandin, dema li Tirkîyê, Îranê û bi taybetî li Îraqê tevgera rizgarîxwaz a kurdî bi xurtî pêşde diçû. Pirsa kurdî ya netewî di rojeva hemû hevdîtinên navnetewî yên ku divyabû piştî şer aştîyê biparêzin, cihê xwe digirt. Ji bisporan re nama serokê tevgera rizgarîxwaz a kurdî li Kurdistana Îraqê, Mehmûd Berzencî bo Lenîn, belû ye. Wî ji bo têkoşîna li dij emperyalizma ingilîz daxwaza arîkarîyê dikir. Û bê guman di qada navnetewî de giringîya pirsa kurdî ya netewî hişt ku ne rolek kêm ji Kurdên Sowyetê re bêt dayîn. Di vî warî de îhtîmama V.I. Lenîn bo Kurdistanskêî Uyezd têt zanîn; Lenîn di birûska xwe de ya ku ji N. Narimanov re

Em li malên xwe cî ji xwe re nabînin, çinku roj nîne ku ji me re nebêjin; "Vegerin welatê xwe". Em jî berê xwe didin we û weke ku em bersiva wan didin, ji we re jî dibêjin: Ma emê bi kû de herin? "

Axaftina duyem ya kurdekî ji Azerbêcanê ye. Bixwe kurdên ji Azerbêcanê bi dirêjahî li ser dîroka "otonomîya xwe" peyivîn. Lê 'Adilê Cemîl (ji bajarê Laçîn) bi piranî li ser jîyana xwe peyivî. Jîyana wî jî weke jîyana hemû kurdan, perçek ji jîyana gelê wî bû.

Sala 1979'an gava di nifûsê de li ber navê 'Adilê Cemîl "azerbêcanî" tê nivîsîn, ew qebûl nake. Li gel 200 mirovan berê xwe didin Bakû û doz dikin ku navê netewa kurd li wan bêt kirin. Tevî ku 'Adilê Cemîl birîndar bû, lê her li ser ya xwe ma û hukûmeta azerbêcanî ji neçarî sala 1980' î ji biryara xwe vegerîya û 'Adilê Cemîl ji kesên pêşî bû ku li ber xana netewa wî "kurd" hate nivîsandin.

Dibe ji ber vê yekê heqê wî hebû ku di gotina xwe de bibêje:

"Em kurdên Azerbêcanê nemirine. Me nedixwest em dest ji navê xwe berdin, lê bi zorê, bêyî ku em bixwazin, navê netewa me "azerbêcanî" datanîn."

Bi rastî jî kurdên Azerbêcanê nemirine. Di hejmartina 1988'an de li gundên kurdan -ku hejmara wan ser 20 hezaran e- bi hev re gotin: "Em kurd in." Navên wan gundan jî ev in: Kemallê, Çiraqlê, Lenînekan, Katoz, Şeylanê, Axtolok, Mînkan, Zêrtê û.h.d.

'Adilê Cemîl bi qewîtîya diya xwe gotina xwe bi dawî anî:

"Kurê min here Moskov. Heger rast demokrasî heye, dê otonomîya me bidin me. Ger nedin me'na xwe perestroyka nîne û wê nema bawerî bi Lenîn û Gorbaçov bê." (2)

Bi rastî jî wekû dibêjin: "kêr gihaye hestî" û ji ber birîna wan, nema debara kurdên Sowyetê tê. Lê tevî weha jî hêvîya wan a ji bo pêşerojeke ron, nemirîye.

(1) Di dema Stalîn de kesê dihat girtin yan nefîkirin, navê "dijminê gel" lê dibû.

(2) Diya 'Adilê Cemîl sala 1920'an dema ku kurd xwedî otonomî bûn, bi zimanê kurdî xwendîye.

www.arsivakurdi.org

şandibû, dibêje: "...Ji birçîyên Povolciyê û Kurdistanê re 40 milyon arîkarî bikin." (V.I. Lenîn, Berhemên Kamil, cildê 4'an, weşana 3'an, r.100) V.I. Lenîn ne bi tenê carekê guhdarîya rewşa kurdan ya wê dema dijwar kiribû. Ev tişt wek nimûne ji bîranînên bolşevîkê kevin, nivîskarê kurd Ereb Şamilov jî xuya dibe ku bi Lenîn re rûniştibû.

Destpêka nîvê dawî ji salên bîstan, sîyaseta li gel rûniştvanên kurd li Azerbêcanê dest bi guherînê dike. Dibe ku ev sîyaset û ne bê bingeh e, bi asoya problema kurdî ya li Tirkîyê ve girêdayî be. Wekû em pê dizanin, di salên 1925-1927'an de Mustefa Kemal û rejîma xwe li Tirkîyayê tevgera rizgarîxwaz a kurdî di nav xwînê de gevizand. Sozên ku di destpêka salên bîstî de hatibûn dayîn, ku "mafên kurdan ên netewî wê bên parastin", "Tirkîye welatê kurd û tirkan e" û sozên din jî hemû li ber bê çûn. Û desthilata Tirkîyê bi temametî da ser riya sirgûna etnosa kurd. Giring e bête gotin ku tiştê hatî serê kurdan û niha li Cumhurîya Tirkîyê tê serê wan, nayên wesif dan. Kuştina kurdan bi sedhezaran, talankirin û wêrankirina malên wan, tesfîya serokên tevgera demokratî-netewî ya kurdan di navbera demekê û demekê de bidarvekirina bi dehan têkoşerên kurd ên mêrxas ku ji bo rizgarîya gelê xwe xebatê dikin, bûne dîyardeyên (zahîre) normal ya jîyana Tirkîye a serdema nû. Mixabin em mecbûr in tesbît bikin ku hemû kirinên Kemal û kemalîyan, ne ku ji alîyê azerbêcanîyên tirknas ve nayên rexnekirin, lê belê hetta nayên qalkirin jî. Ew li ser tiştên ku bi kurdên Tirkîyê ve girêdayê be, deng nakin. Me lêkolînek û heya gotarek jî nîne ku tê de di pirsa netewî de rexne li kemalîyan hatibe girtin. Ev tiştên he hemû welê dikin ku em bifikirin ku li Azerbêcanê kerekterê sîyaseta li gel kurdan ne wilo lêhatin bû. De emê binêrin li Azerbêcanê çi bi serê kurdan hatibû: Sala 1930'an ji ber veqetandina îdarî, hemû dayîrên uyezdî ji hev hatin xistin û forma Okruge (muqate, iqlîm) hate stendin. Bi vî awayî Kurdistanskî Uyezd bû Kurdistanskî Okrug. Û di eynî salê de jî ew jî sivik kirin û bi vî rengî sîyaseta asîmîleya kurdan bi darê kotekê û înkarkirina mafên wan yên netewî li Azerbêcanê dest pê kir. Her weha Kurdistanskî Okrug hate rakirin, lê ne bê kuryuz (pêkenîn, bûyereke kû bibe benîştê henekpêkirinê), ji ber ku organa vê wehda îdarî ya bi navekî ne bê me'ne "Kurdistana Sowyetî" heya sala 1961'an jî weşana xwe didomand. Sîyaseta nedîtina mafên netewî yên rûniştvanên kurd karakterekî medrûs û berdewamî stend. Piştî wêrankirina iqlîmê kurdî, derîyên jêderên çandî yên netewî hatin girtin. Mamostatîya zimanê kurdî li cihên kurdan hate qedexekirin û weşanên pirtûkên kurdî yên hînbûnê û hemû pirtûkên bi zimanê kurdî êdî nema riyên xwe di çapxanan de dîtin. Piştî van tiştan, peyva li ser amadekirina kadroyên kurd ne mumkun bû. Li vir li ser problema kurdan li Tirkîyê peyva memûrekî tirk têt bîran. Li ser pirsa korespondentekî ewrûpî ku dipirse : "çito hûn dikarin roj li nîvro înkara heyîna vê hejmara pir a Kurdan li Tirkîyê bikin?" Ewî got: "Heger em qebûl bikin, ku kurd wek etnosek serbixwe li Tirkîyê hene, wê çaxê yekser wê pirsa mafên wan bêt kirin, ji bo ku em xwe ji ber vî tiştî bidin alî, em wek etnosek serbixwe înkara heyîna kurdan dikin. Pêla kurd nebin, wê çawa qala mafên wan hebe". Li Azerbêcanê ji bona ku xwe ji ber mafên rûniştvanên kurd bidin alî, bi awakî bê wucdanî tezwîra hejmara wan kirin. Armanc ber bi çav e: rûniştvanên kurd tunene, lêxa ne mumkun e ku peyv bêt ser mafên wan. Em ê bala we bikşînin ser malûmatên statîstîkan; Di eynî wexta ku li Azerbêcanê bi awayekî normal hejmara azerbêcanîyan zêde dibe, berevajî li gor hejmartinên resmî hejmara kurdan kêm dibe. Wek nimûne di sala 1926'an de 41 hezar kurd li Azerbêcanê hebûn û ji sedî 1,8 bûn ji hejmara komarê, ew di sala 1939'an de "bûn" 6 hezar (ji sedî 0,2) û di sala 1959'an de "man" 1500 kes û di sala 1970'an de "bûn" 5500 û li gor hejmartina sala 1979'an jî kurd li Azerbêcanê neman. Ev bû dînamîka seyr a "pirbûna" kurdan li vê komarê. Lê zêdebûna kurdan a heqîqî ya navça kurdan eger ji azerbêcanîyan ne pitir be jê ne kêmtir e jî, ji ber ku piranîya kurdan li qeseban dijîn. Îro hejmara kurdan li Azerbêcanê ne mumkun e kêmî 250.000'an be. Bi vî awayî em dikarin bibêjin ku kurd di rastîyê de li Azerbêcanê bi sedhezaran in, lê resmîyen nînin.

Di salên koletîya ferd û "zastoya" de (peyva "zastoya" bi rûsî ye û bi me'na cimûd, bê pêşketin, wek xwe mayî têt bi kar anîn) kêm qala rewşa kurdan li Azerbêcanê dibû. Di salên dawî de, di rewşa "glasnost" û rexnekirina kêmasîyên berê de pirsa rewşa kurdan li Azerbêcanê ji bo munaqeşê bû babetek fireh. Ji ber vî tiştî hin kesên resmî û xebatkerên zanistîyê yên azerbêcanî muhawele dikin ku bingehekî "objektîf" bidin tiştê ku bi serê kurdan hatîye. Li gor ku ew dibêjin ev "asîmîlasyona bi îrada xwe bû". (Pêwîst e bête gotin ku di hin zirûfan de asîmîlasyona bi xwe li hinek deveran çêbû, lê "asîmîlasyona bi îrada xwe" termînek ne di cih de ye û destkir e). Nêrîna din ya li ser "windabûna Kurdan" li Azerbêcanê, enteresant e û balkêş e. Ev nêrîn li ser zimanê berpirsîyarê beşa Komîta Merkezî ya Partîya Komunist a Azerbêcanê, Dastamîrov hatibû gotin. Wî bixwe li xanîyê 'aliman, li Moskoyê, li ser pirsa çilo kurd ji nişkê ve li Azerbêcanê neman, "ravekirinek 'ilmî" û nû pêşkêş kir. Li gora wê yekê "kurd û azerbêcanî misilman in û xwedî bawerîyekê ne û ev tişt bû sedemê bingehîn ku yên pêşî asîmîle bûn." Tiştê balkêş ev e ku kesên resmî yên Azerbêcanê û 'alimên wê di nehîna "windabûna kurdan" de di yek nêrînê de ne. Ev çareserkirin bi wîraset, ji serokekî azerbêcanî digihe yê din û çi guherîn ji dema Mîr Cafer Bakirof heya bigihe K. Bagirov çênebûne. Di sîyaseta netewî de çewtî û teşwîhkirin li Azerbêcanê çi cara nehat rexnekirin.

Heya kîjan derecê ev "ravekirina" sedema "windakirina" kurdan ku li jor hate gotin rast e û objektîf e? Rastî û ne rastîya van tiştan ji delîlên ku niha em bînin, wê xuya bibe. Berî her tiştî, bê hemdî xwe mirov rewşa kurdên li Azerbêcanê dide ber rewşa birayên wan yên li komarên cîran; Ermenistan û Gurcistanê. Bi çi rengî kurdên Azerbêcanê hatin "asîmîlekirin" û li Ermenistan û Gurcistanê tiştekî weha nebû, li gel ku ew ji yên Azerbêcanê kêmtir bûn? Mane ew komarên cîran in û xwedîyên yek sîstemê ne. Çawa eynî etnos di haletekî (li Azerbêcanê) de û di hundirê çend salan de "asîmîle bûn" û di haletekî din de (li Ermenistan û

Gurcistanê) berevajî hejmara wan bi çend qatan zêde bû? Takîdên ku delîlên konfesiyanalnî bingehên wê ne, ji ber du sedeman xwe li ber rexnan nagirin. Ya yekem çilo û çima di şertên sosyalizmê de fektên dînî dibin bingeh ji bo asimilekirina gelekî ji alîyê gelekî din? Heger em bidin ser şopa "mantiqê" Daştamîrov, divîyabû fektên dînî-îslamî li Azerbêcanê, berî hatina desthilata sovyetî, zûtir û aktîftir rola xwe bilîsta. Lê tiştekî welê nebû. Ji bilî vî tiştî, li welatên ku kurd lê dijîn; gelên zordest; tirk, faris, ereb bixwe musilman in, lê kurd ji ber vê yekê winda nebûn. Ya diwem eger welê be jî, çima ev tişt li komarên din neqewimîn, li gel ku kurd û gelên cî musilman in? (Tacikistan, Ozbekistan, Kazaxistan) Û ya dawî,nabe em hesabê mamentek berbiçav ya ku ronahîyê bera ser rewşa kurdên li Azerbêcanê dide, nekin? Em ê dîsa bibêjin ku bila weha be; ku kurd asîmîle bûn û ji ber "sedemên objektîk" û bi awayekî "normal" derîyên jêderên çanda netewî hatin girtin. Lê qet nakeve serê mirovan ku li Azerbêcanê ne bi riya tezwîrê û darê kotekê hejmara kurdan kêm nekiribin. Mane hîn li destpêka salên 30'î, bi gotineke din, hîn dema ku kurd negihabûn "bi îrada xwe asîmîle bibin", tezwîra hejmara wan bû.

Bi vî rengî tê xuyakirin ku li Azerbêcanê sîyaseta asîmîlekirina kurdan, bi darê zorê çêdibû. Lewleb û wesîla vê sîyasetê planên pir û rengo-rengo ne. Û hinek ji wan xuya û berbiçav in;

a- Ji bo asîmîla kurdan,desthilatê bi awayekî aktîf propaganda dîn dikir û dike. Tebeiya kurd û azerbêcanîyan ji yek bîrewerî re hate bikaranîn ku ew yek etnos in. Ev polîtîka he li gundan hat gerandin. Bi zanîn tebeiya etnosî bi ya dînî dihat guhertin.

b- Ji bo cîgirtina kar û pêşketina di wezîfê de, hoyên bingehîn ew bûn ku kurd xwe ji netewa azerbêcanî bihesibînin. Xweş dîyar e ku dema kurdekî wezîfeke bilind digirt, yan derecek ilmî bidanê, pêwîst bû ku wî di xana netewa pasaporta xwe de "azerbêcanî" binivîsanda.

c- Delîl di destê me de hene ku em bibêjin ku "sîyaseta kurdî" li ba hukûmetên azerbêcanî yên şovênî, mûtabiq bû bi sîyaseta li ser kurdan ya li Tirkîyê. Em ne tenê ji sîyaseta hukûmetên vir



Kurdên Sovyetê îro doza mafên xwe dikin: Gelo perestroyka wê kengî destê xwe dirêjî kurdên Sovyetê bike?

yan wir vî tiştî dibêjin, her weha ji yekîtîya form û awayên di tezwîra kurdan de ev bawerî ji me re çêdibe. Û carna welê dibe ku her tişt bi form û naveroka xwe ve çilo li Tirkîyê diqewime, wilo li Azerbêcanê diqewime. Bo nimûne helbestvanê kurd yê herî mezin, yê sedsala 17'an Ehmedê Xanî ku berhemên xwe bi tenê bi kurdî dinivîsand û rêzek bi tenê jî bi tirkî nenivîsandîye. Û nivîskarê azerbêcanî A. Huseynov, Ehmedê Xanî dike "helbestvanê kurdî-tirkî". (A. Huseynov. "Jîyan û Qehremanî". Mosko, 1987) Pirtûka Z. Bunûnyato, "Jinên Serok yên Rojhilata Îslamê" rastîya ku kes gotinê nayne ser (ji bilî nivîskarên tirk yên burjuwazî), ew diguhere. Ew bi destdirêjahî eşîrên kurd "Şikakan", "Ruzakî" û malbata Şeddadî ya kurd dike azerbêcanî. 'Alimên kurd ên bi navûdeng, şexsîyetên sîyasî, lehengên Yekîtîya Sowyetistanê û lehengên karê sosyalizmê, hemûyan bê awarte bi "azerbêcanî" didin nasîn. Di vî warî de nimûna şoreşgerê kurd, beşdarê aktîf yê avakirina sosyalizmê Cengiz Yildirim tiştek ber bi çav e. Di wesîqên partîyê de û her weha Cengiz Yildirim bixwe di namên xwe de yên ku ji S. M. Kîrov û ji S. K. Orjnokidz re hinartibûn, xwe kurd dida xuyakirin. (L. Polonski, "Cengiz Yildirim", 1988, rûp. 232, 240, 247, 273). Li gel vê jî wî dikin azerbêcanî.

Di hundirê salên 60'î de li gel lêkolînên pir, beşa kurdî li Enstutuya Rojhilatnasîyê li Azerbêcanê hate rakirin. Tiştê herî pêşçav roja îro dîroknivîs û tirknasên azerbêcanî mujûlî hemû pirsên dîrokî û aborî li Tirkîya kevin û nû dibin, ji bilî pirsa netewî û bi taybetî jî ya kurdî. Hin pirsên tevgera rizgarîxwaz ya kurdî ya netewî têne teşwîhkirin. Ev tişt bi taybetî di qonaxa kemalîyan de li Tirkîyê bclû dibe. Em dibînin ku pêwîst e bête gotin ku sîyaseta asîmîlasyonê li Azerbêcanê bi plan diçû û bi kar dihat. Wek nimûne tat, talîş û lezgînî bi darê kotekê hatin asîmîlekirin. Ji bo danberhevîyê em ê bidin xuyakirin ku li Ermenistana Sovyetî û li Gurcistanê ne tenê terkîba netewî hat gûhûrîn, lê belê tê dîyarkirin ku hejmara netewên biçûk zêde dibe. (Wek kurd, asûrî, yewnanî, azerbêcanî.) Bi gotineke din ev yek berevajîya tiştê li Azerbêcanê ye.

Pirsa li ser rewşa etnosa netewî li Kurdistanskî Uyezd a ku berê hebû û rewşa kurdên li heremên din, ji bo lêkolînan babetên taybetî ne. Lê bi awayekî giştî, ji bo rewiştên vê rewşê divêt ev tişt bêne gotin. Em dikarin bibêjin ku kurdên li Azerbêcanê di van 10-15 salên dawî de xebata xwe ya ji bo stendina mafên netewî xurt dikin. Bê guman birek ji kurdên li Azerbêcanê di nav azerbêcanîyan de asîmîle bûne. Vî birî rewiştên xwe yên netewî winda kirine û ji jîyana kultura milletê xwe sar bûne. Lê belê birê bingehîn ji rûniştvanên kurdan dixwaze vegere dîroka xwe ya netewî, vegere kultur û edeba xwe. Pirên wan amade ne çanda xwe pêş bixin. Ev yek ji daxwazên wan yên ji desthilata azerbêcanî xuya dibe. Lê heta niha kesê guhdarîya wan nekirîye.

Wergerandina ji rûsî: **Bavê Nazê**

Di De'wa Palme de Mehkemê Biryar Da:

Cezayê Muebed ji bo Christer Pettersson

*** 27'ê tebaxa 1989'an Mehkema Stokholmê swêdîyekî bi navê Christer Pettersson, bi kuştina serokwezîrê kevin; Olof Palme gunehkar kir û cezayê muebed (hetahetayê) dayê.**

Di 16.12.1988'an de Christer Pettersson bi "şika kuştina Olof Palme" hatibû girtin.

Di 27'ê tebaxa 1989'an de Mehkema Stokholmê ku ji du hakim û şeş endamên jurîyê pêk hatibû, di biryara xwe ya dawî de Christir Pettersson - ku di çapemenîyên swêdî de bi navê kesê "41 salî", "42 salî" hatibû binavkirin - bi kuştina Olof Palme hat gunehbarkirin û mehkemê cezayê muebed dayê.

Lê biryar ne bi piranîya dengên endamên mehkemê hat stendin; her du hakim; Carl-Anton Spak û Mikael af Geijerstam "ji ber lawazîya delîlan" ji bo berdana Christer Pettersson deng dan. Lê her 6 endamên din dengên xwe di eleyhê wî de bi kar anîn. Li gor sîstema mehkemeyên Swêdê; mehkeme ji hakim - ku huqûq xwendine û endamên jurîyê - ku huqûq nexwendine û ji nav partîyên sîyasî tên hilbijartin - pêk têt. Di mehkema Christer Pettersson de her şeş endamên mehkemê, yên ku di eleyhê wî de deng dan tev endamên mehkemê ên huqûq nexwendî bûn. Ji ber vê yekê jî li Swêde di derheqê biryara mehkemê û hebûna kesên ne huqûqî di mehkeman de munaqeşeyek mezin çêbû û ev munaqeşe hîn jî dom dike. Ebûqatê Christer Petterson; Arne Liljeros, biryara mehkemê wek "nîv serketin" bi nav dike, ji ber ku her du hakiman ji bo berdana Christer Petterson deng dane. Her weha ebûqat Liljeros murace'ata mehkemeyek bilidtir (Hovrätt) kir, daku Christer Pettersson ji nû ve bêt mehkemekirin. Ev mehkeme (Hovrätt) ji 4 huqûqî û 3 endamên jurîyê pêk têt. Eger ev mehkeme jî Christer Pettersson gunehkar bibîne, bi îhtîmaleke mezin, mehkeme wê biçe, "Bilindtirîn Mehkeme" (Högsta Domstol) ku bi tenê ji huqûqîyan pêk têt.



Li gor anketa, ji 2/3 ji xelkê Swêde bawer nakin ku Christer Pettersson qatilê Olof Palme ye.

Mehkema Di "Hovrätt" ê de wê di 7'ê îlona 1989'an de dest pê bike.

Semînerek li ser rewşa Kurdistana Îraqê

Sekreterê Giştî yê Partîya Demokrat a Gelê Kurdistan û endamê sekreterîya Cebha Kurdistana Îraqê heval Samî Rehman bi serpereştîya Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê, di roja 29.07.1989'an de li Stockholmê li ser rewşa îro ya Kurdistana Îraqê semîrek da.

Samî Rahman di destpêka semînera xwe de bi awayekî fireh li ser rewşa Kurdistana Îraqê peyivî. Paşê bersîva pisîyarên guhdaran da. Piştî semînerê ji bo Berbangê, hevpeyvînek pê re hat çêkirin ku wê di hejmara bê de bêt belavkirin.

www.kurdiyakurdi.org

Hêja Kak Noşîrwan Mustefa, sekreterê Komela Rêncderanî Kurdistan ji bo beşdarîya18. kongra Enternasyonala Sosyalîst ku di rojên 20-22.6.1989'an de li Stockholmê çêbû, hatibû Swêdê. Di roja 27.6.1989'an de bi navê Berbangê em pê re peyivîn.

Noşîrwan Mustefa:

EM Ê TÊKOŞÎNA XWE BIDOMÎNIN

Berbang: Kak Noşîrwan! Bi xêr hatin bo Swêdê. Weke em dizanin, hûn bi navê Yekîtî Nîştimanî Kurdistan, beşdarî kongra 18. ya Enternasyonala Sosyalist bûn. Ji bo tevgera azadîxwaz a kurd qazancên vê kongrê çi bûn?

Noşîrwan Mustefa: Enternasyonala Sosyalist kongra xwe ya 18. di wê demê de çêkir, dema sed sal bi ser damezirandina vê rêxistinê derbas bû. Nêzî sed partîyên endam û mêvan beşdarî kongrê bûn. Em jî ji mêvanan bûn, çinkû em ne endam in. Ji partîyên endam, 17 partî li welatên xwe li ser hukum in û li hin welatên din jî partîyên duwemîn in û bi hêztirîn berhelistkar in û alternatîfa hukûmetê ne û dibe ku hukumî bigirin dest xwe.

Em weke tevgera rizgarîxwaz a miletê kurd, baş dibînin ku kurd bi her helketinê (munasebet) û di her kombûn û civînekê de bikare dengê xwe bigihîne xelkê, bikare bindestîya xwe, daxwazên xwe bigihîne guhên xelkê, ji bo ku bikare piştgirîya me'newî ya wan hêzan qazanc bike. Bi bawerîya me, ev karekî baş e. Di çarçewa vê sîyasetê de berî niha jî em çend cara beşdarî kongrên Partîya Sosyalist a Frensê û Partîya Sosyalist a Îtalyayê bûn ku ew jî bû sedema wê yekê ku ji alîyê P.S.Frensê û P.S.Îtalyayê û Partîya Karkerên Brîtanya ve biryarine baş li ser çarenivîsa netewa kurd derkevin. Bê guman beşdarbûn dibe sedema wê çendê ku ji alîyekî ve em bo tevgera kurd piştevanîyê bi dest xwe xin, ji alîyekî ve wan li ser doza gelê xwe şîyar bikin, ew doza gelê kurd û wî binasin.



Di her du rojên pêşî de ku kongra Jinên Sosyalist ên cihanê bû; nûnera me beşdar bû û rê dan wê ku ew li ser rewş û jîyana jin û zarokên li Kurdistana Îraqê bipeyive. Bi vê yekê wê karibû heta cihekî sempatîya beşdarên kongrê bo alîyê xwe bikşîne, beşdar baştir rewş û jîyana xelkê Kurdistana Îraqê binasin û her weha ji guneh û sûcên mezin yên hukûmeta Îraqê agehdar bibin.

Delegasyona kurdî ji 10 kesan pêk hatibû û nûnerên Kurdistana Îraqê û Îranê bûn. Me têkilîyên piralî bi serokên delegasyonên beşdar ve girêdan. Di nav wan de gelek partî û rêxistin hebûn; bo nimûne Partîya Komunist a Sowyetê wek 'muraqib' hatibû. Di kongrê de Piyar Suruwa ku şexsîyeteke

www.arsiva.kurdi.org

Di heşt salên çûyî de ji ber ku şerê Îran û Îraqê di gel berjewendîya her du dewletên mezin û yên welatên ewrûpî girêdan hebûn, ew bûbû sedema wê yekê ku li Îraqê mesela kurd heta derecekê di bin siha wî şerê giran de hatibû veşartin û ew gunehên hukûmeta Îraqê yên li hember gelê kurd, bi şerî hatibûn nixaftin.

navdar ê frensî û P.S.Frensê ye; ew li ser doza kurdî peyivî û weke 'trajedî'bi nav kir. Her weha serokê Komîsyona Mafê Mirovan Yakovîç, şexsîyeteke navdar ê nemsayî ye ku di rapora xwe de li ser mafê mirovan li hemû cihanê rawestîya, qala mesela kurd kir û bê behrîya Kurdan ji mafê mirovan da xuyakirin û dîyar kir ku "divê karek bêt kirin ku kurd jî bibin xudanên mafên xwe. Welîd Canpolat serokê Partîya Sosyalist a Pêşverû li Lubnanê di peyva xwe de bi dirêjî li ser doza kurd axaft. Kongre ji bo delegasyona kurd delîveyek (firset) pir baş bû ku cida cida têkilîyan di gel delegasyonên dî girêbidin û bi wan re li ser mesela kurd, nemaze li ser rewşa Kurdistana Îraqê ya îro bipeyivin.

Di beyannama dawî a kongrê, di beşa "Meselên Navçeyî" de qala mesela kurd jî hat kirin.

Em welê difikirin ku dema helketinên halo çêdibin, eger kurd bikarin wek tevgereke hevgirtî proja xwe ya hevgirtinê pêşkêş bikin daku ev bibe sedema bidestanîna piştevanîya wan û her di wê gavê de bibe rengdanek di nav partîyên wan bixwe de. Di nav sed salên çûyî de ev cara yekê ye ku di biryarnama dawî de navê Kurdan tê anîn û dikeve nav programa wan.

Berbang: Ji bilî we, Mesûd Barzanî wek nûnerê Cebha Kurdistana Îraqê, Dr. Qasimlo wek nûnerê Partîya Demokrat a Kurdistana Îranê beşdarî kongrê bûbûn. Anku di kongrê de sê delegasyonên Kurdan hebûn. Berî hûn bên kongrê we hev dîtibû yan ne?

Noşîrwan Mustefa: Dema ku Kak Mesûd ji derve ye û ew wexta ku ji derve dimîne wê kar û barên cebhê bi rêve bibe. Ew serokê delegasyona Cebha Kurdistanê bû, lê em wek Yekîtî Nîştimanî Kurdistan hatibûn gazîkirin. Bi ya me baş bû ku em di kongrê de amade bûn, çinkû çiqas delegasyonên Kurdan pitir bin, wê ewqas bikarin pitir bixebitin. Berî wê em di nav xwe de peyivîbûn û hetta me li ser mesela kurd proja biryarekê jî amade kiribû û dabû wê komîtê ya ku ji derxistina biryaran berpirs bû. Lê mixabin ku proja me nehat qebûlkirin. Wan bixwe hinek tiştên dî nivîsîn. An me bixwe projeyek serbixwe amade kiribû ku ew piştgirîya doza kurd bikin. Ew tişt nehat qebûlkirin, çi biryarên cida nehatin stendin û hemû biryar bi hev re di beyannama dawî de hatine komkirin. Lê em berê di nav xwe de peyivîbûn ka em çi bikin, çi nekin.

Berbang: Niha jî em bên ser Kurdistanê. Hûn dikarin bi kurtî qala rewşa Kurdistana Îraqê a niha bikin?

Noşîrwan Mustefa: Rewşa Kurdistana Îraqê xuya bû ku wê weha bibe. Bi ya me weha bû ku li Îraqê du şer hebûn; yek ji wan şerê hukûmetê di gel netewa kurd li Kurdistanê, yê din jî şerê Îran û Îraqê bû. Di heşt salên çûyî de ji ber ku şerê Îran û Îraqê di gel berjewendîya her du dewletên mezin û yên welatên ewrûpî girêdan hebûn, ew bûbû sedema wê yekê ku li Îraqê mesela kurd heta derecekê di bin siha wî şerê giran de hatibû veşartin û ew gunehên hukûmeta Îraqê yên li hember gelê kurd, bi şerî hatibûn nixaftin. Lê piştî bidawîhatina şerê Îran û Îraqê, leşkerê Îraqê betal ma ji bo ku hemû giranîya xwe bide ser Kurdistana Îraqê û xelkê Kurdistana Îraqê bêşîne û hêzên pêşmerge tengav bike.

Niha Îraq dest vala maye û şerê Iranê li ser nemaye, ketîye bicîanîna şûnewarên pîlanên xwe yên ku ji kevin de dest pê kiribû. Planên veguhestinê. Be'esî ji bo parastina "Emna Qewmî" ku ew bi xwe jî dibêjin "El-Emin El-Qewmî" wesa hizir dikin ku mesela kurdî yek e ji asteng û giriftên ku berdewam ji nav de çala nemana wê dikole. Her wextê tehdîtek ji derve jî bê ser Iraqê dîsan ew hizir dikin ku kurd dikarin hevkarîyê digel wê tehdîda ji derve bikin û bibin xeterek mezin ji bo wê. Ji ber wê yekê li şûna ku ew riya çareserîya aşîtîyê bo doza kurdî bibînin, riya neman û qirkirinê girtiye.

Qirkirina me li Kurdistana Iraqê bi sê peyvan hatîye kurt kirin. Yek jê "terhîl" e bi m'ena veguhaztinê ji cihekî bo cihekî din. Peyvek din "Te'rîb" e. Ev jî tê wê m'enê ku kurdan ji cihên girîng vediguhezin û ereba tînin cihê wan. Ya din jî "Tebî's" e bi m'ena Be'esîkirin e. Hewil didin hem Kurdên lehwan bibin nav parta xwe û hem jî bîr û bawerîyên Parta Be'es di nav kurdan de bidin qebûlkirin. Ji qonaxa xwedîkirina zarokan dest pê dike û heta digihîje qonaxa zanîngehê. Ew dest dixin nav hemû siwîçên jîyana mirova ji bo ku bîr û bawerîyên Be'esîya di jîyana Kurdan de bi cih bikin. Ji bo ku Îraq ji du netewên serekî pêk tê, yek kurd e û yê din jî ereb e. Ew dixwazin vî waqi'î vî tiştî biguherin. Li şûna hindê ku kurd li Iraqê weke neteweyekî serekî be, wî bikin "Eqalîyetekî seqafî", anko kêmatîyek kulturî. Her weke li hinek welatan kêmatîyên wiha hene ku ax û erdê wan tuneye, lê mafê peyvîn, stran gotin, rojname derxistin û mafê karkirinê hene. Ew nexşê Be'esîya di destpêka 1970'an de danabû ji bo wê çendê ye ku biryara kongra xwe ya 38'an bi cih bînin. Biryara ku dibêje; Kurd mêvan e li ser erdê ereban û divê wek mêvan muamele pê re bêt kirin. Xuya ye ku di van çend salên dawîyê de ji ber erê Îran û Îraqê nekarîbûn bi temamî vê biryara xwe bi cih bînin . Û ji ber hindê jî bizava kurdî li Kurdistana Îraqê bûbû hêzeke weha ku Îraqê êdî nedikarî piştguhê xwe bixe. Lê piştî bi dumahî hatina şerî û berî wê jî bi demekê, ji ber egera bikaranîna çekê kîmyayî şîya hejmarek zêde ji gundên Kurdistanê bêxe deravên teng û gundîyan neçar bike ku warê xwe bi cih bihêlin û berew bajaran bikevin rê, yan jî li derveyî Kurdistana Iraqê mişext bibin. Ew plan tevî ku bi bihana wê yekê ku Kurdan hevkarî bi Îran re kirine, bi cî tê, lê plan bixwe berî hevkarîkirina bi Îranê re dest pê kiribû.

Di sala 1973'ê de ewan dest bi te'rîbkirina beşek ji deverên Şengal û Xaneqînê kirin û wî çaxî çi alîkarî jî digel Îranê nebû.

Di sala 1975'an de, piştî têkçûna şoreşa Kurdistana Îraqê, dest bi veguhaztina şerîta tixubê Îran û Turkîye û

Bi ramanek din mana rejîma Îraqê li ser hukum ne bes ji ber wê yekê ye ku Kurdan li Îraqê xebat nekirîye, yan jî gelê Îraqê xebat nekirîye bo herifandina rijîma Be'esî. Dewletên Rojhilat û Rojavayê piştevanîya rejîma Îraqê kirin, daku xwe li ber êrîşa Îslamê û ya Komara Îslamî bigire û nekeve.



Sûrîyê hat kirin û nêzîkî 1500 gund hatin veguheztin.

Di salên 1979, 1980, 1981 û 1982'an de her berdewam bûn li ser veguhaztina wan gundên ku di nav cergê Kurdistana Îraqê de ne û gundên ku karibûn herifandine û rastkirine. Di sala 1984'an de hemû gundên deşta Hewlêr û Kerkûkê, hinek ji Germîyan, di gel gelek gundên din yên ser cadan wêran kirine. Wî demî me çi hevkarî di gel Îranê nebû. Ev tê wê manê ku wan mesela hevkarîyê bi Îranê re bo xwe kirine perdeyek û gunehên xwe pê vedişêrin. Ew plana guhaztin û çolkirina Kurdistanê li dûv wê biryara Partîya Be'es ku di kongra xwe de dabûn, berî şerê Îraq û Îranê dest pê kirîye.

Berbang: Ji bilî rejîma Îraqê, li Ewrûpa jî şirovekirinek wiha hebû ku Kurdên Îraqê alîkarîya Îranê dikin û Kurdên Îranê alîkarîya Îraqê dikin. Ji ber wê yekê ji şerê Kurdan ê li Kurdistana Îraq û Îranê weke dûvikê Şerê Îraq û Îranê dihat hesibandin. Ser wêre jî dibêjin ku rawestana şerê Îran û Îraqê titekî ji nişkave bû bo Kurdan. Hûn çi dibêjin?

Noşirwan Mustefa: Rawestana şerê Îraq û Îranê ne ji nişkave bû. Ew dihat dîtin. Çinkû berî wê Miletên Hevgirtî biryar dabû û biryar jî ji alîyê Îranê ve nehatibû refizkirin. Îranê dixwest ku hinek tişt jê bên guhertin. Eger ji ber wê yekê nebûya, Îran li ser prensîbên rawestana şerî razî bû. Ji ber hindê jî ne ji nişkave bû. Lê em wek kurd li Kurdistana Îraqê bawerîya me wiha bû ku di demê heşt salên şerî de du rê bi tenê li pêşîya Kurdan heye û riya sisîyan tuneye. Yek jê ew e ku di demê şerî de me qezenc bi hemû şîyana xwe jê wergirtibaye û ji şerê Îraq û Îranê jî qezenc werbigirtaya.

Ji bo ku hemû giranîyê bêxin ser Îraqê ku bi kêmanî mafên netewî yên Kurdan bi riya aşîtî biparêze; wî çaxî milletê kurd dikare bi hev re, di gel hukumeta merkezî alîkarîyê bike, bo bidawîhatina şerê Îraq û Îranê. Ev yek ji wan riya bû ku me carekê tecrube kir, belê alîyên din yên bizava kurdî dijî vê yekê bûn. Dîtina me ew bû ku piştî bi dumahî hatina şerê Îraq û Îran, tiştê herî baş ew bû ku kurd di gel hukûmeta Îraqê bigihe rêkeftinekê û bi aşîtî doza xwe çareser bike, daku xwe ji şerê be'esîya biparêze û be'esî nekarin bihana lê bigirin û piştî şer temam be, bibêjin we alîkarîya Îranê kirîye û bikin hêceta êşandina kurdan. Dîyar e ev rê bi ser neket. Çinkû me bi tenê kir û alîyên din bi vê razî nebûn. Ji ber ku wan bîr dikir ku di demê şerê Îran û Îraqê de wê be'esî bikevin. Riya din a li pêşîya kurdan ew bû ku hemû giranîyê bidin ser şerê Îraq û Îranê, ji bo hilweşandina vê rejîmê. Çinkû hemû kurdên li Kurdistana Îraqê dizanî, çaxê şerê Îraq û Îranê bi dawî bêt û Seddam Huseyîn bimîne, wê demê rejîma Seddamî hewil dide netewa kurd li Kurdistana Îraqê qir bike û bibirhîne.

Ji ber hindê, bi ya me ew tiştekî baş û rewa û helal bû ku kurd ne bes di gel Îranê, belkî her dewleteke dijî Îraqê şer bikira, bo herifandina rejîmê alîkarîyê pê re bikin. Çinkû bi herifandina rejîmê, kurd dikarin mafên xwe biparêzin, weke ku serpêhatîyê bo me eşkere kir.

Ev ne ji wan rejîma ye ku bêje qezenc ji dema çûyî werbigire û di demê destveanîna serkeftinê de beraqil bîr bike.

Ev rejîmeke pir betran e û bi her serkeftinekê zêdetir betran dibe, rejîmeke bi kerb û kîn e di derheq milletê kurd de. Rejîmeke şovenîst e, rejîmeke kudixwaze Kurdan qir bike, ji ber wê yekê mafê rewa yê Kurdan bû ku di gel dujminê Îraqê alîkarîyê bike bo heraftina rejîma be'esî li Îraqê. Lê vê yekê jî ser negirt. Kurdan nekarîn giranîya xwe bi wî awayî bi kar bînin, daku di demê şerî de Îraq biherife, ji ber sedemên navçeyî, herêmî û navnetewî. Bi ramanek din mana rejîma Îraqê li ser hukum ne bes ji ber wê yekê ye ku Kurdan li Îraqê xebat nekirîye, yan jî gelê Îraqê xebat nekirîye bo herifandina rijîma be'esî. Dewletên Rojhilat û Rojavayê piştevanîya rejîma Îraqê kirin, daku xwe li ber êrîşa Îslamê û ya Komara Îslamî bigire û nekeve. Ji ber wê yekê, mixabin ku me weke bizava kurdî nekarîbû yek ji riyên wê durîyana li pêşîya me hebû, biçin û serbikevin ku yek jê ew bû ku em biçin pêş û berî şer bi dumahî bêt, di gel hukûmeta merkezî rêk bikevin, yan jî ya din ku hemû giranîya xwe bidin ser wî şerî da ku hukumeta Îraqê biherifînin. Em di her du riya de jî bi ser neketin û bû sedema karesatek mezin bi ser Kurdan de bê.

Berbang: Weke te jî got ku we dizanî û gelek kesên din jî dizanî ku bi awayekî yan awayekî din wê şerê Îran û Îraqê raweste. Wek te niha qal kir ku piştî şerê Îran û Îraqê , Îraq wê bi hemû hêzên xwe ve êrişê bîne ser Kurdistanê. Bi me'neyeke din, we berî rawestana şerî ev tişt dizanî. Tevgera kurd ji bo parastina deverên di bin kontrola Yekîtî Nîştimanî Kurdistan û Partîya Demokrat a Kurdistana Îraqê de û xelkê van deveran xwe bi çi awayî amade kiribû

Noşirwan Mustefa: Ji ya me kirî zêdetir çi ji me dihat? Eger hûn li cihê me biwan, we dê çi bikira?

Berbang: Pirsîyar ew e ku we xwe ji bo wê rojê çawa amade kiribû, çinkû we dizanî wê şer xilas bibe?

www.pukmedia.org

Noşîrwan Mustefa: Pirsîyara min jî ev e; eger tu li cihê me biwayî, te dê çi bikira? Kîjan hazirî heye ku me nekirîye û tu li cihê me bûwayî te dê bikira?

Berbang: Li gor wan deng û basên ji wir dihatin û me dibîhîstin; ji bo parastina wan deveran çi tiştên bingehîn nehatibûn kirin. Bo nimûne me dibîhîst ku deverên weha hebûn ku Cehşik û "Cêş Şe'bî (mîlîsên gel) di qereqolan de bûn û pêşmerge jî bi serbestî li wan deran çûn û hatin dikirin, bêyî ku teqê li hev bikin; çinkû ew jî behra pitir kurd bûn û deng li hev nedikirin. Her weha ji bo parastina wan gundan planên berevanîyeke çekdar nehatibûn çêkirin, tevî ku we dizanî wê hukûmet êrişê bîne.Bi wê me'nê dema ku êriş hat ser wan gundan, bi awayekî tevayî mirov dikare bibêje ku seranser Kurdistana Îraqê berevanîyeke xuya û pêşçav nebû.

Noşîrwan Mustefa: Na. Ev ne rast e. Yekemîn beyannama leşkerî ku hukûmeta Îraqê bixwe derxistibû, belgeyeke xuya û eşkere ye ku Kurdan di dîroka xwe de wek vê carê berevanî nekirine. Meha şibatê dema hukûmeta Îraqê êriş anî ser deverên ku serokatîya Yekîtî Nîştimanî lê bû; di navbera qeza Çuwarte û Serçinar û Dukan; bo demê 25 rojan, bi dirêjîya 73 km. şer hebû. 7 lîwayên (alay) leşkerê Îraqê beşdarî wî şerî bûn. Ji hejî gotinê ye ku di sala 1974'an de hemû leşkerên Îraqê 27 lîwa bûn. Piştî 25 rojan ji şerî, evca wan karî deveran bigirin. Piştî bikaranîna topxana xwe ya giran, bi rengekî bê hesab çekê kîmyayî bi kar anî, heta ku esmanê deverê pirî jehir bû. Mirov nedikarî êdî tê de bijî. Li hember çekên kîmyayî yan divê mirov jî ew çek hebe, yan jî maske hebin. Çekê kîmyayî ne weke çekê din e. Li ser şerê devera Qeredaxê jî hukûmetê beyan derxistin. Leşkerê Îraqê û beyanên leşkerî xuya dikin ku li wê deverê, ber bi ber, çîya bi çîya, gund bi gund şer bi me re kirîye. Lê belê çaxê di navbera du hêzan de ji alîyê hejmar û cûrên çekî de newekhevîyek peyda dibe, alîyek dişkê. Li Kurdistana Îraqê, di navbera hêzên kurd û hukûmeta Îraqê de newekhevî peyda bûbû. Çinkû hêzên hukûmeta Îraqê ji sala 1973 û vir de ku bihayê petrolê li cihanê çûye serî; leşkerê Îraqê bi awayekî berfireh zêde bûye. Salên 1970-1975'an leşkerê Îraqê ji 9 tîpan pîk hatibû, sala 1988'an bûbû 52 tîp.

Di destpêka sala 1970'an de cebilxana Îraqê ji 1000-1500 topan derbas nedibû, li gor îstatîstîka Enstituya Stratejîk a Brîtanî yan ewa li Stokholmê derdikeve, di sala 1988'an de 4500 top, 4500 tank û pitir ji 500 balefirên şerî hebûn. Ji bilî helîkopter û ji bilî çekê kîmyayî û bakterîyolojî. Di şerekî weha de mirov çi bike, nikare xwe li hember çekê kîmyayî, çekê bakterîyolojî û li hember wê hejmara zêde ya leşker, tank û balefiran ragire. Bi gotineke din; mesele ne ew bû ku me hazirî nekiribû, yan me şer nekiribû; li hemû Kurdistanê şer hebû, çi cih bêyî şer û berxwedan û hejmareke pir a şehîdan nehatine çolkirin. Di sala 1988'an de ewqas Kurdên Îraqê hatine şehîdkirin; hejmara şehîdên pêşmerge û xelkê sîvîl li deverên Helebçe, Silêmanî, Kerkûk, Hewlêr û Behdînan dibe ku bigihe 20.000 kesan. Ev bi serê xwe nîşana berxwedanê ye.

Qirkirina me li Kurdistana Iraqê bi sê peyvan hatîye kurt kirin. Yek jê "terhîl" e, bi mana veguhaztinê ji cihekî bo cihekî din. Peyvek din "Te'rîb" e. Ev jî tê wê me'nê ku kurdan ji cihên girîng vediguhezin û ereba tînin cihê wan. Ya din jî "Tebî's" e, bi me'na Be'esîkirin e.

Berbang: Baş e, em bên ser behseke din; berî demekê Pr. Lazerev di hevpeyvîneke xwe de qala Kurdistana Îraqê û ya Îranê kiribû. Wî gotibû ku di şerê Îran û Îraqê de delîveyek baş ji destê Kurdan derket; dikaribûn di wê demê de Kurdistaneke serbixwe îlan bikin. Dîtina we li ser vê yekê çi ye?

Noşîrwan Mustefa: Nizanim Lazerev weha gotîye, yan ne.

Berbang: Belê

Noşîrwan Mustefa: Ji ber ku ez bixwe beşdarî tevgera kurd bûbûm, bi ya min Kurdan îmkana wê yekê nebûye.

Berbang: We wek Cebha Kurdistana Îraqê û wek Yekîtî Nîştimanî Kurdistan, ji bo rewşa niha ya Kurdistana Îraqê çi riyên xebatê dane ber xwe?

Noşîrwan Mustefa: Ji bo rewşa îro ya me, bi her awayî û di hemû qadên xebatê de em ê têkoşîna xwe bidomînin. Tiştê ku me daye pêşîya xwe, dibe ku di demeke kin de em nekarin bi cî bînin. Mebesta min xebata çekdarî ya bi wî awayî ku me bi deh hezaran kîlometer erdê rizgarkirî hebû û pêşmerge xwedî tîp û bingeh bin û berpirsên wan hemû eşkere bin. Dibe ku em bi wî awayê berê nekarin dirêjahîyê bi têkoşînê bidin. Ev jî bi rastî ji ber wê yekê ye ku Kurdistan vala bûye; pêşmerge û xelk weke masî û avê ne: yek bêyî yê din nabe. Şerê partîzanîyê di nav milet de tê kirin û li deverên çolkirî nayê kirin. Ji bilî vê, îro hêzên Îraqê zêdetir bûne; çekê kîmyayî heye û bê mesûlîyet li dijî xelkê sîvîl bi kar tîne. Lê tevî vê jî me çar cûrên xebatê dane ber xwe ku bi ya me wê ev serketinê misoger bikin. Dibe ku berî niha, di 27 salên çûyî de tevgera kurd li Kurdistana Îraqê giranîya xwe bi tenê dabû ser xebata çekdarî; ew cûrê bingehîn û mîhwera xebata me bû û cûrên din hemû di xizmeta wê de bûn. Belê niha em hewl didin ku di navbera wan çar cûrên xebatê de balansekê (denge) çêbikin, da ku wek hev pûte bi wan bêt dan. Dibe ku di hinek qonaxan de yek ji ya din giringtir be, lê bi dîtina me her çar jî pêwîst û bingehîn in: divê her çar bi hev re mîhwera xebata me bin. Yek ji wan weke her car xebata çekdarî ye. Lê weke me got, em nikarin wek berê xebata çekdarî bidomînin. Ji niha û pê de ji bilî mufrezên biçûk yên ku heta niha li çîya û deştên Kurdistanê xebata xwe didomînin, serpêhatîya sal û mehên derbas bûyî, xuya kir ku pêşmerge dikare li deverên çolkirî jî bimîne û îdare bike û bijî. Ji niha û wê de em ê hewl bidin ku xebata xwe têxin nav bajaran. Çinkû gund nemane û Kurdistan hemû bûye bajar. Ye'nî ji niha û pê de em ê li bajaran xebata çekdarî bikin. Ev jî ne şert e li bajarên Kurdistana Îraqê bêt kirin. Belkî yek ji şaşîyên şoreşa kurd ew bû ku heta niha me di mala xwe de şer dikir. Bi gotineke din, me şer nebirîya mala dijmin. Me her di hundir de şer kirîye û mala xwe kavil kirîye. Ji

www.kurdishlibrary.org

niha û wê de eger me şer kir, dê şerê xwe di mala dijmin de bikin, daku mala wî wêran bibe. Ji bo vê yekê jî me hucreyên xwe yên çekdar çêkirine, lê heta niha dest bi îşê xwe nekirine. Lê rêxistina me ya çekdarî li ser bingehê çêkirina hucreyên çekdar, li bajarên Îraqê ava dibe ji bo domandina xebata çekdarî.

Rengek din jî xebata me xebata sîyasî ye, ew jî pîtepêkirine bi rêxistina nav bajara. Me karîye li her cihekî Îraqê ku kurd lê hebin, rêkxistina sîyasî li wir durust bikin. Û ji bo şerê sîyasî jî hêzên me amade ne. Belkî rojekê ji rojan li Îraqê reweke wilo çêbibe ku xebata siyasî bibe rengê bingehîn yê tekoşîna hevrikîya di gel dewletê. Reweke wiha peyda bibe ku bikarîn hinek qezencê ji azadîyê bikin. Wî çaxî wê me hêzek sîyasî, baş hebe. Niha tiştê ku bûye egera hindê ku xelk miftelayî bêbawerî û herifîne nebûye, ew e ku rêxistina sîyasî tesîreke baş li ser xelkê heye, li hember êrîşên ragehandinê û şerê dujminî yê pisîkolojî.

Şeklê siyê yê xebata me, xebata ragehandinê ye ku bi riya rojnama û belavoka, radyoyê, sloganên rast, mil bi mil xebat û têkoşînê bigihînin xelkê. Di vî warî de jî me karîye bingehê wê çendê deynin ji bo domandina xebatê. Şeklê çara yê xebatê, hevbend e bi karûbarên ji derve ku kurdan heta niha gelek kêm di vî warê dîplomasî de xebitîne ji bo ku bikarin pitir dostan ji bo doza kurdî peyda bikin, da ku bikarin piştevanîya manewî bi dest xwe ve bînin û dijminê xwe rûreş bikin. Di qada xebata dîplomasî de, bêguman giranî wê bikeve ser mafên mirovan û heta çi endazeyekê kurdan mafê mirovan heye. Bi wê rêkê bikarin raya tevayî ya cîhanê bo xwe bikêşin. Bi ya me, di demê sal û nîva çûyî de, di vî warî de me karên baş kirine bo nasandina mesela kurdî bi dinê. Berê me di xebata xwe ya dîplomasî de hinek sinor danabûn û em ji wan sînoran derbaz nedibûn.

Me bo dost û dijmina tixûbek danabû. Me di çarçeweyeke xuya de kar dikir. Niha em li hemû dinê kar dikin, ji bilî Îsraîlê. Ji bilî ku em naçin bo Îsrayîlê û ne hazir in di gel Îsrayîlê hevkarî bikin.Li hemû dinyayê, ji rohilat bo rojavayê, ji jor bo jêr, her cihê ku tê de ji



Noşîrwan: "Me çar curên xebatê dane ber xwe ku bi ya me wê serketinê misoger bikin.

me re me delîveyek helkevit û bikarin ji bo ronkirina daxwazên miletê xwe yên rewa û ji bo rûreşkirina dijminên xwe tê de kar bikin, em diçin wir. Yanî em dê xebata çekdarî, ragehandinî, sîyasî û dîplomasî weke çar xelekan bi hev re girêbidin, heta li Îraqê barûdoxeke wiha çêbikin, ku hukûmeta Îraqê neçar bike, dumahîya bi xwînmêtina miletê kurd bîne û çareyekî rewa û aşîtîxwaz bo mesela kurdî li Îraqê bibîne.

Berbang: Baş e, niha li Kurdistana Îraqê rayeke wiha çêbûye, wek Mesûd Barzanî di semînera xwe de van roja li vir, Li Stockholmê digot ku doza kurdî, li Kurdistana Îraqê bi çekî nayê çareserkirin, divê em riya aşîtîyê peyda bikin. Eger hukûmeta Îraqê daxwazîya gotûbêjê ji we bike, helwistê (mewqif) bizava Kurdistana Îraqê wê çawa be? Eger razîbin bi kîjan ertan hûn dê biçin?

Noşîrwan Mustefa: Em çi tiştî paşve nazivirînin û bi ya me gotûbêj jî bi serê xwe awayek ji awayên xebata sîyasî ye. Di kevin de jî raya Yekîtîya Nîştîmanî her wiha bû. Bi me eger çend sala jî şer di gel hukûmeta Îraqê bikin, dawîyê jî her divê gotûbêj be, bi riya sîyasî mesele bêt çareserkirin.

Eger Îraq gotûbêjan bi Cebha Kurdistana Îraqê re bike, tiştek eşkere ye ku şertê Cebha Kurdistanê berî her tiştî ew e ku Îraq carek din weke xwe lê bêt û ev nefîkirin, kuştin û birîna niha li Kurdistana Îraqê dibe, nemîne. Rê bidin cotyarên kurd ku vegerin ser axa bab û bapîrên xwe û li Kurdistanê rewşeke weha peyda bibe ku kurd bixwe hukmê xwe bigerînin, anku destkarî di otonomîyê de bêt kirin û kurd bikarin beşdarî hukûmeta merkezî bibin û li gor giranîya xwe di biryarên sîyasî yên hukûmeta merkezî de xwedî maf bin. Azadî û demokrasî bo partî û rêxistinên demokrat bi cî bêt. Bi kurtî daxwazên tevgera kurd her ew daxwaz in yên ku bi şer dixwestin û bi aştî jî her wan daxwazan dikin.

Berbang: Ji bo ku kurd hem li Kurdistanê, hem jî li derve bikarin bi yekdeng bipeyivin, tevgera azadîxwaz a kurd dikare cebheyeke hevgirtî, yan rêxistineke berfireh wek Rêxistina Rizgarîxwaz a Filistînê pêk bîne?

Noşîrwan Mustefa: Ev wek teorî karekî baş e, lê dibe ku di warê pratîk de gelek asteng bêne pêş. Di derheqa Kurdistana Îraqê de, Cebha Kurdistana Îraqê cihê hêvîyê ye ku bibe rêxistineke ji wî awayî ku bi yekdeng, dengê me bigihîne dinyayê. Ev ji bo Kurdistana Îraqê. Hêvîya me ew e ku kurd bikarin di paşerojê de tiştekî weha pêk bînin. Lê bi ya me weha ye ku halî hazir nayêt bi cih anîn.

Berbang: Bi riya Berbangê mesajeke we heye hûn bo Kurdên li Swêd û Ewrûpayê bigihînin? Daxwazine we ji Federasyonê hene?

Noşîrwan Mustefa: Hêvîya min ew e ku Kurdên li Swêdê bikarin di nav xwe de ji bo piştgirîya miletê xwe hevkarîyê bikin. Nemaze Kurdistana Îraqê niha di qonaxek pir nazik re derbas dibe, li ber xetereke pir mezin e; li ber xetera nefîbûn û ji destdanana ax û ava Kurdistanê ye. Bê guman weke hemû miletên dinê, cudayîya bîr û bawerîyan di nav Kurdan de jî heye. Ya ku em jê bi hêvî ne ew e ku kurd bikarin çarçeweke tevayî, giştî ji bo karê muşterek ê ji der ve bibînin û qazancê bigihînin tevgera miletê xwe û piştgirîya wî bikin; bi xebata xwe ji bo tevgera kurd bibin giranîyek li dijî dijminên me. Hêvîdar im Federasyon jî her bi vî karî rabibe.

Berhevkirin: S. Rêving

Not: Ev hevpeyvîn bi Soranî bû, Berbangê kir Kurmancî.

www.archivebkm.org

Strana Kurdî

Mihemed Ezîz Zekî

Bêyî ku em ji hêla akademîkî û zanista hunermendî li muzîka kurdî binêrin û lê hûr bibin jî, em dê bibînin ku muzîka kurdî ya folklorî û gelêrî, di destpêkê de ye û neketîye koşa zanista hunermendî. Di vî warî de bi destên hunermendên nuha hin xebatên awarte hatine kirin. Wek; Qadir Dîlan, Komika Zankoya Silêmanîyê ya ku bi navê "Mewlewî" tê nasîn, xebatên Cemîla Celîl û yên hunermendên ermenî ku di warê zanista mûsîqê de çêkirine û beşdarîya wê xebatê kirine, wek Aram Dîkranyam ê ku niha li Ermenistanê dijî.

Folklora kurdî ya gelêrî, bi awayê rîtma xwe ya hunermendî û tevgerî bala mirovan dikşîne. Weke ku di pirtûka xwe ya bi navê "Kurd" de Bazil Nikitin jî dibêje: "Hemû gerokên ku hatine Kurdistanê bi pesindarêyeke mezin, nêzîkî stranên kurdî dibin. Piranîya stranên kurdî bi awayê komikî (koro) çêdibin." Nikitin gotina nivîskarê ermenî "Ebû Figan" nimûne dide û dom dike: "Helbestên kurdî ên gelêrî pir pêşketî û gihiştî ne". Nikitin gotinên "Baw" ê ku li ser Kurdistanê lêkolîneke kûr çêkirîye, digire û dibêje: "Belengaztirîn êlên kurd, di awaz û ahengên stranên xwe de pir dewlemend in. Stranên wan ne tenê ji serpêhatîyên li ser rastîya şer û koçerîyê pêk hatine, lê li ser jîyana şaristanîyetê jî stran hatine gotin. Gundî bi şev li dora dengbêjan dicivin, dengbêj dest bi çîrok, bîranîna lehengî û şervanîya kevin dikin. Bi qesîdeyên evîndarî û ji hev dûr ketinê birînên dilan dazirînin. Guhdarîya stranên Emer Axa û Dîyaleddîn tenê têr dike ku mirov bikaribe bawerîya xwe bi kûranîya hisên xwe ên ku ji stranên wan tesîr dibînin,bîne û xurt bike."

Nikitin li dîtinên "Layar" vedigere, li ser gotinên wî ên li ser stranên kurdî û stranên kurdên êzîdî dipeyive: "Heta niha min stranên weha dilşewat û xweş nebihîstibûn. Ew awaza zirna ku car car bi nermayî tevlî dengê jin û mêran dibû, car car jî radiwestîya, rê li ber awaza zîl û deholê vedikir."

Stranên kurdî derveyî tiştên olî, tiştên hisî û lehengî jî dinimînin. Bala mirovan dikşîne ku; dema stranek ji alîyê gelekan ve têt gotin, ji bo mûsîqa kurdî nabe giring; ango stranek dikare ji alîyê gelek stranbêjan ve bêt gotin. Lê her stranbêjek li gor rewşa xwe ya psîkolojî û hisî wê stranê dibêje, li gor zanîn û hunermendîya xwe rengekî dide stranê. Wek: "Xezal Xezal", "Lê lê Dayîkê", "De Lorî". Ev stran ji alîyê gelekan ve hatine gotin, lê her yekî bi awayê xwe gotîye. Ev tiştê han di mûsîqa kurdî de cihekî giring digire.

Gerok û zanyar başbûna stranên kurdî tînin ber çavan- weke ku Nikitin dibêje-, Nikitin rewşa mêrxasîya kurdan, ya ku Kurdan ji netewên din cihê dike, bi me dide nasîn û gotinên "Mar" bi bîr tîne: "Li gora min, dewlemendîya stranên kurdî ji rewiştên (xusûsîyet) ku wan didin nasîn û wan ji cîranên wan ên tirk û ermen vediqetînin, têt. Dema ku Tirk û Ermenan dev ji tore û 'edetên xwe yên bingehîn berdabûn, Kurdan 'esaleta xwe diparastin."

"Millincin" salixdana şevbihêrikeke kurdî dide û dibêje: "Piştî xwarinê, li nav kon û li derveyî wî qorê stranê hate girêdan. Merivên ku rûniştibûn, hemî jî li ser zemînê (erd) rûniştibûn. Di destpêkê de li ser tiştên cihê cihê peyivîn piştre hêdî hêdî awazên muzîkê ên dilşewat bilind bûn. Şewat bi dilan ket û birînên wan ho bûn. Xweşbûna ahengan, ji birîqîna çavan û geşbûna rûyan dihat dîtin. Ev rewş, bi sîmayên wan merivên qaf û gor dikete nakokîyê û kenê merivan bi wî tiştî dihat. Qesîdeyên ahengî li ser psîkolojîya wan tesîreke mezin dikir, ew şerevanên han diketin rewşa evîndarên dilbirîn. Wan stranan nêzîkî du seatan dikişandin. Divê bibêjim ku ew stranên han dilê merivan xweş û tesellî dikirin. Pêlên helbest û muzîkê meriv ji nişka ve ber bi xwe de dikişînin. Ji wan stranan yekê ez xistim bin sîdarîya xwe, kir ku demeke dirêj ez lê vegerim û xwe ji bîra bikim. Piştî stranan, dora dîlanê hatibû. Cihê kon bûbû wek festîwalê. Pir zû, govend heya konên din dirêj bû, konên din jî ketin nav govendê. Dilxweşîya me di bin çirîsîna ronahîya heyvê de û bi agirê şevê ê pêketî ve, hîn xweştir dibû. Muzîka kurdî destpêkir, govend gerîya. Xwarbûn û hejandina merivan weke erda genim lê hatibe çandin û genimê hişk bi tesîra bayekî hêdî hêdî hejiyabin, xweş diçû û dihat.

Stranên wan ne tenê ji serpêhatîyên li ser rastîya şer û koçerîyê pêk hatine, lê li ser jîyana şaristanîyetê jî stran hatine gotin. Gundî bi şev li dora dengbêjan dicivin, dengbêj dest bi çîrok, bîranîna lehengî û şervanîya kevin dikin.

Cemîla Celîl; di pêşgotina pirtûka "Stranên Gelêrî ên Kurdî" de ya ku di sala 1965 an de li Moskow çap bûbû, holê dibêje: " Di stranên kurdî de ji bo xweşikîyê nimûneya pêşî suruşt e. (Tabîat) Xweşikbûna delalîyan, bi riya taswîra suruştê tête salixdan. "Hin bêjeyên suruştî wek çîya, dar, çem, behar, newal; ev hemû di piranîya gotinên stranên gelêrî de peyda dibin.

Her weha stranên ku li ser dema kar têne gotin, di muzîka kurdî de heyînek mezin in. Wek karkerî, şivantî, cotkarî, bêrîvanî, rîtmên van stranan li gor karên ku ew pê radibin, çêdibin.

Di demên borî de gelek munasebetên muzîkalî pêkhatine (dawet, partî, hefle). Di wan munasebetan de, di navbera dengbêjan de hin pêşbirkên (musabaqa) hunermendî çêdibûn. Di wan pêşbirkan de bi piranî stranên nuh û jiberkirî (ezberlenmiş) serdiketin.

Dîsa ji bo bikaranîna tembûr, zirne û bilûrê jî pêşbirk pêk dihatin. Ew berhevdana han, ji awazên stranên bi navûdeng û bênota (taksîn) pêk dihatin.

Di demên kevin de, diviyabû li nik her axa û begî dengbêjek hebûya. Her yek ji wan dengbêjê xwe dipesinî û dengbêjên xwe di ser ên din re digirtin. Ew dengbêjên han, ji bo ku stranan bibêjin, pesnê begê xwe û mezinîya wî di-

din, şevbihêrkên stranî pêk danîn. Pir caran ew stranên han li ser serpêhatîyên lehengên rasteqîne û serekêlên ku dijî zordestîya Turkîyê û Şahên Îranê bi şoreşê rabûbûn, çêdibûn. Ev stranên han bi riya danûsitandin û têkilîyê di nav xelkê de belav dibûn. Wilo bû ku, hin ji wan stranan, rengê gelêrî girtin û bûn wek stranên folklorî. Pirên wan stranên bi nav û deng bê muzîqa têne gotin. Ev stranên han bi seatan dom dikin. Dengbêj; destan, efsane, lehengî û çîrokên evîndarîyê dike stran û li ser wan dipeyive. Strana bê muzîqa dikeve riya strana "Rîcatatîf" ya yunanî (Ev awa stran awayekî stranê ye ku di navbera stran û peyvê de ye). Di van stranan de, dengbêj dikeve rola çîrokbêj, artîst, stranvanên komedî û sîdaran. Bi dirêjayîya wê demê de herkes dibe guhdar û di navbera her du biran de bi dengekî awazî, hin gotinan dubare dikin. Ev dubare kirin di cîhê ku dengbêj beyta xwe xellas dike û radiweste, çêdibe. Dengbêj beyta xwe kuta dike (xelaskirin) û disekine, îcar guhdar bi rewşeke pê gunciyayî(harmonî) û hêsanî dubare dikin. Bi vî awayî ji dengbêj re keysa bêhngirtinê derdikeve.

* * *

Di stranên gelêrî ên kurdî de gelek babet û awayên cihê cihê tên dîtin.

1- Dîlok (yan Bendê Keçan): Ew awa stran, bi komikên keçan çêdibin. Bi stran, romantîzmî û besteyên xwe li "Çatûşkî" ya gelêrî ya Rûsî diçe.

2- Stranên ku bi giftûgoya beranberî û bi alîkarîya reqsan têne pêşkeşkirin: Ev stran xwedîyê naverokeke evînî, hîssî û cengawerî ye. Dikare di qerektera pêkenîyeke rexnegirî de jî bibe.

3- Xerîbok: Ev babet stran, li ser kesên ku ji welatê xwe bidûrketine, hatine gotin. Weke em dizanin, dîrok her dem ji bo kurdan bûye kaşekî dilşewat. Tirkên Osmanî temamî êlan surgûnî bakûrê Efrîqê kirin. Ji kurdan gelek kes ji rûyê zordestî û sitemkarîyê revîyane û çûne çarmedora Kurdistanê bi cîh bûne. Bi wî awayî Xerîbokê çawanîyeke dilşewatî girtiye. Dêyek ji bo zaroyên xwe ên ku ji bîst salan Surgûnî Yemenê bûne, distirêne. Delalî, çavnêrîya delalîyê xwe ê ku li şerê qirimê ye, dike û distirê. Kalê ku li surgûnê ye ji bo mal, jin û zaroyên xwe distirê û xerîbok bi vî awayî dom dike.

* * *

Li nik kurdan stranên bajaran nînin (Li vir ez qala stranên gelêrî dikim). Hew di parçeyên stranên kurdî ên kevnare de, gelek hevokên muzîkî yên mustewa bilind peyde dibin. Guhdarên muzîk û guhdarên stranên gelêrî dizanin ku di navbera beste û awazên wan de cawazîyeke (ferqeke) mezin nîne. Heger em sê navçeyên muzîkî ên

Stranên kurdî derveyî tiştên olî, tiştên hisî û lehengî jî dinimînin. Bala mirovan dikşîne ku; dema stranek ji alîyê gelekan ve têt gotin, ji bo mûsîqa kurdî nabe giring; ango stranek dikare ji alîyê gelek stranbêjan ve bêt gotin. Lê her stranbêjek li gor rewşa xwe ya psîkolojî û hisî wê stranê dibêje, li gor zanîn û hunermendîya xwe rengekî dide stranê. Wek: "Xezal Xezal", "Lê lê Dayîkê", "De Lorî". Ev stran ji alîyê gelekan ve hatin gotin, lê her yekî bi awayê xwe gotîye. Ev tiştê han di mûsîqa kurdî de cihekî giring digire.

ku di çêbûna beste û awazên kurdî ên gelêrî de rol lîstine, bînin bîra xwe, dê di cihê xwe de be. Ew navçeyên han ev in: Mûsul, Mêrdîn û Dîyarbekir. Dibe ku hin navçeyên din jî li Îranê hebin.

* * *

Stranên ku li gor ên din, hîn zêdetir hezkirina xelkê kom dikin; ew stran in, ên ku di şevbihêrkên ku dema bênderan de çêdibe, dawet û di dema koça koçeran de bi reqsê tên pêşkêşkirin. Ev stran bi pêlên xwe yên ku di navbera tempoya lez û hêdî de diçe û têt, têt nasîn. Di pêşkêşkirina lîstikê de, barê giran li ser xort û keçan dimîne. Tempoya vê reqsê bi piranî bi govend dibe û tempoya muzîkê ve digunce. Ev babet stran jî di nav xwe de dibin çend bir.

1- Di navbera komikên peyan de bi rewşa gotûbêjê û axaftina beramberî:

2- Stranên gotûbêjî di navbera mêr û jinan de.

3- Heger ji bo komika sisîyan vêtinî bête dîtin û komika sisîyan bikeve nav stranê, wê gavê giftûgo di navbera her sê komikan de jî dikare bibe.

Li nik kurdan reqsên taybetî ên ku bi pêlîskan têne lîstin, hene (ango pêlîskên stranî û reqsî). Rêç û bingehên van lîstikan pir kevin in û bi tevayî bi toreyên kevin ve girêdayî ne. Ev stranên han bi yek awazî û yek melodî (bê harmonî) ne. Ji bo wê jî muzîka gelên ne Ewrûpayî ne. Di van stranan de bi gelemperî, hin bêjeyên weke hev (dubare) têtin bikaranîn. Wek: lo lo, lê lê, yar yar... Ev dubarekirina han weke dubarekirina rûsîyan e û ew rewş li nik piranîya gelên cîyayî heye. Em vî tiştî di besteyên Andolosî û Helebî de jî dibînin. Heger em van dubarekirinan bi du vêtiniyan ve girêbidin, dê rast be:

-Vêtinîya pêşîn: Tewawkirina beyt û qafîyeyan

-Vêtinîya duduyan: Parvekirina birên tona dubarekirinê. Wek bêjeyên "aman aman, Ya ley ya ley"... ên ku di besteyên Andolosî de dubare dibin.

* * *

Ev dubarekirina han, ji hêlekê de di navbera komik û guhdaran de, ji hêla din de jî di navbera dengbêj û muzîqavanan de guncînekê pêk tîne. Bi rastî ev dubarekirin û giftûgoya ku di navbera guhdar û hunermend de ye hêza xwe ji xurtî û hunermendîya her du alîyan digire.

Dema em li ser çêkirina parçeyên wan hûr bibin, em dê bibînin li awaz û perçeyên wan hin zagonên tekûz, hukum dikin û ew dubarekirina han ne tiştekî ji ber xwe û lêhatinî ye. Lêvegerandin û vêtinî nabin tiştin bê hoy û ji ber xwe.

Gotinên parçeyên stanên gelêrî, bi gelemperî li ser meselekê temam, rêkûpêk weke hev çênabin. Her çi beyt û bêjeyên wan bi hev re ne girêdayî (ne yekgirtî) ne jî, ji merivan re întîbayekê weha dide. Ew rewşa xuya (yekgirtî) her çi ji bejeyên cûre cûre çêdibin, lê dîsa jî bingeha xwe ji zakîre, ji bingeha çandî û psîkolojîya milletê kurd digire û ji bo wê jî guncîn çêdibe. Ev gotin û bêjeyên ku wek pêlekê didin dû hev,

www.arsivakurd.org

wek şîfreyekê ne ku li ser bingehekî pir fireh ê ku tê de dîtin, tore feqalîd, çîrokên evîndarî û ên din bi cîh dibin, çêdibe. Û ev, kurdan ji gelên mayî cûda dike.

* * *

Navên stranan, ji navên jin, yan mêran tên girtin.

Ev tişt li ba tatar û qazaxîyan jî heye. Hin caran jî rêza pêşîn a stranê, ji bo stranê dibe nav. ev rewş li nik silavîyan jî heye.

Aletên muzîka gelêrî li ba kurdan bi dereceya pêşîn dahol, zurne, tenbûr û bilûr in. Li nik van aletan yeke din heye ku ew jî kemençe ye. Dibe ku ew ji gelên din wek ermen û balaban li Azerbeycanê hatibe girtin -wek meşka bi zirna skotlandî, yan yugoslovî-. Tiştê seyr ew ku kemençe du yan jî sê dengên muzîkî bi hev re derdixîne (Wek muzîqa organim ku li Ewrûpayê di çaxa navînî de rê li pêş polîfonî vekir).

* * *

Îro muzîka kurdî ji rûyê mercên siyasî û aborîya xerab a ku milletê kurd tê de ye, êş û derdekî dijwar dikşîne. Çanda kurdî bi gelemperî li hemû parçeyên Kurdistanê têt pelçikandin û şerê wê têt kirin. Ew hunermendên ku li Îraq, Îran, Turkîye û Sûrîyê ne, di dereceya pêşîn de bi hunera xwe ya şexsî bawer dikin, ji xebatên xwe ên muzîkî, muzîka turkî, erebî û farisî numûne digrin. Lê muzîka turk, ereb û faris bi xwe jî îro di astengeke (krîzeke) mezin de ne.

Gelê kurd li Îraqê, piştî peymana 11'ê adara 1970'an, ji bo demeke kurt, azadîyeke siyasî a nisbî dît û jîya. Dema em bala xwe didin, dibînin ku şîyarbûna çand û hunermendî ya ku di wê demê de çêbû, berîya wê li Kurdistanê tiştekî ûsa ne hatibû dîtin. Lê ev şîyarbûn bi şikandina şoreşa kurd, leza xwe wenda kir û rawestîya. Divê baş bête zanîn, heger gelê kurd, mafên xwe ên gelêrî bi dest xwe nexe, şîyarbûna huner û çanda wî jî dê pêk neyê.

Ew nivîsar, di civîna leqa Partîya Komunist a Iraqê li Çekoslovakyayê ku li ser kultura kurdî pêkanîbû, hate pêşkeşkirin.

Lawjek Ji Dîwanxana Kalên Me

Amadekirin: Lawikê Metînî

Qaçaxo Silo

Ji Silo re dibêjin "Qaçax", ji ber ku wî şerê "Romîyan" kirîye. Wek di teksta stranê de jî hatîye; Silo qaçaxê çar dewletan e. Û xuya ye ku ew mêrekî bi xîret bû û serê xwe ji bo dagîrkeran neçemandîye. Lewra jî şerê çar dewletan kirîye û bûye qaçaxê çar dewletan.

Lawo hey Lawo...
Qaçaxo Silo, hey Lawo
Firaro Silo, hey Lawo
Metlûbê çar dewleta, çi cara nahête rayê.

Lawo hey Lawo, Silo
Me şerekê kirî li çemê Barbenîyê
Hey lo Silo wa di korê da
Vê siharê Silê qaçax li canyê siwar bû
Kete pêşîya selefeka siwara
Silê qaçax çûbû tê da
Sûndeka xwarî bi Qur'anê, bi qesemê, bi yasînê
Ezê hingê bizivirim
Heta meydan têr dibît ji xwînê

Lawo hey Lawo
Qaçaxo Silo hey Lawo
Firaro Silo hey lawo
Metlûbê çar dewleta çi cara nahête rayê

Lawo hey Lawo
Sibe ye me şerekê giran yê kirî li çemê Darbenîyê
Hey lo lo Silo wa bi dukan e
Vê siharê Silê qaçax li canyê siwar bû
Kete pêşîye selefeka siwara
Hey lo lo çû meydanê
Ewî sûndeka xwarî bi qesemê, bi Qur'anê
Ez ê hingê bizivirim, heta çerî bikim di gel kûçikbabêt va Romîyane

Lawo hey Lawo
De rabe Qaçaxo, Silo hey Lawo
Mehkûmê çar dewleta çi cara nahête rayê.

Di stranê de ne xuya ye ka dawîyê çi dibe. Lê we dîyar e ku Silo şerekî giran bi Romîyan re dike û di şer de têt kuştin, lewma jî ev stran li ser wî hatîye gotin.

Ev stran ji devê stranbêj Xelîl Bakozî hatîye wergirtin.

www.arsivakurdi.org

Xwendevanên hêja: Di rojên 13-15.01.1989'an de li Stokholmê li ser jîyana aborî, rêxistinî û çapemenî ya kurdên li Ewrûpayê bi navê "Konferansa Stokholmê" konferansek hat amadekirin. Di konferansê de çend zanayên kurd di warên xwe de semînerine pêşkêşî konferansê kirin. Ji ber karên teknîkî heta niha me nekarîbû di Berbangê de cî bidin wan semîneran. Ji vê hejmarê û pê de em ê peyderpey wan nivîsaran çap bikin.

Rewşa Kurdan Li Welatên Îskandînavî



OMER ŞÊXMÛS:
Lêkolîner li Uniwersîta Stokholmê:

Di warê polîtîka wergirtina penaberan de rewşa welatên Îskandinavî cihêtir e ji ya welatên din. Finland hejmareke kêm a penaberan werdigre. Ew bixwe karkeran dişîne welatên din ên îskandînavî. Lê van salên dawîyê baştirbûna ekonomîya Finland bû sebeb ku gelek karkerên wan vegerin welatê xwe. Her weha ji ber hewl û zixta welatên îskandînavî, Finlandîyayê hejmara standina penaberan zêde kir. Kurd li Finlandîyayê kêm in. Di salên 1960 î de yek -du kurd lê hebûn. Lê par û pêrar hinek penaberên kurd ji Kurdistana Îranê û Îraqê li wir bi cî bûn. Wek karker kurd li Finlandîyayê tune ne.

Li Norweçê polîtîka wergirtina karkerên bîyanî wek Danmark û Swêdê di salên 1960 î de dest pê kir. Piştî salên 1970 û dîtina petrolê li Norweçê, hatina karkerên bîyanî zêdetir bû.

Karkerên ku di salên 60 î de hatine Danmark û Swêdê bi piranî ji Kurdistana Tirkîyê û ji devera -Konya- Kûlûyê bûne. Piştî salên 1970 kurdan wek penaber jî berê xwe dane Swêd, Danmark, Norweç û Finlandîyayê. Karker û penaberên kurd li bajarên mezin ên van welatan dijîn.

Hejmara Kurdên li welatên îskandînavî bi giştî bi vî awayî ye.

Swêd .....9 - 10 Hezar
Danmark ..... 11 Hezar
Norweç ..... 1000 Kurd
Finlandîya .....Nêzî 30 Kurdan

Di warê wergirtina penaber û jîyana wan de polîtîka welatên îskandivavî cihêtir e ji ya welatên din. Polîtîka Swêdê ew e ku di zûtirîn wext de bîyanî têkevin nav civaka swêdî. Û bîyanî xwedîyên hemû mafan in yên ku yekî swêdî hene. Ji ber vê yekê dewlet kursa zimên vedike, alîkarîya ekonomîk dike. Karker li ser hesabê xwedîyê kar dikarin biçin kursên zimanê swêdî. Zarokan mafê xwendina zimanê zikmakî heye.

Lê wek hemû karkerên bîyanî yên li Ewrûpayê, çend problemên bingehîn ên karkerên kurd jî hene:

1. Ji ber ku ziman nizane, karê herî xirab, yê bê tecrûbe, karê ku xelkê wî welatî bixwe nake, bi dest wî dikeve.

2. Ji ber vê yekê, tevî ku qanûnên heyî û ji ber tebîeta karê wî, me'aşê wî kêm e.

3. Ji ber ku ziman nizane, bi piranî bi alîkarîya zarok, dost, nas an bi riya dezgehên dewletê înformasyon di derheqa vî welatê nuh de distîne, karekî baştir ji xwe re digere.

4. Ferq û cudahîya dezgehên resmî bikin ji bo wan problemeke mezin e. Bo nimûne, Dezgeha Kar Ditînê, ya Xwendinê, ya Xanî Dayînê, yan jî Beledîye ferq û cidahîyê dixin navbera bîyanîya û xelkê wî welatî.

5. Ji bilî kesên nexdwenda yan bê sin'et, bîyanîyên ku xwedî diploma yan xwedî sin'et in jî zehmetîyeke mezin dibînin û demeke dirêj dimînin ta ku karekî li gor xwendina xwe peyda bikin. Di vî warî de li welatên îskandînavî gelek kurd hene ku xwendina xwe li van welatan xilas kirine, lê kar bi dest wan nakeve.

Ji sala 1967'an û vir de êdî mesela wergirtina karkerên bîyanî bo Swêdê û welatên din yên îskandinavî bi dawî hatîye. Jixwe kurdên ku piştî wan salan hatine bi piranî penaberên kurd yên ji her çar perçên Kurdistanê ne.

Di gel problemên ku karkerên bîyanî pêrgî dibin, hinek problemên taybetî jî derdikevin pêşîya penaberên kurd.

1. Zehmetîya multecîyê kurd dibine dema ku ji welatê xwe derdikeve. Ji ber ku piranîya wan kesên sîyasî, yan pêşmerge ne, nikarin bi riyên qanûnî ji welêt derkevin, mecbûr dibin ku riyên neqanûnî, zehmet, xeter hilbijêrin, ta ku bikarin xwe bigihînin welatekî din. Her weha kesên welatperwer dixwazin li welatê xwe bixwe di nav gelê xwe de bijîn. Biryareke ne hêsan e ku mirov dev ji welatê xwe, axa xwe, hevalên xwe berde û derkeve. Lewra ji kesên sîyasî re biryara derketinê biryareke mesîrî ye.

2. Piştî derketina bo welatekî cîran, li wir jî hebûn û mana wî ne qanûnî ye. Tirsa girtinê, jîyana aborî li pêş wan problemine ciddî ne.

3. Derketina wan ji welêt tesîreke negatîf li rewşa wan ya psîkolojîk dike.

4. Îro bi giranî ji cîhana siyem (Efrîqa-Asya-Emrîka Latînî) penaber tên Ewrûpayê. Lê ji ber pirbûna hejmara wan niha piranîya welatên ewrûpî sînorên xwe ji wan re girtine. Yekî penaber pir bi zehmetî dikare xwe bigihîne welatekî ewrûpî. Gelek kes bi rojan, bi mehan ji firokexanekê diçin yeke din, ji welatekî diçin yekî din ta ku bikarin çi li wî welatê wan bixwe hilbijartî, yan li welatekî din bi cih bibin. Piştî gihiştina welatekî problemên nû dest pê dikin, ez ê pir bi kurtî qal bikim.

a) Wext jê re divê ta ku tehqîq pê re bêt kirin. Di vî warî de problema mezin ew e ku kurd hemû ji welatên wilo tên ku demeke pir dirêj e demokrasî li wan welatan tune bûye û dîtina kurdan

→

ya li ser dezgehên dewletî yên li van welatan negatîf e, bawerîya wan bi dezgehan tune ye. Dema kurdek tê welatekî ewrûpî, cara pêşîn polîsan dibîne. Kurdên ku berê Ewrûpa nedîtibin û zanîn û tecrûba wan li ser jîyana Ewrûpayê tunebe, ne amade ne ku vekirî mesela xwe ji polîs re bibêjin. Gelek tiştan vedişêrin, nabêjin. Tecrûba wan ew e ku dezgehên polîs yên li Rojhilata Navîn bi hev re kar dikin, înformasyonan didin hev. Ji ber vêya newêrin her tiştê xwe bibêjin. Difikirin ku ew tiştê ji polîs re dibêje, wê bi riya INTERPOL'ê bigihe polîsê welatê ku ew jê hatîye û tesîrê li ser rêxistina wan, aîla wan, hevalên wan bike. Bi taybetî kurdên ku li girtixanan mane, îşkence dîtine naxwazin serpêhatîyên xwe bibêjin. Çinkî dixwazin wan tişta ji bîr bikin.

b) Problema din jîyana li kampan e. Du, sê, çar salan li benda îqamê man e. Penaber carna bi salan li kampan dimîne. Di vê demê de danûstendina wî bi tenê li gel kesên ku li kampê ne heye. Problemên ekonomîk bi serê xwe muşkûleyeke mezin e. Her weha du, sê, çar salan li benda îqamê man tesîreke negatîv li rewşa wî ya psikolojîk dike.

c) Paş derketina îqamê, divê ew kesê penaber hînî ziman bibe, karekî bibîne, xanîyekî peyda bike, bibe xwedîyê dost û hevalên nû. Bi kurtî dest bi jîyaneke nû bike. Ev jî dibin sedemên gelek problemên nû.

Kultura milletê nû, sîstema civakî, sistema ekonomî, sîstema siyasî pir cihêtir e ji ya welatê jê hatî.

Kurdên ku tênê Ewrûpayê pêrgî kultureke nû, cihê û bîyanî dibin û wek piranîya bîyanîyên din, gelek problem derdikevin pêşîya wan ta ku bikaribin bi civaka nû re biguncin. Gelek cara her du kutur -ya welatê jê hatî û ya welatê nû- di nav şerekî de ne. Û ev yek jî dîsan tesîreke negatîf li ser jîyana zarok, jin û zelamê kurd dike. Danûstandinên civakî û civaka nû, karkirina jinan, tesîrê li malbatan dike, nakokî di navbera mêr û jinan de peyda dibe. Encama vî tiştî jî ew e ku jihevcihêbûn, hev dûberdan roj bo rojê di nav kurdan de zêde dibe. Jîyana nû probleman di warê xwedîkirin û perwerdekirina zarokan de peyda dike. Zarok berî dê û bavan hînî ziman dibin û zûtir bi civakê re diguncin. Dê û bab êdî nikarin bo nimûne wekî berê di dersên wî de alîkarîya wî bikin. Li vir zarok alîkarîya dê û babê xwe dike; li bazar, li dayirên resmî ji wan re dibe tercuman, nivîsên bi swêdî, frensî, elmanî werdigerîne bo kurdî.

Di warê xwendinê de jî zarok û ciwanên kurdan pêrgî probleman dibin: Zarokên kurdan bi vajîya piranîya zarok û ciwanên bîyanî yên din bi problem tênê ji derve. Li welatê wî, zimanê wî qedexe ye. Ev yek gelşan di îdentîteta wî de peyda dike. Ji ber ku li welêt bi zimanekî din xwendina xwe dike. Zimanê wî yê zikmakî bi tenê zimanê rojane ye, ne yê xwendinê ye û pêş ji nakeve. Lewra zarokên kurd xwe pir dêşînin, daku bikarin di civakê de pêş bikevin.

Zarok û ciwanên bîyanî di xwendina xwe de qasî zarok û ciwanên wî welatî ser nakevin, ji ber ku bi zimanekî bîyanî dixwînin. Hinek ji wan zû dest ji xwendinê berdidin û dest bi kar dikin. Sîstema xwendina li van welatan cudatir e ji ya welatên kurd jê tên. Enstitu, xwendingehên pîşeyî, kolej pir in, laboratuar û hemû malzemên xwendinê hene. Lê ji bo ku mirov bikare li unîwersîteyan bixwîne, divê derecên meriv baş bin. Şaşîtîya ciwanên kurd ew e, berî ku ziman baş bizanin, sîstema xwendina li wî welatî baş bizanin, pir zû dest bi xwendina unîwersîtê dikin. Xwendkarên kurd ji alîyê teorîk û pratîk de ne di mustewayê xwendkarên wî welatî de ne. Zimanê wî têrî nake, mustewayê xwendinê bilind e. Lewra xortê kurd salekê, du salan dixwîne, paşê mecbûr dibe, dev jê berdide. Di warê xwendina unîwersîtê de problemeke din jî ev e ku eger meriv di dersên xwe de ne serketî be, li welatên îskandînavî ew pereyê ku mirov ji bo xwendinê distîne, tê birîn û mirov nikare xwendina xwe berdewam bike.

Li dawîya gotina xwe ez dixwazim li ser noqteyekê rawestim ku di van 3-4 salên dawî de tesîreke mezin li rewş û jîyana kurdên li Swêdê kir, ew jî mesela kuştina serokwezîrê Swêdê Olof Palme ye. Piştî kuştina wî, piranîya masmedîa Swêdê, serokpolîsê Stokholmê navê kurdan anî ortê. Tevî ku çi Dayîra Bîyanîyan, çi hukûmetê, çi hinek swêdîyên xwedî mesûlîyet hewl dan ku vê tesîrê hilînin, lê spekulasyon û galgalên di vî warî de; çi li ser Kurdan bixwe, çi li ser dîtina swêdîyan di derheqê kurdan de tesîreke pir negatîv kir.

Spekulasyonên li ser kuştina Olof Palme hatin kirin -ku"di kuştina wî de destê Kurdan heye"- û bi çend awayan ajotina vê kampanyayê, çi li cihê kar, çi li xwendingehê, çi li malê tesîreke xirab li zarok û jin û zelamê kurdan kir. Tesîra herî xirab ya wê çaxê -piştî pûçbûna teorîya kesên ku kuştin dixistin stûyê kurdan, rewş piçekî baştir bû- li ser kurdan bixwe înkarkirina îdentîteta xwe, kurdbûna xwe bû. Wê çaxê gava ji kurdekî dihat pirsîn: "tu çi milet î?" Nedigot «ez kurd im», digot «ez tirk im», yan «îraqî me», yan «sûrî me», ji ber ku bi çavekî xirab lê neyê nêrîn. Bi dirêjahîya 3 salan spekulasyon û galgalên pir mezin li ser Kurdan hatin kirin û gotin. Bi çavekî neqenc li Kurdan hat nêrîn, hinek kurd ji karên xwe hatin avêtin, hinek ji ber ku kurd bûn, kar yan xanî bi dest wan nediket. Zarokên din li xwendingehan ji zarokên kurd re digot "Hûn kurd terorîst in". û.h.w.d.

Tesîreke din: kurd di warê sîyasî, rêxistinî û karê kulturî de yek ji aktîvtirin miletan e. Lê, di wê demê de me li Swêdê dît ku kurdan profîleke pir bêdeng û nizim stendin. Li danberheva aktîvîta kurdan ya berî kuştina Olof Palme û piştî wê mirov dikare ve yekê bibîne. Dîsan hinek kurdan piştî kuştina Olof Palme bi salekî, du salan nema karîn tehemula vê rewşê bikin û Swêd hiştin, çûn welatinê din.

Ji bilî tiştên li jor, kuştina Palmê di jîyana rojane de gelek tesîr li kurdan kir. Lê girêdana kurdan bi kuştina Olof Palme re tesîreke pir negatîv li danûstendinên kurdan û swêdîyan kir. Li Swêdê di salên 1969,1973,1983 û 1987'an de anketek li ser miletên bîyanî yên li Swêdê çêbû. Di van anketan de li ser 20 miletên bîyanî fikra swêdîyan hat pirsîn. Ji bilî anketa 1987'an, di hemû anketên berê de kurd di rêza 10-11'an de bûn. Lê di anketa 1987'an de dîtina swêdîyan li ser kurdan hatibû guhertin û kurd di rêza herî dawî, di rêza 20 î de bûn.

Hevalên hêja, wek berê jî min got, ji ber kinbûna wext min axaftina xwe kurt kir, lê di beşa panelê de em dikarin dîsa vegerin babetê xwe û li ser bipeyivin.

Rewşa Kurdan Li Hollandayê



BARAN:

Nûnerê Nawenda Kurd li Hollanda

Rewşa jinên kurd ne pir baş e. Jinên kurd bi piranî malbatên karkeran in. Ji ber tesîra dîn û 'edet û teqalîdên kevin, jinên kurd ji malên xwe dernakevin. Rojên wan bi karê nav malê û bi xwedîkirina zarokan derbas dibe. Hîn jî li Holandayê bi çarşefan digerin.

Piranîya karkerên kurd li Holandayê ji gundên Kurdistanê hatine û gundî ne. Di warê xebata demokratîk û sîstema karkirinê de bê tecrûbe bûn. Hem ji ber nizimbûna hestê netewî, hem ji ber tesîra dinê Îslamê û karên dewleta tirk, ev karker bi piranî beşdarî xebata komelên tirkan û yên dînî bûne. Ji bo ku dewleta tirkan bikare karkerên kurd li Hollandayê ji xebat û şîyarbûna netewî dûr bixe, dînê Îslamê bi kar anîye û tîne û di vî warî de heta cîyekî bi ser jî ketîye. Îro li hemû bajarên Hollandayê tevgera îslamî tesîra xwe li ser karkerên kurd heye. Ew bi riya komelên dînî ku ji alîyê dewleta tirkan ve hatine danan û tên finanse kirin, karê xwe didomîne. Her weha komelên dînî yên ser bi terîqetan ve jî hene. Ev komelên he di nav karkerên kurd de û li mizgefatan dijî tevgera rizgarixwaz a kurd propaganda dikin, fikra tirkbûnê di nav wan de belav dikin, dijatîya mezhebî dikin. Tevger û komelên demoratîk ên tirk jî gava gotin tê ser tevgera kurdî, ji komelên dînî ne pêşdetir in. Ew qaşo demoratîk in û ji bo parastina mafên demokratîk ên tirkan hatine avakirin. Geşbûna xebata netewî li Kurdistana Tirkî -pştî 1975- tesîra xwe li karkerên kurd ên li Ewrûpayê jî dike. Bere-bere bi kurdbûna xwe û bi rewşa welatê xwe dihesin. Li sala 1976'an çend karkerên kurd li Hollandayê bi navê "Aborî" komeleyeke binerd dadimezirînin. Ev komele ji aliki ve li dijî derew û kirinên konsolosên tirkan dixebitî, ji alîkî ve ji bo mafên aborî têdikoşî. Lê tesîra dînî li ser vê komelê jî hebû. Endamên komelê civînên xwe bi "Fatîha" yê vedikirin û bi dawî tanîn. Sala 1982'an xebata vê komelê bi dawî hat. Piştî 1971'an û heta niha hejmareke karkerên turist (dizî)û penaberên kurd hatine Holandayê. Piştî hatina wan komelên demokratîk ên kurdan ava bûn û piranîya karkerên dizî û penaberên kurd beşdarî xebata van komelan dibin. Rewşa karkerên dizî ên li Hollandayê baştir e ji yên welatên din. Ew dikarin perê sîgortayê, perê zarokan, perê nexweşîyê an yê iznê werbigrin. Dikarin ehlîyeta tirimbêlan derxin û tirimbêlan bikirin. Karkerên kurd ên dizî bi piranî di karên bexçan de, li lîmanan û li bazara masîyan kar dikin. Piştî şkestîna şoreşê li Kurdistana Iraqê (1975), hatina hukûmeta Îslamî li Îranê (1979), cunta leşkerî li Tirkîyê (1980) û şerê Îran û Îraqê, penaberên kurd hatin Hollandayê. Panaberên ku bi riya komele û rêxistinên Koma Miletan hatine, pêrgî problema îqamestendinê nebûne û rewşa wan baştir e ji yên din. Rewşa penaberên ku bi imkanîyetên xwe hatine, cihê ye. Ew demeke dirêj li benda îqamê dimînin. Hinek ji wan 6 salan li benda îqamê mane. Penaberên piştî 1978'an hatine, tev bi hev re bi mehan li kampan dimînin û her heftî 20 goden pere werdigrin. Ew her tim di bin kontrola polîs de ne. Piştî ji kampan xilas dibin, 3-4 kes di xanîyekî de dimînin û mehê her yek 445 goldena werdigrin. Tev penaberên ku li Hollandayê dimînin divê ji bo kontrolê biçin ba polîs. Penaber li gor pêwîstîyên xwe hînî ziman dibin. Divê her yek ji wan hinek mesrefa xwendina zimên bigrin ser xwe. Kursên zimên yên ku penaber diçinê ne bi rêkûpêk in.

Li Hollandayê sala 1988'an qanûneke nû ya penaberîyê derket. Bi vê qanûnê wergirtina penaberan zehmetir bû û mafên wan ji kêmtir bûn. Ev jî bû sebeb ku jîyan nexweştir bibe, nexweşîyên psîkolojîk rû bide. Di nav 7 mehên piştî derçûna qanûna nû de 3 penaberan xwe kuştin ku 2 ji van kurd bûn.

Rewşa jinên kurd ne pir baş e. Jinên kurd bi piranî malbatên karkeran in. Ji ber tesîra dîn û 'edet û teqalîdên kevin, jinên kurd ji malên xwe dernakevin. Rojên wan bi karê nav malê û bi xwedîkirina zarokan derbas dibe. Hîn jî li Holandayê bi çarşefan digerin. Van salên dawî jinên kurd bi navê "Afretanî Kurd" komeleyek ava kirin. Lê jinên ku beşdarî karê komelê dibin, li gor nifûsa jinên kurd pir kêm in û ev komele kovarek bi navê "Yekbûn" derdixe.

Piştî van gotinan mirov dikare texmin bike ka rewşa zarok û ciwanên kurd çawa ye. Zarokên kurd berî ku biçin xwendinê, dest bi kursa Qûr'anê dikin... Belkî li we xerib bê, lê zilma îro li Tirkîyê li ser kurdan heye -weke rakirina navên bi kurdî yên gund û bajaran, deşt û çîyan, qedexebûna navên kurdî li Hollandayê ji tê domandin. Erê bajar û gundên kurdan li Hollandayê nînin, lê qedexe ye ku mirov navên bi kurdî li zarokên xwe bike. Konslolosên tirkan li hemû bajarên hollandî lîstên navên bi tirkî belav kirine û navên bi kurdî di van lîstan de tunene. Beledîyên hollandî navên bi kurdî li ba xwe qeyd nakin, ta ku nivîsek ji konsolosê tirkan neyê, yan ji komeleyeke kurd li ser meselê bi tundî nexebite. Rewşa xwendina zarokan jî ne pir baş e. Za→

www.alanakurdi.org

Rewşa Kurdan Li Elmanya Rojava



'ELÎ TUKO:
Nûnerê K.K.D.K.-Elmanya Rojava

Li gor qanûnan eger mirov 10.000 îmzan berhev bike, dikare mafê xwendina zimanê zikmakî werbigre. Berî vê bi şeş salan kurdan ji bo vê yeke 20.000 îmze berhev kirin, dan hukûmetê. Ji me re gotin; "erê rast e, qanûnî ye, lê polîtîka me dest nade ku em qebûl bikin". Ku hingê Sosyal Demokrat li ser hukum bûn.

Li Elmanyayê hinek problemên kurdan hene ku li welatên din tune ne. Bo nimûne polîtîka dewleta elman di derheqa kurdan de pir negatîv e. Îro li Elmanyayê piranîya rêxistin û dêr qebûl dikin ku li Elmanya Federal nêzî 400.000 kurdan dijîn. Lê belê hukûmeta elman bi awayekî resmî hebûna kurdan qebûl nake. Ew, kurdan li gor peseportên wan, ji kîjan welatî hatibin ji wî milletî; tirk, ereb yan faris dihesibînin. Li gor qanûnên elmanî divê kurd wek milletekî serbixwe bên naskirin. Lê ji ber danûstendinên xwe li gel Tirkîye-Îraq û Îranê, vê yekê qebûl nakin...Problema navên bi kurdî; Elmanya xwe welatekî demokratîk dihesibîne, lê navên bi kurdî li ba xwe qeyd nakin. Weke ku li Hollandayê; konsolosxanên tirkan lîstên navan ji meqamên elmanî re şandine; gava mirov biçe ji bo ku zarokê xwe bisecilîne, bo nimûne mirov dibêje: "ezê navê keça xwe deynim Jîyan, yan Zozan". Ew li lîstê dinêrin, dibêjin: "Ev nav di lîsta ku tirkan ji me re şandî de nîne, ji ber vê yekê em nasecilînin". Li dijî vê yekê gelek protesto çêbûn, lê heta niha jî ev rewş berdewam e. Li hinek eyaletên Elmanya navên bi kurdî tên secilandin, belê bi giştî ev yek nehatîye qebûlkirin. Lewra kurd ne ji ber ku bi tenê biyanî ne neheqî li wand dibe, li orta Ewrûpayê ji ber ku kurd in jî neheqî li wan dibe.

Di warê jîyana civakî de diwxazim çend gotinan bikim: Li gor qanûnên elmanî, ji bo her grûbeke bîyanî rêxistinek hatîye avakirin ku bi karûbar û problemên wan bilî bibe. Ev rêxistin girêdayî Parlementoya Elman ya Federal in. Meselan "AVO" bi karûbarên tirkan re, "KARITAS" bi yên yûgoslavan re mijûl dibe û.h.w.d. Kurd ji ber ku tirk, ereb, faris tên hesibandin, ji bo wan rêxistinek wilo nehatîye avakirin. Me li ser vê yekê gelek gazind kirin, konferans çêkirin, me nerazîbûna xwe xuya kir. Lê dema em ji wan dipirsin, dibêjin "em alîkarîya kurdan jî dikin". Em delîlên berbiçav ji wan dipirsin, em daxwaza rêxistineke wilo dikin; ava nakin, nahêlin navên bi kurdî li zarokên xwe bikin, li beledîyan karmendên kurd nînin ku di karûbarên rojane de alîkarîya kurdan bikin.

Kurd bi hejmara xwe piştî tirkan û yugoslavîyan di rêza sisîyan de ne. Li gor qanûnan eger mirov 10.000 îmzan berhev bike, dikare mafê xwendina zimanê zikmakî werbigre. Berî vê bi şeş salan kurdan ji bo vê yeke 20.000 îmze berhev kirin, dan hukûmetê. Ji me re gotin; "erê rast e, qanûnî ye, lê polîtîka me dest nade ku em qebûl bikin". Ku hingê Sosyal Demokrat li ser hukum bûn. Jixwe hukûmeta îro ji binî xwe nêzî vê yekê nake. Heta bi meriv re li ser vê yekê napeyive jî. Wezîrê Karên Derve di vî babetî de ji me re dibêje: "Eger em vî mafî bidin kurdan, emê bîyanîyên li Elmanyayê bera hev bidin".

→

rokên bîyanîyan nikarin biçin hemû dibistanan. Ew diçin wan dibistanan ku bi piranî bîyanî diçinê. Sîstema dibistanan pir cihê ye. Piştî dibistana destpêkî, sistema dibistana navîn welê ye ku piştî dibistanekê bi tenê zarok dikarin biçin li unîwersîtê bixwinin, yan ne divê zarok an ciwan biçin dibistanên teknîkî, yan akademî, yan civakî. Bi piranî kurd zarokên xwe naşînin dibistanên bilind. Hejmara kurdên ku li unîwersîteyan dixwînin pir kêm e. Zarokên kêçik kêm diçin dibistanê. Lê hema bêje giş zarok diçin kursa Qur'anê. Her weha hinek zarokên kurd diçin kursên "Teak-wan-do, judo, box", Komelên îslamî salon û kursên "Judo-Teak Wan Do" vekirine. Bi vî awayî zarok ji xwendinê, ji tevgera xwe ya netewî dûr dikeve. Di xortanîya xwe de zarokên kurdan tevî zarokên tirk beşdarî karê komelên Tirkan û komelên dînî dibin. Hukûmeta Holandayê kurdan wek milletekî cihê, serbixwe qebûl nake. Lewra zarokên bixwazin jî nikarin wek zarokên bîyanî yên din di dibistanan de fêrî zimanê xwe yê zikmakî bibin. Sala 1986'an û vir de li bajarê "Arnham" ji alîyê komela KOÇ-KAK'ê ve dersên kurdî ji bo zarokên kurd tê dayîn.Ev kar salekê bêyî izna resmî hat ajotin, paşê beledîya bajêr biryara resmî da. Lê heta niha jî hejmara şagirtan ji 15 an derbas nebûye.

www.serxwebun.org

Ango wê dubendî di navbera wan de peyda bibe. Lê bê guman ev bersiveke bê bingeh e. Li ser weşanan di telewîzyon û radyoyê de jî bersiva wan yek e. Nadin. Tevî ku tirkan, yugoslavîyan, yewnanîyan, îspanyîyan, portekîzîyan ev maf heye. Hejmara kurdan ji ya gelek grûbên bîyanî bêtir e, lê dîsa vî mafî nadin me. Ji bilî ku li hinek cihan piştî xebat û keftelefteke mezin me karîye 15 deqîqan, ew ji li ser nûçeyên nav bajêr bixwe mafê peyvîna di radyoyê de bistînin.

Her weha li gor qanûnên elmanî, komelên civakî dikarin ji dayîra "Rêdana kar" li gor pêwîstîyên xwe çend karkeran bixwazin. Wezareta Kar û Wezareta Sosyal bi qerarnameyekê rê li ber komelên kurdan girtin ku nekarin vî mafî bi kar bînin. Me bi awayekî resmî daxwaza vê yekê ji wan kir, di bersiva xwe ya resmî de ji me re gotin ku: "Hûn bi karên civakî mijûl nabin, karê hûn dikin ne interesa xelkê ye." Tevî ku em ji kurdan re tercumanîyê dikin, em di karên rojane de alîkarîya kurdan dikin. Ew her li ser bersiva xwe man. Niha ji ber vê çendê me hevdû daye mehkemê. Gava em ne bi riyên resmî, lê bi devkî bi hevdû re dipeyivin, ji me re dibêjin: "Hûn kurd in, dema em vî mafî bidin we, wê nava me û Tirkîyê nexweş bibe, wê nava me Îraqê, Îranê nexweş bibe. Em ji dizanin ku nêzî 400.000 kurdan li vir dijîn. Lê polîtîka me dest nade". Ev bersiva wan ya eşkere ye.

Zarokên kurdan jî ji ber ku mafê xwendina zimanê kurdî tune ye, hînî zimanê tirkî dibin, di mektebên tirkan de dixwînin. Îcar eger hûn pirtûkên tirkan ên li ser tarix û ziman û babetên din bînin pêş çavên xwe, hûn ê bikarin texmîn bikin ku çi hînî zarokên kurdan dikin. Ji ber vê yekê jî gelek malbatên kurd zarokên xwe naşînin mektebên tirkan. Bo nimûne li bajarê "Sele" û li hawîrdor nêzî 30.000 kurd hene, malbateke bi tenê jî zarokên xwe neşandin mektebên tirkan.

Rewşa penaberan pir xirab e. Bi salan li benda îqamê dimînin. Hinek şeş, carna heşt salan li hêvîya îqamê mane. Penaber tev li kampan dimînin, hinek heta 4-5 mehan alîkarîya maddî nastînin. Polîtîka penabertîyê li gor eyaletan diguhere.

HELBESTEK ji kampên penaberên kurd li Turkîyê

SÊ GOTIN JI FERHENGA RASTÎYÊ

H. Hirorî

1

Kekê mino,
Dibêjin:
Salêt xela ji kêmavî ne!
Lê dibêjim: Na, wa nîne.
Ewir hatin..
Hindeka got: Ewrêt me baran lê kir!
Hindeka got: Barana me
Sikir û kevî dane ber
Li korka peng kirin
Lewma ma beyar û
Li ber germê zevîka me kuzirî.

2

Gundîyêt me
Bi şev serevraz li heyvê dinêrin
Li hîvîyê ne û ji xala wan ve
Heyv birsê dikujit!!
Lê heyv bi dirêjîya şeva
Dibite sal û
Dibit taryatî û
Dibite şev

3

Aveka boş hat û
"PIRA SELAWATÊ" di gel xwe rakir û bir
Terazîya guneh û çakîya
Gunehêt min kirne layekî û
Layê dî boş rakir!!
Li wî demî
Çakîyêt min bûne belatînka aştîyê
Nava destêt min yêt peqîn û
Binê pêt rûs
Kevilê xwe radkire ve
Parçêt dî di leşê min de
Hemî pêkve dibûne agir.

** Helbesta jorîn a pêşmergeyekî mişext e ku ji kampa multecîyên kurd,* ji Mêrdînê ji Berbangê re hinartîye.

Rewşa jinên kurd li Elmanyayê ne baştir e ji yên welatên din, eger ne xirabtir be. Piranîya wan ne xwenda ne. Bi tenê bi kurdî dizanin. Her tim li malê ne. Danûstendina wan bi civaka elmanî re an bi bîyanîyên din re tunene. Gotinên heval Baran ên li ser jinên kurd li Hollandayê ji bo jinên kurd ên li Elmanyayê jî derbas dibe. ●

www.arsivakurdi.org



Amadekirin:
Mamoste û
M. Lewendî

Du rûpelên serbixwe yên bi Berbangê ve girêdayî ne.

YEKÎTÎYA NIVÎSKAR û YÊN KU BIBIN NIVÎSKARÊN KURD LI SWÊDÊ LI DAR KET

Hefteyek berî Cejna Qurbanê, li bajarê Stokholma xweşik, di xanîyekî kevnik de nivîskar û yên ku bibin nivîskar hemû hatin ba hev, civcivînek li dar xistin.

Civcivînê bi hilpifandina qoltixê - pardon yanî bi hilbijartina dîwanê - dest pê kir. Paşê jî çend kesên ji komîta lidarxistina vê yekîtîyê, raporên xebat û program û peyrewa yekîtîyê xwendin. Di raporê de li ser pêwîstîya lidarxistina Yekîtîya Nivîskarên Kurd û Yên ku Bibin Nivîskarên Kurd hat sekinîn.





Ji roja pîrozkirina diran derketinê

Û dan dîyarkirin ku wan ji bo çi Yekîtî li darê xistine.

Piştî munaqeşe û pêşnîyarkirina plan û programên 'ecêb û giran, civcivînekê - ne bi darê zorê - lê bi zorê Komita Karkirrr hilpifand (wîî! Ev çi bû?!), qey hilbijart.

Eşxaszadetirînên eşrafên herî muşerefên şexsîyetên menşûr jî teşrîfî vê civînê kirin, lê zû revîyan.

Ew kesên ku ji bo Komîta Karkir a Yekîtîya Nivîskar û Yên ku Bibin Nivîskarên Kurd hatibûn hilpifandin ev in:

Xurşo Xemşîd
Hafiz Mehfûz
Xelo Beran
Zaynir Exsamo
'Ebdulqadir Qendîl
Masûr Axbandir.

www.arsivakurdi.org

KERÊ MELÊ

Li hêla Mêrdînê, li gundê 'Ewêna her kes xwedî ker e. Gundî her şev li mala yekî rûdinin û behsa başî û xurtîya kerên xwe dikin. Her şeva gundî dicivin, melê gund jî her tim li wê ye.

Rojekê serê sibê mele li kerê xwe siwar dibe û dixwaze bar bike. Gundîyek li ser xênî ji melê dipirse:

- Bi kûde diçî, mele?

- Ez êdî li vî gundî namînim, ev gund ji min re heram e!

- Çima mele? Kanê bêje çi bûye?

Hinek gundîyên din jî tên, hemû li hev şaş dimînin, ji hev dipirsin, lê kesek pê nizane ku mele jį bo çi xeyidîye. Gundîyek ji melê dipirse û mele jî dibêje:

- Ma xudê jê razîno, ev serê çend mehan e ku ez li gundê we me û melatîya we dikim, hûn her şev rûdinin, qala kerên xwe dikin, we tu rojekê qala kerê min nekiriye. Ma ev e insanetî, ma ev e musulmanî?

Gundî hemû li hev dicivin, paşî digihîjin qerarekê ku gundîyek li ser xênî biqîre û bide dîyarkirin ku kerê melê li gund baştirîn ker e û gundî diqîre û dibêje:

Ewêna xweş 'Ewêna

Sê sed û sî ker lê na

Serekê di kera kerê di melê na!

Piştî vê anonsê kêfa melê tê û berê xwe dide mizgeftê.





Yewm-el ehlul medenî der kenarî behr

www.arsivakurdi.org

HIN ALETÊN NECARÎYÊ

Hûn dikarin navên wan binivîsin?

1- Tevşo
2- Bireka Daran
3- Mîx (bizmar)
4- Metqab
5- Rende
6-Birek.













DEMOKRASÎ

- Dibêjin ku dergûşa demokrasîyê Yunanîstan e. Bi gotineke din demokrasî li Yunanistanê peyda bûye û li dinyayê belav bûye.
- Ma Yunanîstan ne nêzîkî Kurdistanê ye?
- Belê !
- Aaaaa... ez niha dizanim ji bo çi demokrasî negihîştîye Kurdistanê.
- Ji bo çi?
- Ji ber ku di mabêna me û demokrasîyê de leşkerên tirkan hene, lewra demokrasî negihiştîye welatê me.

EZ DIZANIM

Tu dikarî peyva rast li cihê vala binivîsî?

Wî şewqê ..... derxist.	defter - xwe - kêr
Ew tê ba	diçe - te - mase
Wê fîstanê xwe.....	şûşt - av - dukan
Ew tê ba.....	hîv - cam - min

KEN! EW ÇI YE?

KURÊ MIN

- Kurê min tu pir şîrîn bûyî.Were vir ku dîya te, te maç bike.
- Dayê, tu çawan dizanî ku min kîloyek şekir xwarîye.

ŞEVA ŞAHÎYÊ

- Lawê min, kincên xwe yên xweşik li xwe bike ku em biçin şevê.
- Kîjan şevê dayê?
- Şeva me, şeva kurdan.
- Dîsa?!
- Çi dîsa kurê min?
- "Hûn bi xêr hatin". Dengê zarokan. Govend. Dengê zarokan. Dûmanê cixarê. Dema ku Şivan jî dertê em di xew de ne.

www.arsivakurdi.org







Gizêr

Navê gizêrê yê Latînî Daucus caro'ta ye. Curên gizêran yên yek û du salî jî hene. Kokê hinekan zirav e û nayên xwarinê, wek yên li Asya, Amerîkaya Bakur û gelek cîhên li Ewrûpa. Gizêr, li gorî texmîna, bi tevîhevbûna çend curên Ewrûpa Başûrî, di qirna (dema) kevir û vir de têt çandinê.

Ev gizêreke du salî ye û sala yekemîn têt hilkirinê. Pelên gizêrê li ser axê ne, gizêr bi xwe di bin axê de şîn dibe. Formê wê li gora curan têt guhertinê; wek kurt û girover, zirav û dirêj. Di gizêran de kalorî hindik e, lê vîtamîna A û C gelek e.

ROJA MEMO
- 2 -

Di pêlweşa kurt de radyoya Erîvanê derket. Saetê 16 û 04 nîşan dida. Radyoya Erîvanê jî di saet 16.00'an de dest bi weşana xwe dikir. Nûçeyên cîhanê bala Memo kişand û wî demek kurt be jî tunebûna diravên sînemê ji bîr ve kir.

Her du destên wî di bin serê wî de bûn. Çavên wî li banî bûn. Lê bala wî li ser nûçeyên cîhanê bûn.

Divê gelek zeman derbas bibe, ji ber ku Memo bi dengê telefonê ji nişkave, ji xewê rabû. Memo bi wî moralê xirabî bi dengê nu ji xewê rabûyî, bersiv da.

- Elo!

Hevala wî, dengê wî nas nekir.

Wê got:

Ez dixwazim bi Memo re bipeyivim.

Memo zimanê xwe di devê xwe de zivirand. Tifa xwe daqultand. Du-sê caran kuxî û qirika xwe paqij kir, şunde got:

Dom dike





www.arsivakurdi.org

Çîrok

JI ÇÎYA AGIR DIBARE

Lokman POLAT

Em gihiştin qezê, bûbû êvar. Ez ji teqsîyê hatim xwarê û min rasterast berê xwe da mala Evdilqadir. Qeze li ser hidûd bû û ez jî çûbûm wê ku derbasî binxetê bibim. Di nav qezê de polîsan her gav sûk û çayxane seh dikirin, ji ber vê yekê min newêrîya ez li sûkê bisekinim an li çayxanê rûnim.

Ez gihiştim ber derîyê mala Evdilqadir û min li derî xist. Ji min re derî vekirin, me xêrhatin li hev da û em çûn hundir.

Bîsteke din xwarin anîn danîn ber me, me bi hev re nan xwar, çay vexwar. Evdilqadir telewizyon vekir, got:

"Em zêde li telewizyona tirkan nanêrin. Ya Sûrîyê û ya Îraqê ji ya tirkan bêtir guhdarî dikin. Tu kîjan qenalê dixwazî?"

Min got: "Tu bi keyfa xwe yî. Kîjanê dixwazî, wê veke".

Evdilqadir ya Sûrîyê vekir. Me hem li telewizyonê mêze dikir û hem ji hev re qala sîyasetê û bûyerên rojane dikir.

Di wê navberê de çend saet derbas bûbûn, Evdilqadir ji min re qala kurê xwe yê ku di ordîya tirkan de eskerî dikir, kir. Kurê wî jî wek hemû kurdên din ji mecbûrî çûbû leşkerîya tirkan û wan ew kiribû "Komando". Min û Evdilqadir ji xwe re weha xeber dida, me hew dît yekî li derî xist. Evdilqadir rabû çû ji pacê li derve mêze kir û di cî de xwe paş de kişand, zer û zuwa û bi dengekî nizim got: "Wele cendirman avêt ser mala me". Bi rastî ez jî tirsîyam, min got jixwe ez hatim girtin, ev sedîsed ji bo min hatine. Min ji Evdilqadir re got: "Metirse, tiştek nabe. Tu here derî veke, lê min ji te re berê çawa gotibû, welê îfada xwe bide."

Evdilqadir bi tirs û lerz çû derî vekir û ji keyfan bi dengê bilind got: "Kurê min, tu û li vir. Xwedê tu ji min re şand, niha me qala te dikir." Û ew bi hev re hatin hundir, cilê "Komando" yan li kurê wî bû. Ez rabûm, min destê wî girt, me hev maçî kir û em rûniştin.

Navê kurê Evdilqadir, Evdilkerîm bû. Bi rastî hatina wî ya nîvşevê em hemû şaş kirin. Gelo çi bûbû? Çi qewimî bû ku vê nîvşevê lêxistibû, hatibû? Gelo ji eskerîyê revîyabû, an tiştekî din bûbû? Em di meraqa vê yekê de bûn. Evdilqadir bi meraq pirsî: "Kurê min, te xêr e, te ji "Bolu" yê lê xistîye û tu hatî, çi qewimîye?" Evdilkerîm ji destpêkê heya dawîyê qala hatina xwe ji me re kir. Li Boluyê di te'lîma leşkerîyê de bûne, piştre ew ji wê derê anîne, birine ser hidûdê Îraqê, li ser hidûd leşker tijî kirine. Pêşî teyare hatine û çûne erdê Kurdistana Îraqê, bombe û gulebaran kirine, paşê leşker ketine navça Kurdistana Îraqê. Evdilkerîm domand: "Em derbasî Kurdistana Îraqê bûbûn, di riya çîyê de me dabû pey hev û em bi rê de diçûn. Demeke dirêj bê dengîyek hebû, leşker pir ditirsîyan. Me li der û dorê tu kes an jî pêşmerge nedîtin. Em qasî nîv sa'etî meşîyan û me hew dît bû teqereqa tifingan, keleşkof û reşaş li me girêdan, wek baranê gule dihatin me. Leşkerên ku li alîyê pêşî bûn, hemû hatibûn kuştin, an jî birîndar bûbûn. Leşkerê tirkan ji tirsan tevlihev bûn û belav bûn. Wey li wî, yê ku xwe xelas kir. Hinekan xwe xistibûn nav devîyan, hinekan jî xwe di nav qeşlin keviran de veşartibûn. Min jî xwe dabû piştê kevirekî û min gulên xwe berdidan hewa, min gule tewş davêtin. Min qet nedixwest ez berê tifinga xwe bidim pêşmergan. Ji xwe me nedidîtin ka pêşmerge li kû ne, li kû rûniştîne. Ji her derê gule dihatin me."

Min ji Evdilkerîm pirsî: "Leşkerên Tirk hatin hawara we an ne?"

Evdilkerîm got: "Hatin, hatin lê çi feyde. Li wan çîyayên asê nekarîn tiştekî bikin. Şer demek ajot, piştre me hew mêze kir ku ji serê çîyê vaye gumeguma bîdonan e, teqle davêjin û bi ser me de tên. Bîdonên ku bi alîyê me ve tên hemû jî agir û alawî ne. Pêşmergan bîdon tijî mazot û benzîn kirine, birine serê çîyan û li wir agir berdane wan û bi ser me de gulolo dikin, bi ser tank û eskerên tirkan de berdidin. Ji çîyan agir dibarî. Me digot qey çîya tev bûne agir û alawî û bi ser me de tên. Çaxê eskerên tirk ev tişt dîtin, hemûyan kir hawar û qêjîn û her kes bi alîkî de revîya. Min jî da pey wan, me qasî sa'etekê baz da û bawer bikin me qet li pey xwe jî mêze nekir."

Min û Evdilqadir bi hev re û bi mereq got ê: "Ê dawî çawa bû". Evdilkerîm got: "Dawî eskerê tirkan şkestin, nekarîn bi pêş de biçin. Gelek kuştî û birîndarên wan hebûn. Ji mecbûrî bi paş de kişîyan û hatin vî alîyê hidûd. Paş du rojan qumandarê me hat û ji me re got: "Ji ber ku hûn ketin şerekî giran û we qehremanî kir, ji ber vê yekê ez jî mukafatê didim we û we 15 rojan dişînim îznê. Û paşê karê me çêkirin û kaxizên me dan me û ez jî hatim malê. Lê êdî qet dilê min tuneye ku ez dîsan vegerim, herim ji wan segbavan re eskerî bikim."

www.arsivakurdi.org

Arêkerdox: J. Espar

Çend Deyîrê Zazakî (Dimilkî) - II

ZERENCI

Herê zerenci, to va "mi rî"; mi va "mi rî".
Herê willay çimsîyaya mi, to va "mi rî"; mi va "mi rî".
Zerencî, day û bawkê ma gawir î.
Çimsîyaya mi, dayk û kawkê ma gawir î.
Zerencî, ma zî vistî tê ra dur î.
Çimsîyaya mi, ma zî vistî tê ra dur î.
Zerencî, mela yê zî keydê xwi di nêmirî.
Çimsîyaya mi, mela yaz û yabondê Ellay ra xwi rî bimirî.

Zerencî, to va "şeş o"; mi vo "şeş o".
Çimsîyaya mi, to va "şeş" o; mi va "şeş"o.
Zerencî, eyro şeş o ki ez nêweş o.
Çimsîyaya mi, eyro şeş o ki ez nêweş o.
Zerencî, ez nêweşê beşna weş o.
Çimsîyaya mi, ez nêweşê beşna weş o.
Heywax, mi rî; çimsîyaya mi, mi rî!
Ax lemin dardo, mi ra kulî!

Zerencî, yew vecaya cêr o yeno.
Çimsîyaya mi, yew vecaya cêr o yeno.
Ya zerecda mi moneno.
Ya çimsîyayday mi moneno.
Zerenci, to birx(?) giroto raşonena.
Çimsîyaya mi to birx giroto raşonena.
Zerenci, ti qum û çaxil pê şonena.
Çimsîyaya mi, ti qum û çaxil pê şonena.
Zerenci, ti zerrey min û xwi zî xereqnena.
Çimsîyaya mi, ti zerrey min û xwi zî xereqnena.
Zerenci, ti awkî wena; gerden di asena.
Çimsîyaya mi, ti iskic wena; çaqe di asena.
Ti zerencday koy 'Ebirî(?) monena.
Ti zerencday koy 'Ebirî monena.

Nomey zerencday mi Beyaz o.
Nomey çimsîyayday mi Beyaz o.
Zerenci, qeder bibo, ez to biwozo.
Çimsîyaya mi, qeder bibo, ez to biwazo.
Zerenci, qeder çinêgbo, ez se vaco?
Çimsîyaya mi, qeder çinêbo, ez se vaco?
Zerencî, qeder bibo çinêbo, fayde nêkeno.
Çimsîyaya mi, qeder bibo çinêbo, fayde nêkeno.

Ti zerencay inê zarî.
Ti çimsîyaya înê zarî.
Zerenci, were bêro serday parî.
Çimsîyaya mi, werek bêro serday parî.
Zerenci, ma se kî? ma ismar mendî bêdebr û bêdabarî.
Çimsîyaya mi, ma se kî? Ma ismar mendî bêdebr û bêdabarî.

Zerencî, Koy Şarikşivonî(*) barzê koyon o.
Çimsîyaya mi, Koy Şarikşivonî barzê koyon o.
Zerencî, ti destê xwi bidi mî; ma şêrî mîyon o.
Çimsîyaya mi, ti destê xwi bidi mi; ma şerî mîyon o.
Zerncî, ma destê xwi akî; veyn day Ellay dî.
Çimsîyaya mi, ma destê xwi akî; veyn day Homey dî.
Zerencî, qay ku Homoy ma rî zî di beron ako.
Çimsîyaya mi, ku Homay ma rî zî di beron tê di ako.
Zerencî, yew tilpê hewrdê sîyay arzawo asmêno.
Çimsîyaya mi, yew tilpê hewrdê sîyay arzawo asmêno.
Zerenci, şarê dewday ma zewecawo.
Çimsîyaya mi, şarê dewday ma zewecawo.
Zerenci, min û to rî vewra suri varaya.
Çimsîyaya mi, min û to rî vewra surî varaya.
Heywax mi rî, çîmsîyaya mi, mi rî!
Ax lemin dardo, mi ra kulî!

Zerenci, yew vecaya lewey bonî.
Çimsîyaya mi, yew vecaya lewey bonî.
Ya zerencday mi, monena.
Ya çimsîyayaday mi monena.
Zerencî, ti xwi tadî hokday bonî.
Çimsîyaya mi, ti xwi dati hokday bonî.
Zerenci, qalê min û to zî pê ra xom î.
Çimsîyaya mi, qalê mi û to zî pê ra xom î.
Zerenci, dayê û bawoy ra zî pinon î.
Çimsîyaya mi, dayê û bawoy ra zî pinon î.
Zerenci, verê berdê bawkdê to yew lay a.
Çimsîyaya mi, verê berdê bawkdê to yew lay a.
Zerenci, zerray bawkdê to hera ya.
Çimsîyaya mi, zerray bawkdê to hera ya.
Heywax mî rî, çimsîyaya mi, mî rî!
Ax lemin dardo mi ra kulî!

Ez dest û çepalê zerencday xwi gêno û şono Welatê Çebexçurî(*)
Ez dest û çepalê çimsîyayday xwi gêno û şono Welatê Çebexçurî.
Ez yew qefeso zerên kîra keno, zerencay xwi dekeno.
Ez yew qefeso zerên kîra keno, çimsîyayay xwi dekeno.

Cêr o veca yeno qifleyê keynekono.
Cêr o veca yeno qifleyê keynekono.
Le le yew ha kewta peynîdey yîno.
Hela yew ha kewta peynîdey yîno.
A zerenday mi monena.
A çimsîyayaday mi moneno.
Zerenci, ma zî kewtî şarî ra peyo.
Çimsîyaya mi, ma zî kewtî şarî ra peyo.

Zerencay mi, dehlay dewday ma tarî ya.
Çimsîyaya mi, dehlay dewday ma tarî ya.
Beşnay zerencday mi darg û barî ya.
Beşnay çimsîyayday mi darg û barî ya.
Zerencî, ez geyrawo, mi xwi rî dîya.
Çimsîyaya mi, ez geyrawo, mi xwi rî dîya.
Zerenci, dehlay dewday ma gildar a.
Çimsîyaya mi, dehlay dewday ma gildar a.
Zerenci, ez nêweş o, birîndar o.
Çimsîyaya mi, ez nêweş o, birîndar o.
Zerenci, bêra mi dîyar o.
Çimsîyaya mi, bêro dîyar o.
Willay ez beno weş û waro.
Bîlley ez beno weş û waro.

(*) Şarîkşîvon: Koy sipî ser o yew ca wo.
(**) Çebexçur: Şewligi (Bingol)

WAY Û BIRA

Arêkerdox: O. Wedat Kaymak

Yow way û yew bira benî.

Yow roj bira wa xu ra vano:

- Wa mi, bê ma xu rî şêrî yewna dewi.

A vana: -Biray mi, ez qelbê to nêverdena. Madem ki ti wazenî, ma şêrî.

Xu rî şonî yewna dewi di ronenî. Weyra yow ban virazenî û hinî xu rî te de manenî.

Bira seydvan o. Wa xu ra vano:

- Wa mi, tera boyne (bownî), ez şona seyd, ti keye di manena. Ti qethanî awki ina quli ro bella nêka!

A vana: -Biray mi, ti qet meraq meki.

O hinî şono seyd. Wa jey zî dey rî nan (non) û germi hedirnena.

Inawa zav zeman tay zeman şono, yew roj way xu pîze di vana «biray mi va ina quli di awki bella meki», ez bella ka veynî se beno.

Gêna awka firaqanê xu a quli ro bella kena.

Namey keyneki zî 'Eyşiki bi. Tikê mend, dî ki yewerî veyn da, va:

-'Eyşê, 'Eyşê! Serê ina quli aki.

A serê ja akena, honîna ki yow mêrdek ha zere di. Mêrdek tê ra vano:

- Yow resne mi rî fînena û jey ancena ser.

Mêrdek ja gêno xu rî mare keno. Biray keyneki nêzano.

Çendi aşman ra pey keyneki rî yow gede beno. Mêrdek gedî gêno beno rarî ser o roneno. Wextano ki bira seyd ra yeno, hownêno ki yow pêçeki ha rarê sero ya. O ja gêno, yeno keye. Wa xu ra vano:

- Boyne mi ino gedo rarî ser o diyo. Veyni qe tikê şitê to çino , ti bere da.

A vano: -Biray mi, biray mi, ez yow keynek a. Qey şitê mi kura wo?

O vano: Gurey Ellay belî nêbeno.

A gedî gêno û memikê xu ver a nena. Vana: - Biray mi, memikê mi gillî ra şit o.

Gede hinî xişin beno, beno heşt serre. Mêrdek vano:

-'Eyşê, ma nişnî inawa dewam bikî. Ma ginî(ganî) yow çare biray to rî veynî.

Gede zî jînî goşdareno.

Mêrdek vano: -Ez xu yew mar kena, şona estuna berî ser vindeno û key ki o şan di kar ra hame, ez pede dana.

Şan di bira yeno, gede jey ver a vazdeno, vano:

-Xalo mi bigîri kolikanê xo ser.

O jey gêno kolikanê xu ser û şono zerre. Mêrdek 'enê pede dano, hownêno ki lajê jey o, ca verdano.

Mêrdek vano: -'Eyşê gedî nêverda. Ina ray ez şona xu binê berî ra kena.

Şono xu binê berî ra keno. Şan beno, bira yeno. Gede jey ver a şono, vano:

-Xalo, ez to gêna kolikanê xu ser.

O vano: -Eman, hewar, ti gede yî; ti nişnî mi bigîrî kolikanê xu ser.

Gede vano: - Ney îmkanê jey çino.

Gede jey gêno kolikanê xu ser neno û şono zere.

Mêrdek şono vano: -'Eyşê, gedî nêverda.

Bira hinî xu rî şono citi.

Mêrdek vano: -'Eyşê, ina ray ez xo kena yow varan û tosle û vowri û varena. Ez ginî jey bixeniqna.

Nimajî bira şono şiti. Gede hima neqla xişni gêno, hêrî ser neno û şono xalê xu heti.

Tikê maneno, tosle û varan û vowri tê man (miyan) a varenî. Hema wirdî zî şonî neqli zere û vindenî. Çendi se'etî ra pey varan û vowr û tesle vindenî. Mêrdek vano:

-'Eyşê, gedî gilana nêverda. Ez ina ray şona fekê eynî di vindena, key ki o hame destawa xu guroti, ez pede dena.

Namajî, gedè gilana xalê xu reydi şono citi. Taştarey(Teşterey) gede vano:

_ Xalo, ina ray ez şona awka to to rî ana.

O vano: -Wa bo.

Gede mesîni gêno şono eynî ser. Hoynîno ki mêrdekî ha xu yow mar kerdo û fekê eynî di vindeto. O tîrkemanê xu ve(ver) bere deno, jey kişeno.

Awk û gonî tê man (miyan) benî. Awki tikê gemarêna(gamirêna), gede xalê xura vano:

- Wilay xalo tikê gemari cor di hamey û awki miyan bî.

O vano: - Çî nêbeno.

Mêrdek vano: -Ceneyki, ena ray zî gedî nêverda. Ina ray ti ginî yow taştê (teştê) germi ser na û tikê jar deka, key ki şan di o hame, ti jey ver na.

A şona, germa xu ser nena, tikê jar zî dekena û ja dekena yow tasi zere; gêna sufrî ser o ronena.

Xu rî zî yew tasi dekena û ay kinarê bînî di ronena.

Gede vano: -Day, veng hame!

A vano: Vengê çi yo?

O vano:-Wilay veng hame!

A şona teber. Gede hema cay ay wirdî tasan bedilneno. A yena zere, vano:

- Şeykî (çiyekî) çino, xalê to ha yeno.

Xal yeno, way te ra vano:

-Biray mi, ti owra roşi û a tasi ra bori.

Vano: -Wa bo.

Gedî ra zî vana: - Bê lajê mi, mi reydi bori.

Gede vano: -Ney, ez veyşa(veyşan) niya.

Cenêki di koçikî dana piro, hema ca di kewna mirena. Gede 'ar di tekme (paşkil) dano piro. Xal vano:

- Qey ti danî wa mi ro?

O vano: -Waya çi ya?

Û gede vano hal-mesela ina ya.

Xal vano:-Mêrdek kura yo?

O vano:-Hinik o ha zere di.

Xal berî akena ki mêrdek ha hown di. Fesali kalmey xu vejeno û milê jey dera keno.

Hinî xal û gede xu rî tena manenî(*).

(*) Ina estaneki heway vatiştê yew dewijê qezay Pîran'î nusiyaya.

SURGUN

DILOYO DÊRSIMIC

"Mevac 'nêqedîno', ek rocîk biqediyo."

- Ez nêşino Apo, ez nêşino! Kom şino wa şiro! Ez nêşino! Hema guniya biray mi ziwa nêbiya, goştê yî nêhelesyawo, derbey mi hema ona ya. Nêşino Apo, ti mi fêm nêkenî, nêşino!

Nucikey xo kiştey şibak ra hêrs ra hewa nay.

- Îta ê ma wo! Welatê ma wo, herrey ma ya. May û cenîyey ma ya!

Hêrs ra biroy xo çiqirnay (qirmiçnay), xo şêdna, qulî zincey yî ge bî heray ge nişti; lez lez nefes girewt xelfeta ra (xafil a) verî xo da pî xo, va:

- Hema vizêr, biray mi kişt în zalimon! Ti fêm nêkenî? Nêeş nawenî Apo! Peynîyey temafîley eskeron ra girê da û 'erd ra kaş kerd, hem zî hema gon nêda bi...

Çimonê dekerdon ra yew hesir kewt mîyonî erîşey yî ya newe zergûniyaya. Serey xo wirdî kişton ra leqna bi dec ra.

- Kom zono Apo çina duşunmîş beno? Qiçon xo? Belkî zî. Ombazî yî pawitîn ki bêrî. Bi kerron birîndar kerdîn leşey yî, 'eceba dec ontîn? Biray m', biray m', 'Ezîzê m'. Biray to to rî bimiro 'Ezîz...Kîkew carmed...Kîke...

Mîyon zer ra bermayîn û pêrey leşay yî recefyayîn.

May cay xo ra warişti, destonê recefyayon ra virar şî ti ra.

- Lacê m', ona meke, derd ûkul xo ra ma veyşneno, yew zî ti kul meke zerey ma...

Lacî pey destî may tehm day.

- Ti kom derdî persena mayey! Kom zer ra ti qal kena? Hema çina mend tepya mayey? Gonî ma girewto, mal û milkê ma... Inka zî von "şêrîn". Çinay ma mend mayey, çinay ma?

Çimî tadiyay mînderê vengî ser. Raya peyena ki ome bi 'ynî eno goşe di ronişbi.

- Çi qayde to xo tadaynî kişton yî ra, hema ca di puc yî vetîn, to vîr nîno mayey? To waştîn ki veca, yî nêverdayin lê to zorakî vetîn. Sire sire qorey fîşekon xo raşt kerdîn sîney xo ra. To dî to ti ra va "lacey m' ez çina virazo to rî?" Yî zî va "mayey qirbo, şorbeyka germin bini ser." To dî to aya şorba ra nêdayîn ma, mexsus to verdayîn, to vatîn "wa pêro yî boro". Mi temaşe kerdîn. Biray mi nêzonayîn çi ray nazon biko. Heme çî rî yew asoney dîyîn. Çîkewo ki nêzonayîn heme hema çînikbi.

Bi hêrs ra giştey xo nîşonî mînderî kerd, va:

- Aha îta mi ver di roniştîn. Yî het a miheqqeq çîkey wendişî bînî ki biwono...

May xeberdayîşî yî birna, va:

- Ona meke lacê m, ona meke, bê ma meşikin...

Hetta ti ra omey qîja, va:

- Bes nîwo, bes nîwo, qe nîwo! Ti ha verî çimon xo di vînena, yî vonî bes? Ma ra vonî "îta ra siktir bibîn şêrîn", heta koca mayey, heta koca!..

Peki yi ra tuti vita biyin. Miyon kiyi ra ge geyrayin, ge roniştin ge zî destî xo wurdî kişton ra akerdîn, nucîkî xo şêdnayîn, vatey xo hêrs ra romitîn:

- Ma ra vonî şêrîn yew ca ki ma yî nêşinasnawo, nêzonawo, nêdîwo, nêeşnawito! Nêşino, ez nêşino, şima mi fêm nêken! În barbarî ma ra tersen! Reyna zî zuron ken, rojnamon di nusen, von "ma yew nêerşawitcayk", von " ma yew surgun nêkerd". Bin di zî nêşermayen! Biray mi bêbextey di kîşt... Hema çina wazen, çina? Resmê biray mi vila kerdî, hem zî vatîn "kom bêro poşmon bibo, ma qariş nêben"... Ama biray mi va se ma ki ti ra va... Yî va 'ma kiştey kedey merdimon de yî, ma en rayer ra poşmon nêben, ma pey îftîxar ken!" Hewi ra vatbi! Ona nêbi Apo?

Pî reyk di ray serey xo leqna, seki vaco "lacê m' ti heqlî yî", qehr û decayîş xo nêminit.

Lacê m'...Xido, siba ser sibay ra omeyîşî eskeron di lazim o ki ma nêvîn... To zî goşonî xo ra eşnawit. Ay hero ki ti ra von "Bînbaşî" ponc roc mudet da ma. Mudetî ma zî siba qedîno. Lacê m' ona meke. Derd û kulî ma ma di hal nêverdawo, ti zî ma wû xo pîya memirêne. Lawey m', lacî mino 'egît, en derdî ma wo, ma gerek bioncî!..

- "Bes Apo, bes o!" Va vengo berz ra. "Ti çina qal kenî, ti çina!!! Ez to ra perseno, Hûma vono "îta ra şêrîn"? Ti cewab bidî ti donî Hûmay! Şîyayîşî ma vatey Bînbaşî yo ki hema yî nêomebi îta, nomey yî omebi. Von hetta ezîyet keno 'eylon zî! Von cenik û keyneyî ki kon destî yî, çîkewo ki nêon yîn sere çînkewo! Von se Hûmay mûmay nêşinasneno. Yanê ezîyet û zalimeya xo ra terfe (terfîye) girewto. Hema kom zono çi ezîyet kerdo Apo! Baş, nuştey çarey ma nuştey în zalimon û zordaron o? Îno nuşto nuştey çarey ma, ti kom nuştişî çarî persenî!!?

Pî yî ki nêeşka yew cewab bido, mîyonî telaşî di destî xo kerd xo ceb, seki geyreno qutîyey tutinî ay qayde kerd... Lazim bi ki çîk vaco lacî xo ra. Bêçareyey yî her halî yî di bewlî bî. Feqet yî waştîn ki kê vacî qey sankî çîkewo ki geyrayîn de bivîno ca di cewab dono.

Vengî lacî yî ki veciya pî zîq vindert.

- To ona qal kerdînî Apo?.. To ma rî ona qal kerdînî? Seki yew zilimew newe wo en" Ama bin di yew zilimew newe nîwo, sey reyna vatişî yew deyrw wo Apo! Parçek destanonî Qoçgirî wo. Dewomî qirkerdişî Dêrsim'î wo. En tersê Xarpêt di dar di kerdişê çar sey heb merdimî wo. Êr (Ewro) ayî ki ma qewernenî, ters vizêr kewt yîn pîze Apo! Kê se ken deston xerîbeyî di. En 'mir ra pey kê eşken çi gure bikî? Ma ha nêeşken doxrî durust ziwon xeber bidî. În ma en qayde kişen! .. Mi bibexişne, lew nono deston û lingon to ra... Mi bibexişne...

Awey Çemî Parçîkî harkonî herikiyêna şona, Derey Laçî xum xum keno, sey yew welwele geyreno koyonî asêyon î Kurdistanî ra, deştonî bereketinon ra. Hewa vay dono bezreyonî ki kon ti ra ver, ver 'erdî şeqnena, zîl dona

ÇORŞMEY SÊWREGI RA VATEY VERÊNON.

1- Embazî bîye canbazî.
2- Cor di Ella, cêr di milla.
3- Veyvi vana "mi bidê cado durî, ez xo rê bikera bol û bol zûrî".
4- Nan bîyo arwêş, ma bîye tazî; o remeno ma fetelnenî.
5- Dîko ki bê wext veyndano, ey sere ci kenê.
6- Wextê seydî beno, gîyê tazîyeri yeno.
7- Ci menişi hukmat her jî beno, kewno dûz pay çekeno.
8- Ez werdî bîya mi nêzana, ea gird bîya gangiran bîya;
Ez werişta şîya dîyardê qebri, ez behdo bol poşman bîya.
9- Derzîni verî xo di kuwi, gocîni bahdo şarî di bikuwi.
10-Bizi wexto ki kena mêli bo, veror cayê xo virazena.
11-Ko koy nêreseno, însan însanî reseno.
12-Linganê xo hendê werxandê xo dergî ki.
13-Bewnîrê ci ra rez beno, nêwinyê ci ra kerre beno.

ÇEND MERTALÎ (BILMECEY) ÇORŞMEY SÊWREGÎ RA

1- Gem a diti, keye di liti. (Bizi)

2- Zerd o zey zerdik ya,
Waneno zey bilbilî ya.
Ya ti ney zanê,
Yan jî ti no welat ra şinê. (Altûn)

3- Ez şîya a şî, ez vinderda a vinderdi. (Sersî)

4- Amyayişê ci zey şêrî,
Şîyayişê ci zey siltanî,
Beno vila zey hesîrî,
Kaş beno zey esîrî. (Gayê citi)

Arêkerdox: *KOYO BERZ*

ÎNIKÊ AXIRMATÎ (1)

Arêkerdox: KOYO BERZ

O kam o banî ver di,
Dismala ci mil di,
Estora ci bin di,
Tifinga ci qol di.

Keynêno, ma şimi dikî,
Destan bikemi nûncikî,
Veradim xortan tûnikî,
Vecim zewcê lîlikî.

Va yeno vay amnanî,
Şaneno tîrda banî,
Xortan keno meymanî,
Qandê helda şanî.

Keko şino şahwaşî,
Ano topê qumaşî.
Keko şino cirîtî,
Ano zewcê kilîtî.

Vewri varena pewlikî,
Gîna dara zengelekî.
Kekoyê mi ardî veyvekî,
Ci ra bî lajek û nê keynekî.

Eywana ma sipêk a,
Veyveka ma newêk a.
Qeçekî ver o nîya,
Zerîda kekoy nîya.

(1) Na deyîri, çorşmey sêwregî di vaciyêna. Mi hezey vatişdê yew cenêkda sêwrekiyi nuşti.

vecîna teber, gil û şax erzena sey dest û qolî, sey may ma, sey mayonî ma...Keynon û lacon onî...Sey 'Ezîzî.

Deştonî yî ti ki sey pêlonê deryay, tadîyenî, roco çîlsûr ki dono tiro serey xo raşt kenî.

Aya roci ki omey, desto ki telpozikî day vaşturî û qirimi gêno. Serwetî yî kedey destî; nurî çimonî yî herra sîyay a. Yew pêrdayîş (pêrodayîş) o romeno, bi mehsul û bi hêgayî xo. Ko yû deştî bi durikanê xo veng donî. Sey yew itirî bizone tutinî, qutey yî wa, çizî veceno çeqmaxê muxtarî wo ki boyey qazaxî dono, lastîkî Anqarî miyonî hêgay germinî di lingon veyşneno germaw ken, ginda bi ginda gurnik poco ra dusen...Beteliyayîşî yew rocîka omnonî di qijqijey qijonekon sey vengî muzîk yena, kê ason kena çaya ki kuçlon di girêna, boya derdoy dona cixara mîyonî lewon di zerdbiyaya, boya herri don serî bononî kîyo...Yew pifo ki feletên lewonî çiqirnayon û wişkon ra, qedîneno roşiney îdara...Xeyalî sîya wû tarî gîn hewnê kê...Roco ki yeno çina beno û çina gen, nîno zonayîş. Lawitiş kutkon parçe ken bêvengeya şewi. Dreg derg veng dono. Ay sêr sibay henzar sêr sibayonî verînon ra tena yew newe wo...Çer ponc parçey qatiro r' bar kerdî...yew veyvekey Kurd destî xo kalekon xo ser nay, fekî ya ra bi nalayîş yew duriki vecêna. Hem vona hem leqena di kiçtî di, destonî xo yê zeîfonî wişkon dona kalekonî xo ro...bêçareyey mîyon di dona xoro...Kerwon ki sey yew meyîtî bêvengey mîyon di dew ra vecêno, may a daymîş nêbena, agêrena xo ser di bi milşikteyey. Zîq mezel ra ewnêna, geyrena geyrêna, çimê yay pa monenî, ayî ki çimon ya ra yen war hesrî nîyî nefret û serehewanayîş (îsyan) yey! 'Ezîzî m'...Lemin lemin 'Ezîzî m'...Maç kerdişî herey to zî mi rî zaf dîy 'Ezîzî m'!..Çok dona, destonî xo ver bi asmîn hewa nona, hetta ti ra yena qîjena:

- Hûma, Hûma, Hûma...Xidoy mi to rî emanet Hûma!

Yew rayer derg beno, rayero ki kê nêzonî key qediyêno, cay vindê yê koca wo!!?

Dest di qaxidê morkerdî û îmzakerdî ser o herfê pîlî weş bewlî kenî:

7. Kolordu Komutanligi emriyle...(Bi emrê Qumandareya Qolordîya Hewtine...)

"Mezac 'nêqedîno', ek rocîk biqediyo!"

Tirkî ra tadayox: MIHÊ ALÎŞAN

www.arsivakurdi.org

چاپکراوی نوێ:

گـــەلاز



کۆمەڵێ کورتە چیرۆکی سیامەند شێخ ئاغایی‌یە، کە بریتی‌یە لە بەرهەمی سالانی نێوان ١٩٨٣-١٩٨٧، ئەو سالانەی کە نووسەر بۆخۆی لەگەڵ پێشمەرگەکانی کوردستاندا لە گەرمەی خەباتی چەکداری‌دا بووە.

ئەم کۆمەڵە چیرۆکە زادەی ژیان و تاقیکردنەوەکانی ئەو کات و شوێنانەیە و ئاوێنەی ژیانی بێشمەرگایەتی و خەباتگێرانی گەلە چەوساوەکەمانە. زۆربەی جار نووسەر لە چیرۆکەکانی‌دا پەنای بردۆتە بەر ئەنز و گاڵتە و گەپ بۆ دەربڕینی هەستی خۆی بەرامبەر ئەو واقیعە تراژیدییەی کوردستان. دەتوانرێ لەسەر ناونیشانی ئەم گۆڤارە داوای «گەلاز» بکرێ. «نرخی ٣٠ کرۆنی سوێدی‌یە + کرێی پۆست.»

ئەلفۆنس و جانەوەرەکە



چیرۆکێکە بۆ منالان لە نووسینی نووسەری سوێدی گونیللا بێریستروێم. کاک فەرهاد شاکەلی وەریگێراوە بۆ کوردی و پەخشخانەی فەرهەنگی کوردی لە بەرگێکی جوان و قەشەنگی رازاوە بە وێنەی ڕەنگاورەنگ چاپی کردوە.

دەتوانرێ لەسەر ناونیشانی «بەربانگ»یان ڕاستەوخۆ لەسەر ناونیشانی پەخشخانەی فەرهەنگی کوردی داوا بکرێ. نرخی ٣٥ کرۆنە + کرێی پۆست.

ناونیشانی پەخشخانەی کوردی:
Kurdiska Kulturförlaget
Box 16139
103 23 Stockholm . Sweden

ئاگاداری

لەسەر داوای کۆمەڵەی پزیشکانی کورد لە سوێد، بڕیاردراوە لە ژمارەی داهاتووەوە گۆشەی تەندروستی لەم گۆڤارەدا بکرێتەوە. کۆمەڵەی ناوبراو سەرپەرشتی ئەو گۆشەیە دەکات و لێی بەرپرسیار دەبێ. لەو گۆشەیەدا پسپۆرانی تەندروستی وەڵامی پرسیاری خوێنەران دەدەنەوە سەبارەت بە هەر جۆرە نەخۆشییەک بێ، مەرج نییە خوێنەر ناوی خۆی بنوسێ.

دەتوانن پرسیارەکانتان لەسەر ناونیشانی «بەربانگ» گۆشەی تەندروستی ڕەوانە بکەن.

تکا..... تکا

تکا لەو خوێنەرە بەڕێزانە دەکەین کە دەیانەوێت بەربانگ بە بەردەوامی بگاتە دەستیان و تا ئێستا ئابوونەی ساڵانەی ١٩٨٩یان نەناردووە بە زووترین کات ڕەوانەی بکەن.

ئەم تکایە ئاراستەی ئەو خوێنەرانە دەکەین کە لە سوێد و وڵاتانی تری ڕۆژئاوا دەژین. بۆ ئەوانەی لە کوردستان و وڵاتانی ڕۆژهەلات و وڵاتانی تری جیهانی سێیەم دەژین لەسەر ئەرکی فیدراسیۆن بە دیاری گۆڤارەکەیان پێشکەش دەکرێت.

www.arsivakurd.org

خۆی سەرخۆش دەکات و
بە مست دەکێشێ بە دەرگا و دار و
دیوار داو
هەوڵ دەدات بڵێت:
هێجگار دەردەدار و ماندوو و بێزارە
نائومێدیەکەی...
وەک ناسنامە و سالنامە و...

دەستەسڕ و چەرخ و پێنووسەکە«
لە تەک خۆیدا
بە کۆلان و بازاڕدا، دەگێڕێت
کەچی، نائومێدیەکەش
هێندە وورد و بچووکە، هەموو شەوێ
لە قەرەبالغی مەیخانەکاندا وون دەبێ
****
خوشکەکەم کە دۆستی گوڵەکان بوو و
هەر کاتێ کە دایکم لێی دەدا
داخ و دەردی سادەی نێو دڵی خۆی دەبرد و
لای ئەوانی هێمن و میهرەبان
هەڵی دەڕشت و...
جار جاریش تیشکی هەتاو و
شیرینیی بە ماسیەکان دەبەخشی ...
ئێستا مانی وا لەو سەری شار
لە نێو خانووە دەست کردەکەیدا
لەگەڵ ماسیە سوورە دەست کردەکانیدا
لە باوەشی عەشقی دەستگردی مێردەکەیدا
لە ژێر لق و پۆپی دار سێوە دەست کردەکانیدا
گۆرانی دەست کرد دەچڕێت و
کۆرپەی ئاسایی دەخاتەوە.
ئەو...
کە دێتە سەردانیمان و
دامێنی کراسەکەی بە هەژاریی باخچەکە
لەکە دار دەبێت،
بە عەتر و گوڵاو دەیشوات و
خۆی پاک دەکاتەوە
هەر کاتێک دێتە سەردانیمان
دوو گیانە
****
حەوشەی خانووەکەمان تەنهایە
حەوشەی خانووەکەمان تەنهایە

بەدرێژایی رۆژ
لە پشت دەرگاکەمانەوە دەنگی لەت کردن و
تەقینەوە دێت
دراوسێکانی ئێمە هەموو
لەبری گوڵ
لە نێو گڵی باخەکانیاندا
هاوەن و ڕەشاش دەڕوێت.
دراوسێکانی ئێمە هەموو

سەری حەوزە لە کاشی دروستکراوەکانیان دەگرن،
حەوزەکاشیەکانیش.....
بێ ویست و ئارەزووی خۆیان
گەنجینەی نهێنیی باروت کراون.
منداڵانی گەڕەکەمان، جانتای قوتابخانەیان
پڕکردووە لە نارنجۆک.
حەوشەی خانووەکەمان گێژ و ووڕە.
****

من لە سەردەمێک دەترسم
کە دڵی خۆی وون کردوە.....
من لە دەستەپاچەیی ئەم هەموو دەستە.....
لە نامۆیی ئەم هەموو ڕوخسارە
دەترسم
من وەک قوتابیەکی شێت و شەیدای
وانەی ئەندازە،
تاک و تەنهام و
پێم‌وایە دەشێت
باخچە بۆ نەخۆشخانە ببڕێت.
من وای لێ تێگەدەکەم.....
من وای لێ تێدەگەم.....
من وای لێ تێدەگەم.....
دڵی باخچەکە لەژێر تینی هەتاودا کێمی کردووە
هۆشی باخچەکە خەریکە
هێدی.....
هێدی.....
دەست بەرداری یادگارە کەسکەکانی ببێت.

وەرگێڕانی لە فارسییەوە
هاورێ ئەحمەد

www.arsivakurdi.org

دڵم بۆ باخچە دەسووتێ

فەروخ فەروخزاد

کەسێ بیر لە گوڵەکان ناکاتەوە
کەسێ بیر لە ماسیەکان ناکاتەوە
کەسێ نایەوێت باوەڕ بکات
باخچەکە خەریکە دەمرێت ...
کە دڵی باخچەکە لە ژێر تینی هەتاودا کێوی کردووە
کە هۆشی باخچەکە خەریکە
هێدی ...
هێدی ...
دەسێ بەرداری یادگارە کەسکەکانی ببێت
هەستی باخچە چەشنی جەستەیەک...
لە گۆشەیەکی لاتەرێکی باخچەدا،
بێ گیان و پووکاوە...
کەناری گرتووە.
****
حەوشەی خانووەکەمان تەنهایە
حەوشەی خانووەکەمان...
لە چاوەڕوانی شەستە بارانی پەڵە هەورێکی نەناسرا
باوێشک دەدات
حەوزی خانووەکەمان بەتاڵە.
ئەستێرە بچووکە بێ ئەزموونەکان،
لەبەرزیی بالأی درەختەکانەوە
بەرەو و زەوی دەکشێن
لە نێوان شوشە بەندی ڕەنگ پەڕیوی
ئێکوارێنومی ماسیەکانەوە
شەوانە، دەنگی کۆکە دێن.
حەوشەی خانووەکەمان تەنهایە
****
باوکم دەڵێت:
«لە دەستی منداڵ نەماوە
لە دەستی منداڵ نەماوە
من باری خۆمم بردووە
کاری خۆمم کردووە»
لە ژوورەکەیدا، ڕۆژ تا ئێوارە
یا (شانامە) دەخوێنێتەوە
یا (ناسخ التواریخ)
باوکم بە دایکم دەڵێت:
«نەفرەت لە هەرچی ماسی و هەرچی بااڵندەیە
کە من مردم، ئیدی
جیاوازی چیە! باخچە هەبێت
یاخود ... نەبێت.
من مووچەی خانە نشینیم بەسە.»
****
دایە، هەموو تەمەنی
بەرمااڵێکی ڕاخراوی
بەر قاپی دۆزەخی سامناکە
دایکم هەموو کارەسات و لێ قەومانێک
بە گوناحی بەندە و غەزەبی خوا دەزانێت
لای وایە گیایەک کفری کردووە،
بۆیە باخچەکە سەرتاپا گاڵو بووە.
دایکم ... بەدرێژیی ڕۆژ خەریکی دوعا خوێندن و
فوو کردنە بەسەر گوڵەکاندا
بەسەر ماسیەکاندا و
بە دەوری خۆیشیدا.
دایکم ... چاوەڕێی سەرهەڵدانی پیاو چاکێکە
چاوەڕێی پاداشتێکە لە ئاسمانەوە
بێتە خوارێ
****
براکەم بە باخچە دەڵێ گۆرستان
براکەم پێکەنینی بە سیس‌بوونی
گیاکان دێت.
براکەم یەکە... یەکە
تەرمی بن ئاو کەوتووی ماسیەکان
کە لەژێر پێستی زاماری ئاودا
دەبنە کەاڵکی بۆگەن و ڕزیوو... دەژمێرێت!
براکەم (مودمینی فەلسەفە) یە
براکەم چارەسەری باخچە،
لە ویران کردنیدا دەبینێت

www.arsivakurdi.org

عامەکە جەرگ و هەناوی ئەو کاریلەیەی تەزاندبوو، ژیانی کردبووە زووخاو. گوڵی نەپشکوتووی هیوای هەڵوەراندبوو.

ئەو فیلمە تراژیدییە بە پەردەی سپی خەیاڵیا دێ و دەچێ و هەرگیز ناسرێتەوە و ناسوێ. خۆی و رێبازی برا بچوکی لە دەشتێکا بە تەنها ماونەتەوە، مەرگیش وەکو قارچکێکی سپی زل ئاسمانی شاری داگرتووە و شار لە چرە دووکەڵ و خۆڵ و توز و بۆمب و گرمە و لرمە و تەق و تۆق نووقم بووە. باوکی ئەوانی بەجێ هێشتبوو کە بچێ دایکیان دەرباز بکا کە لەو کاتەدا سکی حەوت مانگان بوو، نەوەیەکی نوێی بەرێنوەبوو. کەژاڵ دای‌نابوو بیکاتە بووکزکەی خۆی. لە ئامێزی خۆیدا بیخەوێنێ و کایەی لەگەڵ بکا. بەڵام رۆیشتنی باوکی سەفەرێکی بێ گەرانەوەبوو. ئەمیش کام داڵ قوزتبوویەوە و گەیاندبوویە ئێرە نازانێ!؟

رێبازی بۆ ماسی‌یەکی بچکۆلەی سووروسپی بوو لە دەریای قوواڵ و بێ‌بن و پان و بەرینی رۆژگاردا گووم ببوو. لە هیچ ئاستێکەوە بڵقەی نەدەهات. ئەم تولفەش لەم سووچەی دونیادا گیرساببووەوە و لەنگەری گرتبوو. خێزانی ئەندرسۆن منیان بانگ کردبوو وەکو وەرگێرێک یارمەتیان بدەم بەڵکو کەژاڵیان بۆ رادێ و لەم تەنهاییە کوشندەیە رزگاریان دەبێ. بۆیە ئەم بێ‌کەس و کەساسەیان داڵدە دابوو.

بەڵام زوبانی چی، من هەر لاڵ بووم و زوبانم لەگۆ کەوت. ئەم داستانە وەکو بوورکانێک لە جەستەم دایە. ناوە ناوە ئەتەقێتەوە و ئەمهەژێنێ و ئەملەرزێنێ و ئەمسووتێنێ.....

کەژاڵ تەمێکە و دایگرتووم، هەمیشە لەگەڵم دایە. تەنیا جار جارە شەیتانی بەدفەڕ زەفەرم پێ دەبا و دەکەومە گوومان و غل غلەوە:- تۆبڵێی رۆژێک بێ کەژاڵ ببێتە لینا؟؟؟

بەهاری ۱۹۸۹
لاکسۆ-سوێد

پێشانگایەکی فۆلکلۆری لە لوند

«کۆمەڵەی رۆشنبیری کوردستان- سوێد» لە سکۆنە، بە هاوکاری خاچی سور، رۆژی ۱۹۸۹/٤/۱ پێشانگایەکی کولتووریان لە شاری لوند Lund رێکخست.

لەم پێشانگایەدا، جگە لە خواردنی کوردی و فیلم و سلاید و جلوبەرگی کوردی و کتێب و دەستنوسی کوردی، هێندێ بابەتی دیی وەکو سەماوەر و دەستار و مەشکە دانرابوون.



رێکخەرانی پێشانگاکە، سێ سیمیناریشیان لەسەر بارودۆخی کوردستان گێرا. هەمان کات پیشانگای هونەرمەند - خالید ستار- هێندەی دی تەماشاکەرانی کۆکردبۆوە.

رۆژنامەکانی خواروی سوێد وتاری تێروتەسەلیان لەسەر پێشانگا و چالاکیەکە نوسیبو. رۆژنامەی ARBETET لە ژمارەی هەمان رۆژدا لە چاوپێکەوتنێکدا لەگەڵ - مژدە رەشید - کە یەکێک بوو لە رێکخەرانی چالاکیەکە، دەڵێ:

- رۆژمە داگیرکەرەکانی کوردستان هەرەشەی نەمان لە کولتووری کوردی دەکەن. ئێمە نەولاتمان هەیە و نە سەفارەت کە بتوانێ کارەکانمان بۆ مەیسەر بکات، بۆیە پێویستە خۆمان کولتوورەکەمان بە سوێدی بناسێنین و ئومێدی هاریکاری و یارمەتی بخوازین.

رۆژنامەی SYDSVENSKA ی هەمان رۆژ، دەنووسێ:

«لە ژوورێک لە ژورەکانی خاچی سوردا، تەماشاکەران، لەگەڵ تەماشاکردنی فیلمدا لەسەر کوردستان، چوار مەشقی لەسەر زەویەکە دانیشتبوون و یاپراخیان دەخوارد»

پێشانگاکە کارێکی سەرکەوتووانە بوو، ئومیدەوارین هاندەرێ بۆ کۆمەڵە کوردیەکانی دیش بۆ سازکردنی چالاکی لەو جۆرە.

www.ersivakurdi.org

کورتەچیرۆک

کـــەژاڵ یا لێنـــــا

ج. ماله

پێش کەشە بە گیانی پاکی ئەو فریشتانەی کە دەستی چەپەڵی زۆردار هەڵیانی وەراند

خۆی گرمۆڵ کردبوو، هەردوو پێی نووشتاندبۆوە، ئەژنۆی گەیاندبووە لای دەمی. قژە ڕەشە قەترانییەکەی کە لە چاوی مار دەچوو پەخش ببوو بەسەر سەرینەکەیا. باسکە سپی و بلوورینیەکەی هێنابووەوە نێو هەردوو لینگی وەکو بووکۆکەیەک تووند گرتبووی و حەشاری دابوو، چاوەکانی دوو کۆتری نووستوو بوون. وەکو کەرۆشکێ، لە خرێ، لە سێبەری ژاڵە و بی یاخەوتووبێ، لەسەر تەختە ئەسفەنجەکەی وا هەڵتروکابوو. وەکو لە قایغێکی بەر تۆفان کەوتوو بێ وا خۆی گرژ کردبووەوە نەوەکو شەپۆلێ پیلی بگرێ و ڕاپێچی کاتە دەریای بێ بن و بێ ئامانەوە.

تیشکی زێرینی هەتاو کە لە سوچێکی پەنجەرەکەوە خۆی کوتابووە ژوورەوە، ژوورەکەی ڕۆشن کردبووەوە. تیشکێکی باریک کە لە لچکێکی پەردە سپیەکەوە کەوتبووە سەر مێزەکەی وەکو خامەیەک وابوو بەسەر کاغەزە پەرت و بڵاوەکانی دا کە وێنەی منالانی بۆچێ بکا. کورسییەکی خنجیش لە تەنیشتیەوە بوو. ئاوێنەیەک و چەند وێنەیەکی منالانە و تابلۆیەکی گەورە کە دیمەنی کێوێکی سەرکەشی سپی بوو بە دیوارە سپیەکەیا هەڵواسرابوو ژوورەکەی ڕازاندبووەوە، هەر کەسێ ئەم دیمەنەی بدیتایە ئەی گووت: ئەم پەروانەیە مەلی خەیالی ئاسمانی شادی پەی دەکات.

کاریلەیەکە و لەوەرد و قەرسیل و دەغڵ و دانا هەڵدەقونێ و هەڵدە بەزێتەوە.

لەو دیمەنی کپ و بێ دەنگیە دەنێگێگی ناسک گۆمی مەنگی شڵەقاند و بازنەی شەپۆلی دەنگەکە ..... لینا..... لینا..... لینا .....

کەژاڵی ڕاچڵەکاند و چاوەکانی هەڵگڵۆفی و واقیعی تاڵ دونیای شیرینی خەیاڵی هەڵووشی، خانمی ئوللا دەستێکی بەسەر قژە نەرمەکەیا هێنا وەکو دەست بەسەر مووی پشیلەیەکی دەستەمۆیا بهێنێ گووتی:

لینا هەستە دەموچاوت بشۆ بەرچایی‌یەکەت بخۆ. (بەجێی هێشت) بەڵام بەرچایی چی، کاتژمێر یازدەی نیشان دەدا. کەژاڵ بیری کردەوە کە چۆن بووە ئەمرۆ وا لێی گەڕاوین تاکو نیوەڕۆ بنوێ و نەچووە بۆ باخچەی منالان، پاشان هاتەوە یادی کە یەک‌شەمەیە و ڕۆژی پشوودانە. بۆیە بزەیەکی هاتێ و لەگەڵ خەونۆچکەکانی خۆی دەتلاتەوە، وەکوو بڵێی ختوکەی دەدەن. دەهاتەوە یادی کە باوکی بۆ جەژن کراس و پێڵاوی جوانی بۆ کڕیبوو هەر پێدەکەنی و بە نەشمیلی هاوڵی نیشان دەدا. چەند دڵی پێی خۆش بوو بەشەویش دای نەدەکەند. لەزەتی گەزۆو نووقڵی دەهاتەوە یاد کە چەند خۆش بوو بە ئەسپایی بە دەمیا دەهێنا و ڕای‌دەکێشا. ئێستاش تامی وا لەبن ددانە کانیەتی، بە ڕاستی تەنها منالێ و پیر لەزەت لە خواردن دەکەن ئەگەر نەء لاو وەکو لەق لەق هەر بە پەلە قووتی دەدا و نازانێ چی چێیە. بۆ جەژنە پیرۆزە دەچوونە مانی باپیری و داپیری لە کۆشی خۆی دایدەنا و حەقایەت و مەتەڵی خۆشی بۆ دەگوت. چوکلێت و شیرینی دەدایێ. لەگەڵ باوک و دایک و برا بچوکەکەی مالانیان دەکرد. ئەمانەی هەمووی دەهاتەوە یاد. جێی سەرسوڕمانە کە منالێک تەمەنی پێنج سالێ و دوومانگ و ..... بێ و..... بەڵام ئەوکاتی چوار سالان بووە. ئەڵێن منالی ئێستا ژیرە و بیری تیژە وەکو جاران نیە دەبێ وابێ؟؟!!

منیش ئەگەر پێش تر ئەم قسانەیان بۆم گێڕابایەوە بڕوام نەدەکرد کە منالی چوار سالێ بووبێ و.....

لە بیری بوو لەگەڵ جەمال و نەشمیل و نیشتە چڵمن بووکۆکە و مالێ مالۆکێیان دەکرد. تا جارێک باوکی پێی گوتووبوو:- پێی مەڵێن نیشتەچڵمن. پێی بڵێن نیشتمان ئەوە کچێکی زۆر جوان و ژیرە با گەورەبێ و پێ بگا دەبێتە بووکێ لە هەموو دونیا دەنگ بداتەوە...

کەژاڵ هەموو بەیانییەک وەکو شێت لە خەو ڕادەپەڕی و لەنێو نوێنەکانی بەدەر دەکەوت. بەڵام ئەمرۆ ماوەی ئەوەی کردبوو لەگەڵ خەونۆچکەکانی کایە و زۆرانبازی بکا. ڕاستیت بوێ خۆشم نازانم بۆ ناوم لە خەون و خەیاڵی کەژاڵ ناوە، خەونۆچکە، بچوک و ووردم کردۆتەوە. هەر چەندە خۆم باش دەزانم کە منالی بچوک خەونی گەورە دەبینێ!!؟

تۆبڵێی لەبەر بچوکی و ووردیلەیی کەژاڵ بێ؟

دەی ئێمە خوومان گرتووە کە شت بە ناوی خۆیەوە بانگ نەکەین و لە خۆمانەوە ناوی لێ‌بنێین...!؟

لەگەڵ زریکە و پڕمەی گریانی کەژاڵ من ڕاچڵەکیم و لەگەڵ خانمی ئوللا گەیشتینە سەری. کەژاڵم لە ئامێزگرت. نەء کەژاڵ گیان هیچ نیە مەگری... بەڵام کەژاڵ وا بە هەنسک و بە کوڵ دەگریا، منیش گریان قوورگی گرتم و لە گفتی خستم، پاشان کەژاڵ هێورببووەوە. خانمی ئوللا دەستی بەسەر قژە نەرمەکەیا دەهێنا و دەیلاواندەوە. بەڵام ئەو بە واق وڕماوییەوە سەرنجی جێی کۆنەبرینەکانی جومگەی دەدا، بیری مەڵێکی شپرزە و بێ دەرەتان بوو. ڕابردووی تاڵ و کارەساتی جەرگ بڕ و کەساسی قەتڵ و

پێناوی راگرتنی ئەم سیاسەتە شۆڤێنیانە. بۆ نموونە قەزاکانی خانەقین و مەندەلی و سنجار و تەلەعفەر و موسڵ و شوێنەکانی تر، زۆر گرنگی پێدراوە لە یاداشتەکەدا. دەربارەی قەزای خانەقین دەڵێ: «بڕوا ناکەم کەسێ ئیعترازێکی ببێ لەوە کە ئەهالی ناحیەی «هزدین و شێخان و قزرەتوو» هەموو کوردن. وەلە ناحیەی مەرکەزدا بەشی عەلیاوا، باوەپلاوی وە دەکەکە هەمووی، وە موقاتەعەی خانەقین، کارێز، حاجی قەرە، وەقولە بەشی زۆریان کوردن. وەلە مەرکەزی قەزادا گەرەکی حەمیدیە هەمووی وە گەرەکی ئەولابەگ و عەرەب ئاغا بەشی زۆریان کوردن، وەدیسان مەرکەزی ناحیەی قزرابات نیوەیان کوردن، هەروەها لە بەینی شارەبان و ئەبوجسرەدا بەرەیەکی سوورە مێردیش کوردن» «تەماشای تەقریری مێجەرسۆن بکەن کە لە بابەت عەشائیری کوردستانی خواروو» (١١) یان دەربارەی موسل دەفەرموێ «لە نەفسی شارەکەدا عەدەدێکی موناسیب کورد تیاساکینە جگە لە وانەی کە لە دێهاتە نزیکەکانیەوەن» لە هەمووی گرنگتر دەربارەی کەرکوکە «..... دەلیلی بە قووەتی ئەمەش ئەم مەعلوماتەیە کە لە مەئمورێکی گەورەی کەرکووکم وەرگرتووە، کە لە مەسائیلی ئیستاتیکدا سەلاحیەتی رەسمی هەبوو، وەگوتی بە گوێرەی ئیحسائی بەلەدیە، نوفووسی شاری کەرکووک ئەمسالْ (١٩٣٠) گەیشتۆتە ٣٥٠٠٠، کە لەمە، ٢٢٠٠٠ی کوردە، ٧٠٠٠ تورکمان، ١٠٠٠ی مەسرانی مەحللی، ٢٠٠ی تیاری «فەلە»، ٥٠٠ ئەرمەنی، ٢٥٠٠ جولەکەیە، وە لە گەرەکەکانی کەرکووک، ئیمام قاسم، ئاخی حوسێن، بولاق، ئاوچی، وەپیریادی هەموو کوردن، وەبەشی زۆری گەرەکی چوقور، مەسک، وەچای کوردن» (١٢) پاشان دێتەوە سەر مەسەلەی خوێندن بە زمانی دایک «ئەگەر بوونی ئەقەلیەتێکی کەم لە عەرەب و تورک لە قەزاکانی دەهۆک، مەخموور، شێخان، هەولێر، کەرکووک، کفریدا بێتە سەبەبی قبووڵ کردنی زمانی تورکی و عەرەبی لەگەڵ زمانی ئەکسەریەتدا، هەر بەو چەشنە پێویستە زمانی کوردی لە قەزای تەلەعفەر، سنجار و موسڵیشدا قبووڵ بکرێ» (١٣) لە یاداشتەکە بەرپەرچی هەموو بیرورایەکی هەڵە دراوەتەوە دەربارەی زمانی کوردی و میژووی ئەو زمانە « ئەم زمانە لە زمانی فارسی دەوڵەمەندترە، بەڵام مەیدانی ئەوەی نەبووە کە ئیستیعمال بکرێ و بەرەبەرە ئیسلاح و تەکاملی تیا بێتە وجود». رۆشنبیران و زانایانی کورد لە میژەوە هەستیان بەوە کردووە، کە کورد دەبێ زمانێکی ئەدەبی یەکگرتووی هەبێ و هەموو رۆڵەکانی بتوانن بۆ خوێندن و نووسین بەکاری بێنن «ئەو ئەساسە عوموومیە کە میللەتانی تر بۆ ئینتیخابی لەهجە لەسەری رۆیشتوون، ئیستیناد ئەکاتە سەر هەرە فەسیحتر و رێک و پێکتری لەهجەی ئەو زمانە» لەبەر ئەوە «ئەگەر حورمەتی ئەم قاعیدەیە بگیرێ ئەبێ تەماشای فەرقی جوزئی لە بەینی لەهجەی خەڵکی شەرقی زێی گەورە و غەربی نەکرێ و یەکێتی زمانی کوردی تێک نەدرێ» (١٤).

دوا ووتە

دوو تەقەلای بێ سوود سەرچاوەیەکی زۆر بە سوودە بۆ میژوونووسان و سیاسەتمەداران. لەم کتێبۆڵکەیەدا زۆر شتمان بۆ ڕوون دەبێتەوە دەربارەی سیاسەتی چەپەلانەی ڕەگەزپەرستان و فاشیستان کە چۆن وێستوویانە و دەیانەوێ کورد لە ڕەگ و ریشەوە دەرکێشن، بەڵام خەیاڵیان زۆر خاوە، چونکە میژوو شاهیدی نەبەردێتی گەلی کوردمانە لە هەموو سەردەمێکی ڕابردوودا. ئەبێ بزانین تا ئەو ڕۆژەی ئالای ئازادی کوردستان لەسەر خاکی کوردان ئەشەکێتەوە، باری کورد هەر ئاوەها ئەبێت و تووشی زۆر کەند و کۆسپی گەورەتریش ئەبین. لێرەدا پێویستە هەموومان بە هەر شێوەیەک بێ خەبات بکەین لە پێناوی کوردستانێکی یەکگرتوو و ئازاد و دیموکراتیک. بە هیوای ئەورۆژە.

پەراوێزی باسەکان:

١- بۆ زیاتر ئاگاداری بروانە هەردوو بەشی (کورتە میژووی کورد و کوردستان)

بە عەرەبی، محەمەد ئەمین زەکی.

٢- میژوو، بەغدا، ١٩٨٣، ل/١٥٧. دانەر دکتۆر کەمال مەزهەر ئەحمەد.

٣- بۆ نموونە سەیری بەشی یەکەمی کورتە میژووی کورد و کوردستان بکە، یا (میژوو)ی دکتۆر کەمال مەزهەر و زۆر سەرچاوەی تر.

٤- دوو تەقەلای بێ سوود، محەمەد ئەمین زەکی، چاپی دووەم. لەندەن- ١٩٨٤، ل/٥٦

٥- سەرچاوەی پێشوو، ل/٥٩

٦- سەرچاوەی پێشوو، ل/٨

٧- میژوو، بەغدا، ١٩٨٣، ل/٣٠٩. دانەر دکتۆر کەمال مەزهەر ئەحمەد.

٨- بیبلۆگرافیای کتێبی کوردی، نەریمان، چاپخانە و بڵاوکردنەوەی کۆری زانیاری کورد، بەغدا، ١٩٧٧، ل/٦٩

٩- دوو تەقەلای بێ سوود، چاپی دووەم، ل/٤٧

١٠- سەرچاوەی پێشوو، ل/٨٢-٨٣.

١١- سەرچاوەی پێشوو، ل/ ١٠٠.

١٢- سەرچاوەی پێشوو، ل/٤٠١-٥٠١.

١٣- سەرچاوەی پێشوو، ل/ ١٠٢.

١٤- سەرچاوەی پێشوو، ل/١١٢.

ئەو سەرچاوانەی کە سوودم لێ وەرگرتووە بۆ نووسینی ئەم باسە:

١- محەمەد ئەمین زەکی، دوو تەقەلای بێ سوود، سەباحی غالب، توێژینەوە، لێکۆلینەوە و پێشەکی بۆ نووسیوە و پەراوێزی بۆ ڕێک خستووە، چاپی دووەم، چاپخانەی (هەڵوێست) - لەندەن- ١٩٨٤.

٢- کورتەی میژووی کورد و کوردستان، بەشی یەکەم، بە عەرەبی، چاپی دووەم، ١٩٦١، دانەر میژوونووس محەمەد ئەمین زەکی، وەرگێر محەمەد عەلی عەونی.

٤- میژوو، دوکتۆر کەمال مەزهەر ئەحمەد، چاپخانەی دار آفاق عربیە، بەغدا، ١٩٨٣.

٥- بیبلۆگرافیای کتێبی کوردی، نەریمان، چاپخانە و بڵاوکردنەوەی کۆری زانیاری کورد، بەغدا، ١٩٧٧.

www.arsivakurdi.org

کوردستان و پەیوەندی بە عێراقەوە، دووەمیان لە بارەی بەکارهێنانی دیالێکتێکی کوردی لە قەزاکانی موسڵدا. «۹» دانەری ئەم کتێبۆلکەیە یەکێک بووە لەو مرۆڤە نیشتمانپەروەرانەی سەردەمی خۆی و هەمیشە بە دڵسۆزییەوە هەوڵی داوە بۆ خزمەتکردنی گەل و نیشتمانی خۆی و پاراستنی فەرهەنگ و کەلەپوری ڕەسەنی کوردەواریان.

مێژوونووسی مەزنمان خوالێخۆش بوو مەحەمەد ئەمین زەکی لە یاداشتی یەکەمدا ئەڵێ «ئەمەوێ بەو مەوزوعاتەی کەوا ئەیهێنمە پێش چاوی جەلالەتتان «مەبەستی مەلیک فەیسەلی یەکەمە- م.ک» دەرحەقی بە مەسئەلەیەکی موهیم کە تەماسێکی تەواوی هەیە بە مەوجودییەت و پشتیوانی، سیاسی حکوومەتەوە ڕەئی خۆم بەیان بکەم، ئەمەش مەسەلەی کوردەکانی عێراقە.....» لە پاشان دەڵێ «ئەم وەزعیەتە لەوانەیە ببێ بە سەبەبی چاندنی تۆوی نیفاق و ئیختیلاف لە دڵ و دەروونی هەردوو میللەتدا و زۆر سوعوباتی سیاسی و ئیداری بۆ حکوومەتی جەلالەتتان بێنێتە پێشەوە».

هەروەک ئاشکرایە کە حکوومەتە یەک لە دوای یەکەکانی عێراق هەردەم بە درۆ و دەلەسەوە کوردیان خافل کردووە و فەرامۆشیان کردووە. هەر لە دامەزراندنی شانشینی عێراقەوە هەتا ئەمڕۆش دوژمن هەمیشە هەوڵی داوە و دەدا بۆ سوود وەرگرتن لەکات و ئینجا هێرش بردنە سەر گەلی کورد لە کوردستانی خواروودا، واقیعی ئێستای کوردستان نموونەیەکی ڕوونی ئەم وتەیەی سەرەوەیە. هەر لە یاداشتەکەدا هاتووە «ئەگەر بێت و وورد‌بینەوە لە ئەسبابی شیکایەت و دڵشکاوی عەدەمی ئیعتیمادی کوردەکان بەرامبەر بە حکوومەت ئەبینین کە ئەمە عیبارەتە لە تەمەسوک کردن بەو قەرارەی کە عوسبەتولئومەم دابووی و کە لەلایەن حکوومەتی عێراق و حەلیفەی گەورەمانەوە قوبوڵ کرابوو، کە لە ئیعتیباری سانی ۱۹۲۶ەوە بەڵێن بە تەتبیقی درابوو»، لە یاداشتەکەدا وتاری سەرۆک وەزیرانی ئەوکاتە، کە لە ۲۲ی کانوونی دووەمی ۱۹۲۶ دا لە (مەجلیسی میللەت) دا دابووی نووسراوەتەوە «ئەبێ کوردەکان حەقی خۆیانیان بدەینێ، مەئمورین لە خۆیان بێ، زمانی خۆیان زمانی ڕەسمی بێ، منالەکانیان بە زمانی خۆیان لە مەداریسدا بخوێنن.....»، پاشان چەند زانیاریەک دەربارەی ڕێژەی فەرمانبەرانی کورد لە کوردستان، بەراوردکردنیان لەگەڵ فەرمانبەرە غەیرە کوردەکان بەرچاو دەکەوێ و دڵسۆزی کورد محەمەد ئەمین زەکی زۆر بە هۆشیاری و چاوقایمیەوە هەموو شتێکی زۆر جوان ڕوون کردۆتەوە «..... وە حەقیقەتەن ئەگەر تەماشای وەسائیقی ڕەسمی بکەین ئەبینین نیسبەتی موزەفین لە لیوای کەرکوک بۆ کورد ۲٤/۵٪. بۆ تورکومان ۵٦/۵٪، بۆ عەرەب و عەناسیری تر ۱۹٪یە. وەلحاڵ بە پێی ئەو ئیحسایە کە لیوای کەرکووک بە پێی ئاڕەزووی خۆی تەنزیمی کردووە نیسبەتی نفوس لەم لیوایەدا وەکو خوارەوەیە: ۵۱٪ کورد، ۲۱/۵٪ تورکومان، ۲۰٪ عەرەب، ۷/۵٪ ئەقوامی سائیرەن. لەمەوە بۆمان دەرئەکەوێ کە حکوومەت لەبەر بەعزێ ئەسباب- کە نایزانم و بڕواش بە سیحەتی ناکەم- بە زەرەری کورد و عەرەبەکانەوە یارمەتی تورکومان ئەدا». نەتەوەی سەردەست و چەوسێنەری کورد جا چ عەرەب، یا تورک، یا فارس بێ ئیش و کاری سەرەکی هەر ناکۆکی نانەوە لە نێوان ڕیزەکانی گەل و جیاوازی دروست کردن بووە لەهەر بوارێکی ژیان و بە شێوەی جۆربەجۆرەوە «ژمارەی ئەو لاوانەی کە هەتا ساڵی ڕابردوو نێڕراون بۆ خارێج- بۆ خوێندن،م.ک - ئەگاتە (۱۲۰) لەمانە تەنیا دووان یا سیانیان کوردە» یاخود «نەبوونی کوردێک لە بەینی مودیرعامەکاندا کە ژمارەیان ئەگاتە ۱۹»، زۆر نموونەی تر هەن لە یادشتەکەدا، کە پەردە لە ڕووی ڕەشی ڕژێمی ئەو سەردەمەی ئەڵقە لە گوێی ئینگلیز لا ئەدەن. زانای گەورەی کورد محەمەد ئەمین زەکی زۆر هەستی بە گرنگێتی زمانی شیرینی کوردی کردووە، دلێرانە خەباتی کردووە لە پێناوی خوێندن بە زمانی زگماک لە قوتابخانەکانی ناوچە جۆربەجۆرکانی کوردستان و بایەخدان بە داب و نەریت و کولتوری کوردەواریان. ئەوەی ڕاستی بێ ئەم چەند ووشەیەی خوارەوە کە لە لایەن کوردپەروەری خوالێخۆش بوو محەمەد ئەمین زەکییەوە ووتراوە، بەڕەچی هەموو داگیرکەران و فاشیستان ئەداتەوە، لە هەر شوێن و لە چ کاتێکا، کە چەوسێنەر و چەوساوە هەبن:

«هیچ وەختێک کورد عەرەب نییە، لەوەندەی کە ئەسکوچی «سکوچی... خەڵکی وڵاتی سکۆتلەندە- م.ک» بووە ئینگلیز ئەویش زیاتر نابێ بە عەرەب وە بە ئیجبارکردنی بۆ ئیستیعمال کردنی زمانی عەرەبیوە عادەتی عەرەبی قەت نابێتە وەتەنییەکی سادیق بۆ عێراق- خولاسە نابێ هەوڵ بدرێ کە بکرێ بە عەرەبێکی تەواو بەڵکو ئەبێ هەموو تەشویقات و تەسهیلاتێکی بۆ بکرێ تا ببێتە کوردێکی تەواو» «۱۰». لە پاشکۆی یاداشتەکەشدا زۆر بە ڕوونی چەندەها زانیاری بە کەڵک و بە سوود بەرچاو ئەکەوێ دەربارەی مەسەلەی خواروی کوردستان و پەیوەندی بە عێراقەوە.

زانا و ڕۆشنبیری مەزنی کورد محەمەد ئەمین زەکی هەر لە زووەوە هەستی بەوە کردووە، کە زمان بڕیارەی پشتی هەر میللەتێکە و ئەگەر زمانی میللەتێک فەوتێنرا واتە میللەتەکەش خۆی فەوتا. زمان دەبێتە کەرەسەی سەرەکی پاراستنی کولتور و فەرهەنگی هەموو نەتەوەیەک ڕەگەزپەرستان و کۆلۆنیالیستانی عەرەب و تورک و فارس هەر لە سەرەتای داگیرکردنی کوردستانەوە وێستوویانە و دەیانەوێ هەموو شوێنەوارێکی نەتەوایەتی و کەسێتی کورد لەبەین بەرن لە کوردستان‌دا. ئەم کارە ناحەزانە هەتا ئێستاش هەر بەردەوامە. مێژوونووس محەمەد ئەمین زەکی لە یاداشتی دووەم و ئەو پاشکۆیەی کە لە تەکیایە زۆر زانیاری بە نرخی بۆمان بەجێ هێشتووە، دەتوانین وەکو سەرچاوەیەکی مێژوویی سوودی لێوەربگرین. سیاسەتی بە عەرەب کردنی ناوچە کوردنشینە ئاپووری و ستراتیژییەکان زۆر سەرنجی زانای مەزنمانی ڕاکێشاوە و سەختانە کۆششی کردووە لە

www.aisiyakurdi.org

٨- عراق تاريخ حرب مختصرى «كورتەى مێژووى شەرى عێراق» ئەستانە ١٣٣٩ كۆچى.

بەزمانى كوردى و عەرەبى:
٩- موحاسەبەى نيابەت، چاپخانەى دار السلام، بەغدا، ١٩٢٨.
١٠- خولاسەيەكى تەئريخى كورد و كوردستان.
أ- جلْدى يەكەم، جزمى يەكەم، چاپخانەى دار السلام، بەغدا، ١٩٣١.
ب- جلْدى يەكەم، جزمى دووەم، چاپخانەى دار السلام بەغدا ١٩٣١.
ج- جلْدى دووەم، چاپخانەى ئەلعەرەبيە، بەغدا، ١٩٣٧.
١١- دوو تەقەلاْى بێ سوود، چاپخانەى مەريوانى، بەغدا، ١٩٣٥.
١٢- تەئريخى سلێمانى و ولاْتى، چاپخانەى النجاح، بەغدا، ١٩٣٩.
١٣- مشاهير الكرد و كردستان في الدور الاسلامي، ترجمه الدكتوره سانحه امين زكي، الجزء الاول، بغداد، ١٩٤٥، الجزء الثاني، بغداد، ١٩٤٧.
١٤- تاريخ الدول والامارات الكرديه في العهد الاسلامي، ترجمه محمد علي عوني، القاهره، ١٩٤٥
١٥- دەربەندى گەورە «شيعر» گولْدەستەى شوعەراى هاوعەسرم، چاپخانەى «ژيان»ى پيرەميرد، سلێمانى، ١٩٣٩.

هەروەها مێژوونووسى گەورەى كورد محەممەد ئەمين زەكى يەكێك بووە لە «نووسەرە هەرە گەورە و چالاكەكانى گۆڤارى گەلاوێژ» (٤) و بە بەرهەمە بە پێزە و بە نرخەكانى لاپەرەكانى گۆڤارەكەى نەخشاندوە و دەولْەمەند كردووە. هەروەها كتێبێكى دىكەى بە نێوى «كوت» الامارە هجوم محاصرەسى- هێرش بۆ سەركوت و ئابلْوقەدانى «بە تورکى نووسيوە، دوو بەرگ، چاپ نەكراوە، بە دەستووسى پێشكێشى مۆزەخانەى بەريتانياى كردووە(٥).



دوو تەقەلاى بێ سوود وەك سەرچاوەيەكى مێژوويى بە نرخ

كتێبۆلْكەى (دووتەقەلاْى بێ سوود)ى مێژوونووسى مەزن محەممەد ئەمين زەكى بۆيەكەم جار لە سالْى ١٩٣٥، لە چاپخانەى مەريوانى، لە بەغدا لە چاپ دراوە. هەروەها بۆ جارى دووەم سەباحى غالێب (تۆڕێنەوە، لێكۆلينەوە و پێشەكى بۆ نووسيوە و پەراوێزى بۆ رێك خستووە)، لە چاپخانەى «هەلْوێست»- لەندەن - ١٩٨٤ لە چاپى داوە. كاك سەباحى غالب لە سەرەتاى چاپى دووەمدا دەنووسێت: (ئەوەندەى ئەمن بيزانم يەكەمين كەسێك لە بيبليۆگرافياى كتێبى كورديدا نێوى ئەو كتێبەى هێنابى «ئەدمۆنز»ە، ئەوەش لە گۆڤارى كۆمەلْەى شاهانەى ئاسيايى نێوەندا ژمارە/ ٣٢، سالْى ١٩٤٥ لەوبارەوە دەنوسێ «دووتەقەلاْى بێ سوود داخوازينامەيە لە سالْى ١٩٣٠ دا لە لايەن محەممەد ئەمين زەكيبەوە پێشكێش خوالێخۆش بوو مەليک فەيسەلى يەكەم كراوە. بەغدا، چاپخانەى مەريوانى، ١٩٣٥، ٢٠١/٢ × ٧٠١/٢ ئينچ، ٦٩ لاپەرەيە) «٦».
هەروەها لەلايەن مێژوونووس و زانای گەورەى كورد بەرێز دكتۆر كەمال مەزهەر لە كتێبى «مێژوو»دا هاتووە «دوو تەقەلاْى بێ سوود، بەغدا، ١٩٣٥، ٦٩ لاپەرە، ياداشتێكە سالْى ١٩٣٠ پێكێش مێرى كردووە و كاتى خۆى قەدەغە كراوە» «٧».
نەريمان لە بيبليۆگرافياى كتێبى كورديدا نووسيويەتى «دوو تەقەلاْى بێ سوود، ئەو ياداشتەيە كە لە سالْى ١٩٣٠ دا بۆ مافى كورد پێشكەش حكومەتى كردووە، ٦٩ لاپەرە، بەغدا، مەريوانى، ١٩٣٥، ٢٢×٣٠ سم» «٨».
كتێبۆلْكەكە بريتيە لە دوو ياداشتى تايبەت بۆ مەليک فەيسەلى يەكەم و مەندوبى سامى بەريتانيا لە بەغدا، لە تەكيشياندا دوو پاشكۆ هەيە، يەكەميان راپۆرتى وەزارەتى دەرەوەى بەريتانيا بۆ كۆمەلْى گەلان لە بارەى مەسەلەى خواروى

محەمەد ئەمین زەکی و کتێبۆڵکەی

«دوو تەقەلای بێ سوود»

مەهاباد کوردی

لە مێژووی گەلی کوردمان دا زۆر کەڵە نووسەر و پیاو ماقوڵ و زانا و سەرکردە و مێژوونووس هەڵکەوتوون، کە بوونەتە مایەیی شانازی و سەربەرزی بۆ گەل و نیشتمانمان. هەندێک لەم ناودارانە وەک ئەستێرەی بەرەبەیان لە ئاسمانی کوردەواری دا درەوشاونەتەوە و مۆم ئاسا بوونەتە رووناککەرەوە و رێپیشاندەری رێگای راستەقینەی ژیانی گەلەکەیان. میللەتی کورد هەردەم رۆڵەی بە وەفاو دڵسۆزی خۆی خۆشویستوە و هانی داوە کە زیاتر و زیاتر خەبات بکات لە پێناوی ئازادی و هەقپەرستی و مرۆڤایەتی‌دا. یەکێ لەو زانا گەورانەی کە کورد هەمیشە شانازی پێوە دەکات، مێژوونووس و زانای بەناوبانگ محەمەد ئەمین زەکی‌یە. بێگومان ئەم زاتە دڵسۆزە لە پاش مەرگی خۆی گەنجینەیەکی زۆر دەوڵەمەند و بە نرخی بۆ گەل و نیشتمانی بەجێ هێشت و هەتا هەتایی ئەو نیشتمانپەروەرە لە دڵی رۆڵە دڵسۆز و بە شەرەفەکانی گەل دا دەژی.

کورتەیەکی ژیانی محەمەد ئەمین زەکی

لە بەشی دووەمی (کورتەی مێژووی کورد و کوردستان)، کە بە عەرەبی لە ساڵی (١٩٤٨) لە میسر چاپکراوە (دووبارە لە لایەن کۆمەڵەی هاوکاری کردنی قوتابیانی کورد لە بەریتانیا چاپکراوەتەوە- ساڵی ١٩٨٦) دەربارەی ژیانی زانای خوالێخۆش بوو بەم جۆرەی خوارەوە باسکراوە:

لەساڵی (١٨٨٠) لە شاری سلێمانی لە دایک بووە. پاش تەواوکردنی خوێندنی سەرەتایی (روشدیەی عەسکەری) چووەتە بەغدا لە ساڵی (١٨٩٦) چووەتە ئامادەیی سەربازی و پاشان چووە بۆ ئەستانە (١٨٩٩)، قوتابخانەی جەنگی و (مەدرەسەی ئەرکان)ی لەوێ تەواوکردووە (١٩٠٢)، ئنجا بە پلەی ئەفسەر لە سوپا دامەزراوە. لە ساڵی (١٩١٣) بە کارێکی ڕەسمی سەفەری ئەڵمانیا و فەرەنسای کردووە و هەر لەو سەفەرەدا زۆر سەرچاوەی گرنگی دەربارەی کورد و کوردستان کۆکردۆتەوە. لە کاتی جەنگی جیهانی یەکەم (١٩١٤-١٩١٨) زۆر کار و فەرمانی ڕەسمی پێ سپێردرابوو، بە تایبەتی لەبەرەکانی شەڕ لە عێراق و سوریا و فەلەستین‌دا. پاشان هاتۆتەوە ئەستانە و هەر لەوێ ماوەتەوە تا کاتی گەڕانەوەی بۆ عێراق، واتە لە کۆتایی تەموزی (١٩٢٣)، ئینجا بە مامۆستا لە قوتابخانەی سەربازی لە بەغدا دامەزراوە. بۆ جاری یەکەم (١٩٢٥/١/٢٤) لە وەزارەتی عەبدول موحسین سەعدون وەکو وەزیر کاری کردووە. هەتا ساڵی (١٩٤٢) زۆرجار وەزیری کردووە لە وەزارەتە جۆربەجۆرەکان دا.

لە ساڵی (١٩٢٦)ەوە را چەندجار بە نوێنەری شاری سلێمانی هەڵبژێردراوە و لە دوا ساڵەکانی ژیانیشی‌دا هەر ئەندامی ئەنجوومەنی پیران بوو. پێش مردنی بە چەند ڕۆژێک گەشتێکی بۆ سلێمانی کرد و خەڵکی شار زۆر بە ڕێزەوە پێشوازی‌یان لێکرد و شاعیری گەورەی کورد پیرەمێرد (١٨٦٧- ١٩٥٠) داوەتێکی گەورەی تایبەتی لە چیای ئەزمڕ (نزیکەی ١٧ کیلۆمەتر لە باکوری سلێمانی) بۆ کرد.

واباوە کە هەر بە هۆی ئەو داوەتەوە نەخۆش کەوتووە و لە دوایی دا گەڕاوەتەوە بۆ بەغدا و لە بەرواری (١٩٤٨/٧/٩) دا کۆچی دوایی کردووە. تەرمی پیرۆزی زانای کورد براوەتەوە بۆ سلێمانی و خەڵکی بەشەرفی شار بە خاکی پاکی (سەیوان)یان سپاردووە. «١»

«ئەگەر مردم و نەمدی قەومەکەم سەربەرز و ئازاد،بژانن، دەنالێ ڕۆحەکەم تا ڕۆژی میعاد، ئەبێ لاوانی کورد تێ بکۆشن، گەر ویستیان ڕۆحی من ببێ شاد» (٢).

ئەوەی ڕاستی بێ دەربارەی ژیانی زانای مەزن محەمەد ئەمین زەکی لە زۆر گۆڤار و ڕۆژنامە و سەرچاوەی تری کوردی دا بە دوور و درێژی باسکراوە «٣» لێرەدا من مەبەستم باسکردنی کتێبۆڵکەی «دوو تەقەلای بێ سوود»ە و بەس، بۆیە زۆر بە کورتی لەسەرەوە دەربارەی ژیانی ئەو کەڵە پیاوە زانیاریم داوە.

بەرهەمە چاپکراوەکانی محەمەد ئەمین زەکی بە زمانی تورکی:

١- عثمانلی اوردسی «سوپای عوسمانی» بەغدا ١٣٢٤ کۆچی.

٢- تاریخ حربی عثمانلی تدقیقاتی «مێژووی لێکۆلینەوەی جەنگەکانی عوسمانی» ئەستانە ١٣٣٦ کۆچی.

٣- عراق نصل غائب ایتدک «چۆن عێراقمان لە دەست چوو» ئەستانە ١٣٣٦ کۆچی.

٤- حرب عمومیده عثمانلی جبهەلری وقایعی «شەڕ و ڕووداوی مەیدانەکانی جەنگی عوسمانی لە شەری یەکەمدا» بەغدا ١٣٣٧.

٥- عراق سفری خطالرمز «شەڕەکانی عێراق و هەڵەکانمان» ئەستانە ١٣٣٧ کۆچی.

٦- سلمان پاک میدان محاربەسی وذیلی «شەری سەلمان پاک و پاشکۆیەک» ئەستانە ١٣٣٩ کۆچی.

٧- بغداد وصوک حادثە ضیاعی «ڕووداوی لە دەست چوونی ئەو دوایی‌یەی بەغدا» ئەستانە ١٣٣٩ کۆچی.

www.arsivakurdi.org



بەناونبشانی رێژیسۆر. رێگای خزمەتی سەربازیم کە دوو ساڵی خایاند گرت. ئەوە یەک گۆرانی گرنگی لە زیانی من وەدی هێنا، لەبەر ئەوەی بۆ یەکەمین جار بۆ ماوەی دوو ساڵ کاتم هەبوو کە بە شێوەی سیستەماتیک بخوێنمەوە. ئەوە مانای ئەوە ناگەیێنێ کە لەمەوبەر نەمدەخوێندەوە، خوێندبوومەوە، بەڵام سیستەماتیک نەبوو، چونکە لایەنەکانی پراکتیکی سینەما زیاترین گرنگی لە ژیانی من دا هەبوو. لە ماوەی خزمەتی سەربازی توانیم بە شێوەیەکی سیستەماتیک کتێبەکانی لینین، مارکس و ماو بخوێنمەوە، ئامادەبووم لەگەڵ تەوابوونی خزمەتی سەربازیم یەکەمین هەنگاوی بەرجەستە هەڵێنمەوە. ئەوەش شتێ بوو کە لە ساڵی ١٩٧٠ روویدا.

کاتی خزمەتی سەربازیم تەواوکرد بەکەمین فیلمی خۆم «هیوا» دروست کرد، بەڵام بۆ دروست کردنی ئەو فیلمە و بۆ دابین کردنی خەرجی و سەرەرای ئەوە من ئامادەکەریشی بووم، ناچار بووم لە هەمان کات لە فیلمی گاگنستەریش دا رۆڵ ببینم تا بۆخۆم پارە وەدەست بێنم.

هەر لەو چوارچێوەیەدا جموجۆڵی سیاسی من کەوتە بەر پەیوەندی لەگەڵ بزوتنەوەی جیاجیای سیاسی، لەو کاتەدا کە هێشتا لەباری سیاسی روون نەبووبوومەوە پەیوەندی جیاجیام هەبوو، ئەوکاتە بزوتنەوەی جۆراوجۆرمان هەبوو، بزوتنەوەی خوێندکاران هەبوو، بزوتنەوەی کرێکاران دژی هێزە کۆنەپەرستەکان هەبوو، من هاوکاریم لەگەڵ ئەوانەدا هەبوو، کۆمەکی ءەوانەم دەکرد. لە ساڵی ١٩٧٢ ئەندامی یەکی لەو رێکخراوانەی کە من کۆمەکم دەکردن دەسگیر بوو و منیش لەسەر کومەک کردنی ئەوان رەوانەی بەندیخانە کرام، بەڵام ئەو دەسگیرکردنەی ١٩٧٢ خاڵی وەرچەرخانەوەی راستی ژیانی من بوو لەبەر ئەوەی لە بەندیخانە بە هۆی تۆری نهێنی توانای دەرسی مارکسیزم- لینینزم پەیداکرد، من دەربارەی شۆرش، دەربارەی ریڤزیۆنیزم و دەربارەی سۆڤیەت زۆر شت فێربووم. لەکاتێکدا کە هێشتا ئامادە نەبووم سۆڤیەت بە سۆسیاڵ- ئیمپریالیست دابنێم بەڵام دەمزانی کە وڵاتێکی سۆسیالیستی نی‌یە. لە هەمان کات فێربووم کە چۆن بۆچوونی دژوار لە هەندێ بزوتنەوەکانی وردەبرژوازی وەدیاردەدا و بزوتنەوەی سۆسیالیستی راستەقینە دەبێ چۆن بێ دیاری بکەم. من لەبابەت رۆڵی سەرکردایەتی چینی کرێکار ژۆر شت فێربووم. هەروەها هەڵسوکەوتی شۆرشگێرانە وەلە رووی سینەماشەوە بە هەمان شێوە دەستم کرد بەوەی کە لەمەودوا چ جۆرە فیلمێک دروست بکەم، بەو پێیە بۆچوونێکی قووڵتر و رۆشنترم لە سینەمادا پەیدا کردبوو، تاکو ساڵی ١٩٧٤ هاتمە دەرەوە ئامادەبووم کە دووبارە هەنگاوی گرنگ لە کاری سینەمادا بە ناونیشانی زێژیسۆر هەڵێنمەوە. بەڵام ساڵی ١٩٧٤ کاتی کە وێنەی دوەمم دەگرت دووبارە رەپێچی بەندیخانەیان دامەوە.

ساڵی ٧٤ تاکو ٨١ لە بەندیخانەبووم و لەوێ رۆمان کورتە چیرۆکم دەنووسی، بەڵام نووسراوی سیاسیشم هەبوو بێنج فیلمیشم دروست کرد، دوانی یەکەمی زۆر سەرکەوتوو نەبوون، بەڵام سێیەکەی دوایی کە رۆڵی زیاترم لە ئامادەکردنیان هەبوو، سەرکەوتنێکی جیهانیان وەدەست هێنا، ئەو فیلمانەش (مێکەل، دوژمن و دوایینیان رێگا «یۆڵ»). یۆڵ زیاتر لەوانی تر پەیوەندی بەمنەوە هەبوو. لەبەر ئەوەی تەواوی رێکخستنی کۆتایی فیلمەکە بە خۆم ئەنجامم داوە، ئێستا توانای زیاترم هەیە، بەڵام لە ئاوارەیی بەسەر دەبەم، مەبەستم ئەوەیە کە بەو توانایەوە ئەگەر بۆم بکرایە لە وڵاتی خۆم فیلم دروست بکەم، دەمتوانی کاری زۆر جیاواز و هەتا بگرە باشتر ئەنجام بدەم.

بەڵام لەمەودوا ئەوەی کەلە دەستم بێ بیکەم، کەسی‌یەتی هونەری من دیاری دەکا.

** ئەو ئۆتۆبیوگرافیایە بە زمانی فارسی لە گۆڤاری (جهان برای فتح) ژمارەی ژانیوەری ١٩٨٥ لاپەرە ٧٣-٧٤ بڵاوکراوەتەوە.*

www.arsivakurd.org

ئۆتۆبیۆگرافیایەکی کورت

سەلاح رێبوار

لە فارسی‌یەوە کردوویە بە کوردی

ئەم نووسینەی خوارەوە هەڵبژاردەیەکە لە چاوپێکەوتنەکانی هونەرمەند یەلماز گونای کەلە ژمارە ١ ئۆکتۆبەری هەفتانەی پارتی کۆمەنیستی شۆرشگێری ئەمریکا بڵاوکراوەتەوە.

من لە ناوچەیەکی گوندنیشین چاوم هەڵێناوە، دایک و باوکم لە جوتیارە هەژارەکان بوون، لە هەمان کاتدا کوردیش بوون، لەبەر ئەوە ئایدیۆلۆژی من لەیەک ئایدیۆلۆژی جوتیاری کەلە ناوەرۆکدا بورژوازیە پێکهاتووە، بەڵام لە دایک بوون و ژیانم لە نێو جوتیارانی هەژار و بەتایبەتی کە پەیوەندی بە یەک میللەتی چەوساوە، میللەتی کورد کاری کردە سەر بیروباوەری من، ئەو کاریگەری‌یەش منی بەرەو شتێک رەکێش دەکرد، کە نەمدەزانی ئەو شتە چی‌یە، تابگرە نەمدەزانی ناویشی چی‌یە، بەڵام هەر خەریکی ئەو شتەبووم. لە سەرەتای ساڵانی پەنجا لەچەند کەسێ راست هاتم، بۆ نموونە شیعرەکانی «نازم حیکمەت» (شاعیری کۆمەنیستی تورک) لە بارەی جەنگی نێوخۆی ئیسپانیا بە سروود گوێم لێ بوو، لە ساڵی ١٩٥٢ دەسگیریەکی بەهەراوی کۆمەنیستەکان لە توکیا کرا، لەناو ئەوانەدا چەندیان شاعیر بوون و من شیعری ئەوانم ببستبوون، هەڵبەتە ئەو رێکەوتانە هەموویان نایاسایی بوون. وەلە راستیشدا ئەوە سۆسیالیزمی زانستی نەبوو، زیاتر شتێکی ئایدیالیستی لە جۆری ئۆتۆپی بوو. هیچ کەس سەبارەت بە چینی کرێکار قسەی نەدەکرد، هیچ کەس لەبارەی مارکسیزم- لینینزم وتاری نەدەدا و هیچ کەس دەربارەی ماتریالیزمی دیالەکتیک وتووێژی نەدەکرد. تەنیا جۆرە ئەدەبیاتێک بوو دەربارەی نارێکی و هەژاری و پێویستی گۆرینی ئەو ژیانە. بەڵام ئەوانە روونیان نەدەکردەوە کە دەبێ لەگەڵ کێ بجەنگێن. هیچ لەوانە نەبوون. دوای ئەوە لە ژێر ئەو کاریگەریانە دەستم بە نووسینی کورتە چیرۆک کرد. دەستم بە قسە کردن کرد، بەم جۆرە یەکەم تێک ئالانم لەگەڵ پۆلیسی سیاسی رویدا.

لە ساڵی ١٩٥٥ لەسەر نووسینی کورتە چیرۆکێک «هەتا ئەوکاتەش لە خوێندنگابووم» بە تاوانی بڵاوکردنەوەی کۆمەنیستی نێردرامە دادگا. ئەوە تەنیا کورتە چیرۆکێکی پڕ سۆز و خرۆش بوو هیچی تر، کەچی دوایی بە دادوەری‌یەکی دوورودرێژ لە ساڵی ١٩٦١ بە ٢-٥ ساڵ زیندان و دوورخستنەوە بریارم لەسەر درا. لەکاتی دادوەی ساڵی ١٩٥٧ناچار بووم «ئەدەنە»ی شارم ئەو شوێنەی ساڵانی گەنجیم لەوێ بەسەر بردبوو و لەوێ خوێندنم تەواو کردبوو بەجێ بێڵم و چوومە ئەستەنبوڵ بۆ ئەوەی پارتی کۆمەنیست بدۆزمەوە، لەبەر ئەوەی راستی نەمدەزانی ی‌یە، خەڵکیش بەو ناوە بانگیان دەکردم. بەڵی چوومە ئەستەنبوڵ، بەڵام تێکەوتم، دەگەیشتمە هەر کۆمەنیستی بێ هیوای دەکردم، ئەوکاتە نەمدەزانی ئەوە چۆن روون بکەمەوە، چی ناوێ لەو هەڵخەڵەتاندنە بنێم. ساڵی ١٩٧٢ کە دووجار چوومە زیندان. دەستم کردە خوێندنەوە، تازە ئەو کاتە توانیم ناوی لەو هەڵخەتاندنە بنێم و تێگەیشتم ئەوە فریوی ریڤزیۆنیزمە خواردوومە. بەڵام ئەوکاتە من مارکسیزم- لینینیزمم نەدەناسی، مەبەستم ئەوە نی‌یە کە ئێستا بە تەواوی دەیناسم، واتە دەستم کرد بە خوێندنەوەیان، لەبەر ئەوەی لە نێوان ساڵانی ٦١ و ٦٣ لە زیندان و دووخراوەیی بەسەرم برد، لە ساڵی ١٩٦٣ سوورێکی نوێ لە زیانی من دەستی پێکرد.

ساڵی ٦٣ وەکو ئەکتەرێک دەستم بەکار کرد، کاتی لە بەندیخانە بووم نەخشەم دەکێشا کە دەبێ ببمە ئەکتەر، بەناوبانگترین ئەکتەری وڵات، کە بتوانم تەواوی ئامانجەکانم بگەیەنمە جێگا..... لەسەر ئەو پێ و دانگە حسابەکانم کردبوو، تاکتیکەکانم بە تەواوی لە زیندان دانان، کاتێ ساڵی ١٩٦٥ بوومە یەکێک لە خۆشەویست ترین و بەناوبانگترین ئەکتەر. ناتوانم بڵێم کە تەواوی ئەو فیلمانەی رۆڵم تێدا دەبینین فیلمی شۆرشگێرانە یان دیموکراتیک بوون، بەڵام تەواوی ئەوانە لای خەڵک خۆشەویست بوون. ئەوانە رەنگدانەوەی رەنج و بەدبەختی و هەست و نەستی خەلک بوون. زۆر لەوانە هەڵگری گومانی سیاسی یا ئایدیۆلۆژی بوون و هەندێکیان ریفۆرمیست بوون تابگرە هەندێکیان ئەنارکیشستی بوون، هەندێکیان لایەنی شەقاوەیی‌یان تێدابوو، بەڵام تەواوی ئەو تاقی کردنەوانە رێگە خۆشکەربوون بۆ دروست کردنی پەیوەندی‌یەکی فراوان و توند و تۆڵ بە جەماوەر.

لە ماوەی نێوان ساڵانی ٦٥و٦٦ هەستی دڵتەنگی توندم لێپەیدابوو، لەو کارانەی کە دەمکرد رازی نەبووم. لە ساڵی ٦٦ سەیرم کرد لەو فیلمانەی کە رۆڵم تێدا دەبینین زیاتر رارایی بە خەرج دەدەم، بۆیە دەستم کرد بە رۆڵ بینین لە فیلمی باش «پۆزەتیف». بەڵام لە هەمان کات دا لەبەر خاتری پێویستی دارایی ناچار بووم لە هەندی فیلمی خراپ «نێگەتیڤ» رۆڵ ببینم لەبەر ئەوەی کاتی دەستم پێ کرد مەبەستی سەرەکیم ئەوە بوو خۆشەویست ببم، تا بتوانم خۆم فیلم دروست بکەم. بەڵام تەنیا رێگام ئەوەبوو دەبوایە لە پێشدا پیشەی ئەکتەریم هەبێ. هەر لەبەر ئەوە یەکەمین هەنگاوی من لە ساڵی ١٩٦٨ دەستی پێکرد.

لە ساڵی ١٩٦٨ دوای یەکەمین تەقەلا

www.arsivakurdi.org

پێشانگایەک لە شاری سەقز



رۆژانی ٨ تا ١٣/٥/١٩٨٩ لە شاری سەقز پیشانگای هونەرمەند رەمزی سازکرا، کە بریتی بوو لە کاری رەنگی رۆن، باستیل، هێڵکاری.

رەمزی دەرچووی پەیمانگای هونەرە جوانەکانی بەغدایە و تاکو ئێستا چەندین پیشانگای هونەری سازکردووە، یان لەگەڵ هونەرمەندانی تردا هاوبەشیی چەند پیشانگایەکی کردووە، چ لە شارەکانی عێراق و ئێران، شارەکانی کوردستان، ناوچە ئازادکراوەکانی کوردستان و چ لە دەرەوەی وڵات.

ساڵی ١٩٧٨ لە هۆڵی پەیمانگای هونەرە جوانەکانی بەغدا و لە هەمان ساڵدا لە هۆڵی رۆشنبیری شاری کەربەلا پیشانگای سازکردووە.

ساڵی ١٩٧٩ لە پیشانگای پوستەر کە بە بۆنەی ساڵڕۆژی رۆژنامەگەریی کوردییەوە لە کۆری زانیاری کورد لە بەغدا سازکرا، بەشداریی کردووە. هەمان ساڵ پیشانگای «گرافیک»ی لە هۆڵی گوێژە لە شاری سلێمانی سازکرددوە.

ساڵی ١٩٨٠ لە پیشانگای هونەرمەندانی کورد لە ئیتالیا بەشداریی کردووە.

ساڵی ١٩٨١ لە پیشانگایەکی هاوبەشی گرافیک لەگەڵ (مەدحەت کاکەیی و سەروەت ئەنوەر و ئیسماعیل خەیات) بەشداریی کردووە. هەمان ساڵ لە پیشانگای گرافیکی هونەرمەندانی کورد لە هۆڵی موزەی میللی بەغدا بەشداری کردووە.

لە ناوچە ئازاد کراوەکانی کوردستانیش چەند پیشانگایەکی ساز کردووە، ١٩٨٢ لە گوندی «هەڵەدن» و ١٩٨٤ لە هاوینەهەواری «کۆتەڵ» لە «سورداش» هەروەها ١٩٨٨ لەگەڵ چەند هونەرمەندێکی تر لە مەیدانی ئازادی تاران پیشانگایەکی سازکردووە. ١٩٨٩ لە پیشانگایەکی تری هاوبەشدا لە شاری «سنە» بەشداریی کردووە.

رەمزی دەربارەی هونەرەکەی خۆی دەڵێت:

«شاخ دانشگای من بوو، ئەگەر چی بەرهەمی کەمی پێ بەخشیوم، بە واتایێکی دی کەمتر پەرژاومەتە سەر کار، بەڵام لە رووی چۆنیەتییەوە، جۆرە بناغەیەکی دی بۆ دارشتووم، ئەویش تێکەڵ بوون و توانەوە لەگەڵ ئێش و ئازاری گەورەی وڵات و نەتەوەکەم، کە خوێنی بەڕەنگ و هێڵەکانم بەخشیوە.

بەر لە ژیانی شاخ و پیشمەرگایەتیم کاری هونەریم زۆر بوون، بەڵام پێویستیان بە خاکی خۆیان هەبوو تا رەگ و ریشەی دروست داکوتن. فیگەرەکانی پێشووم لە رووی دەرەوەی میللەتەکەم دەدوان، کەمتر رێیان بۆ دیوی ناوەوەی خۆشکرد بوو. دیارە دیوی ناوەوەی فیگەرەکان کات و جێیان دەوێت..... ئەڵبەتە سەنگەر، بووە جێیان و ژیانی هەمیشەیی کوردیش بووە کاتیان».

چەند شعرێکی کورتە بااڵ

کرمانج

شۆڤێنیزمی عەرەب

لە کاتێکا کە تەنگاون
بەرەوپیرمانەوە دێن و بە (اخواننا الاکراد)
بە خێرمان دێنن
بۆ سەردانی خانەی مێژوو دەگەرێنەوە
جارێکی تر (سەلاحەددین) دەکەن بە کورد
هاوخەباتی (الشعب الکردی) لەگەڵ خۆیان
نیشان دەدەن
هەر کاتێکیش مرازیان بۆ حاسڵ بووبێ
بە (الخائن والمتمرد) ناومان دەبەن

١٩٨٨/٢/٢٥- سوید

بێ ویژدانی

سەدان ساڵە
زەنگی دونیا پاڕەژەنم
دەرگای- مافی مرۆڤ - دەکوتم
لە دەرگای - کۆمەڵەی نەتەوەکان - دەدەم
زێگای خانەی - زێکخراوی ئاشتی گەلان-
دەگرمەبەر
دەستم کردە داوێنی - ئەمریکا -
لەبەر - سۆڤیەت - پارامەوە
کە گوتم کوردم.....
هەر بە پەلە، یەک لە دوای یەک
دەرگای خۆیان لێ داخستم

١٩٨٨/٣/١٦- دانیمارک

شەهید

کە پێشمەرگە شەهید دەکرێ
گیانێکی نوێ لە دایک دەبێ
ئەم گیانە،
سێبەرێکە و دەچێتە بان سەری ئەو شاژنەی
سەردەمێکە کەللەی سەری کۆرپەکانی.....
لەناو مەنجەڵی بورکانی
ناعەدالەتی ئەم جیهانە دەکولێنرێ

١٩٨٨/٢/٢٤- سوید

دەیانەوێ بە زۆر بلاوەمان پێبکەن، بۆ بەرگری لەم کردارە بریارمان دا کە ئافرەت و منداڵەکانمان بخەینە ناوەراستەوە خۆمان بە سێ ریز بە دەوریانا دابنیشین. بەردەوام داوامان لێدەکردن کە لێمان بگەڕێن تارۆژی چوارشەمە ۱۹۸۹/۵/۳۱ کە کۆبوونەوەی ئێمە لەگەڵ نوێنەری باڵۆزخانەکان و نوێنەرانی UNHCR دا دەکرێت، بۆ ئەوەی وەکو بەڵگەیەکی زیندووبین لە پێش چاویان، بەڵام داواکاریەکەمان پشتگوێ خرا.

لە کاتژمێری ۱۲ی شەودا ۲۹-۱۹۸۹/۵/۳۰ دەستیان کرد بە رووخاندنی کەپرەکانمان و بارکردنی ئەو کەل و پەلانەی کە پێمان بوو، ئەم کارەش رەفتاری رۆژمی عێراقی دەهێنایەوە بەرچاومان لە روخاندن و کاوڵکردنی (کوردستان)، بۆ دواجار ئاگاداریان کردینەوە کە ئەگەر بە خۆشی بلاوە نەکەن و سواری سەیارەکان نەبن ئەوا بە زۆری لێدان بلاوەتان پێدەکەین.

ئێمەش دەستی یەکترمان گرت و ریزی پێشەوەمان پشتی کرد پۆلیسەکان بۆ ئەوەی ئەگەر بە زمان لێمان تێنەگەن کە (مانگرتنەکەمان ئاشتیانەیە) بە بەڵگە بۆیان بسەڵمێنین.

ئەوەی شایانی باسە پۆلیس کەمتەرخەمی نەکرد لە لێدان و راکێشانمان بەسەر زەویدا و ڕووتکردنەوەمان (دزینی کاتژمێر و پارە و..... هتد).

ئەم کارە نامرۆڤانەیەی پۆلیسی پاکستانی زیاتر لە (٤٥) دەقیقەی خایاند دژ بە (۳۰۰) پەنابەری کوردی عێراقی کە نزیکەی ۲/۳ی ئافرەت و منداڵ بوون.

دوای ئەوەی بە زۆر (پیاوەکان) سواری سەیارەکران و لە شوێنی مانگرتنەکە دوور خرانەوە بە (چوار) سەیارە گوێزرانەوە بۆ دەرەوەی ئیسلام ئاباد و لەهەر سەیارەیەکدا بە شێوەیەک شەڕی دەرونیان لەگەڵ دەکردین... بەوەی گوایە تەسلیمی عێراقتان دەکەینەوە، دەتانێرینەوە بۆ ئێران، دەتانبەین بۆ بەندیخانە، شایانی باسە ژمارەیەکی زۆرمان لێبرێندار بوو.

پاش دورخستنەوەی پیاوەکان، ئافرەتە بە جەرگ و منداڵە چاو نەترسەکانمان شێرانە لە جێگای خۆیان مانەوە بێ گوێدان بە هەڕەشەی پۆلیس و ترساندنیان بەوەی کە گوایە پۆلیسی ئافرەت دەهێنن وەکو پیاوەکان بە زۆر بلاوەیان پێدەکەن.

ئەم هەڕەشەکردنەی کاری نەکردە سەر وڕەی پۆلاێنی ئافرەتە قارەمانەکانمان و منداڵە ئازاکانمان (شایانی باسە کە ۱۲ ئافرەتیان سک پڕ بوو، یەکێکیان پاش ۳ ڕۆژ لە دوای مانگرتنەکە منداڵی بوو).

ئەو شەوە تاکو بەیانی بەبێ نان و ئاو مانەوە و بەرەنگاری هەموو ئەو پیلانانە بونەوە کە بۆ بلاوە پێکردنمان دارێژرابوون لە لایەن بە کرێ گیراوانی حکومەتی پاکستانی و سەفارەتی عێراقەوە. وڕەی بەرزی ئافرەت و منداڵەکانمان وای لە کاربەدەستانی دەوڵەتی پاکستان کرد کە لێمان بپارێنەوە بۆ ئەوەی بچینەوە خێزانەکانمان ببەینەوە. ئێمەش توانیمان داوا کاربیەکەی خۆمان بەسەر حکومەتی پاکستانییدا بسەپێنین و گەڕاینەوە بۆ شوێنی مانگرتنەکە لەبەر دەرگای UNHCR و لەگەڵ ئافرەت و منداڵەکانمان یەکمان گرتەوە. پاش بەڵێن دانێکی زۆری حکومەتی پاکستان کە بە هەموو توانایەوە هەوڵی چارەسەرکردنی کێشەکەمان بدا ئێمەش لەسەر بریاری لێژنەی سەرپەرشتی کۆتایمان بە مانگرتنەکە هێنا.

ئەوەی شایانی باسە ژمارەیەکمان کە لە دەست پۆلیس رایان کردبوو توانییان بەو شەوە خۆیان بگەیننەوە شوێنی مانگرتنەکە و (٥) کەسیان لێ دەست گیرکرا. بە گەرانەوەمان بۆ شوێنی ناوبراو ئەوانیش ئازادکران لەسەر داواکاری خۆمان.

هەروەها لە کاتی لێدان و راکێشاندا ژمارەیەک لە وێنەگر و ڕۆژنامەنووس و پەیامنێری ئاژانسە دەنگوباسە جیهانییەکان لەوێ ئامادە بوون، بەڵام بەداخەوە هەندێک لە ڕۆژنامەنووسە پاکستانییەکان نەیاندەویست (پێنوسەکەیان) وەکو چەکێ بۆ پارێزگاری کردن لە ئێمە بەکار بهێنێ. بەڵام ئاژانسە جیهانییەکان وەکو AFP ، ڕوێتەر، VOA دەورێکی ئازایانەیان بینی، لەوانە وێنەگرێکی فەرەنسی زۆر بە پەرۆشەوە دەیویست وێنەمان بگرێ، بەڵام پۆلیسی پاکستانی کامیراکەیان لێسەند و نەیانهێشت تاقە وێنەیەکی ئەم کارە چەپەڵەی پۆلیسەکان بگرێ کە دەرهەق بە ئێمەی کوردی ئاوارە ئەنجامیان دا.

ئەو کۆبوونەوەیەی کە بریار بوو بەستری لە نیوان لێژنەی گفتوگۆی ئێمە و نوێنەرانی هەندێک لە باڵۆزخانەکانی وڵاتانی RE-SETTLMENT کە بریتی بوون لە (سوید، دانمارک، نەمسا، ئوسترالیا، ئەمریکا، کەنەدا) لە ڕۆژی ۱۹۸۹/۵/۳۱ بەسترا بە ئامادەبوونی لێپرسراوانی UNHCR لە بارەگای ئەم ڕێکخراوەدا. لەو کۆبوونەوەیەدا لێژنەی گفتوگۆمان بە دوور و درێژی باسی بارودۆخی میللەتی کورد لە عێراقدا و ژیانی پەنابەری کورد لە ئێران و پاکستاندا بۆ ئامادەبوان کرد، ئەوانیش بیروڕای خۆیان دەربڕی، کە هەندێکیان مایەی دڵخۆشی ئێمە بوو هەندێکیشیان تا ڕادەیەک ئیجابیەتی کەم بوو.

لێژنەی سەرپەرشتی
کاروباری پەنابەری کوردی
عێراقی لە پاکستان
حوزەیرانی- ۱۹۸۹

تێبینی:

لەگەڵ دەستپێکردنی دوا مانگرتنمان کە لە بەرواری ۱۹۸۹/۵/۲۳، ئەو ۳۵ بەندکراوە عێراقیانەی کە بریار بوو بە زۆر تەسلیمی ڕژێمی عێراق بکرێنەوە ئازاد کران. هەروەها لەم دواییەشدا ۲۳ بەندکراوی تر ئازادکران. ئێستا تەنها ۷ بەند کراومان ماوە لە بەندیخانەی کوەیتە.

داوای لێبوردن:

لە ژمارەی پێشوودا لە دوا دێڕی لاپەرە ۷۰دا وشەی (ئازاد کراون) کەوتبوو. ئەو ڕستەیە وای لێدێت: پاش ماوەیەک کورە ئاوارەکانی پاکستان بە ئامە ئاگاداریان کردینەوە کە زیندانییەکان ئازادکراون.

www.arsivakurdi.org

گفتوگوکردنیان پێسپێرابو لەگەڵ UNHCR و کاربەدەستانی حکومەتی پاکستان.

ب- لێژنەی ڕاگەیاندن: لە دوو ئەندامی لێژنەی سەرپەرشتی و دوو کەسی تری دەرەوەی لێژنەکە پێک هاتبوو کرابوو بە دوو بەش:

١- لێژنەی ڕاگەیاندنی ناوەوەی مانگرتنەکە: کە لە ئەندامێکی لێژنەی سەرپەرشتی پێک هاتبوو کاروباری وەلأم دانەوەی ڕۆژنامەنووس و ڕێکخراوە جۆربەجۆرەکانی تر، کە دەهاتن بۆ بینینی مانگرتنەکە، کەوتبوە سەرشانی.

٢- لێژنەی ڕاگەیاندنی دەرەوە: کە لە ئەندامێکی لێژنەی سەرپەرشتی و دوو ئەندامی تری دەرەوەی لێژنەکە پێک هاتبوو ئەرکی گەیاندنی دەنگوباسی مانگرتنەکەی خستبوە ئەستۆی خۆی. بۆ ئەوەی بیگەیێنێتە ڕۆژنامە ناوخۆییەکان و گشت ئاژانسەکانی دەنگوباسی جیهانی... لەوانە (ڕۆیتەر، ئاژانسی دەنگوباسی فەرانسە، BBC ، دەنگی ئەمریکا، ئاژانسی دەنگوباسی پاکستانی، ئەسۆسییەتد پرێسی ئەمریکی).

ج- لێژنەی چاوەدێری:- لە سێ ئەندامی لێژنەی سەرپەرشتی و ژمارەیەکی زۆر لە برایانی تر پێک هاتبوو و ئەمەش بەسەر سێ لێژنەی ناوەندیدا دابەش کرابوو:-

١- لێژنەی چاودێری گشتی: کاروباری ڕێکخستنی مانگرتنەکەی خستبوە ئەستۆی خۆی و لەگەڵ ئەرکی پاسەوانی شەوانەدا.

٢-لێژنەی طواریء: کاروباری چارەسەرکردنی (ڕووداوی لە ناکاو)ی خستبوە ئەستۆی خۆی.

٣- لێژنەی چاودێری منداڵان.

د- لێژنەی تەندروستی: لە ئەندامێکی لێژنەی سەرپەرشتی و ٤ کەسی تر پێک هاتبوون کە یەکێکیان پزیشک بوو، ئەوانی تریش یارمەتی دەری پزیشک بوون.

هـ- لێژنەی دارایی: کە لە دوو برادەری دەرەوەی لێژنەکە پێک هاتبو. کاروباری دارایی مانگرتنەکەی دەبرد بەڕێوە (بەلأم لە پاش مانگرتنەکەوە ئەم لێژنەیە بە سەرپەرشتی دوو ئەندامی لێژنەی سەرپەرشتی و دوو برادەری تر کاروباری دارایی لێژنەکە دەبەن بەڕێوە)

و- لێژنەی خواردن:- لە ئەندامێکی لێژنەی سەرپەرشتی و چەند برادەرێکی تر پێک هاتبو.

شایانی باسە مانگرتنەکەمان لە ١٩٨٩/٥/٢٣ لە کاتژمێری ١٠ی سەر لە بەیانی لەبەر دەرگای UNHCR لە ئیسلام ئاباد دەستی پێکرد. لێژنەکانمان دڵسۆزانە ئەرکەکانی خۆیان ئەنجام دەدا.

بە بەردەوامی لێژنەی گفتوگۆمان لەگەڵ UNHCR دا دادەنیشتن و گفتوگۆی دڕێژەخایانی لە گەلأ دەکردن بە مەبەستی چارەسەرکردنی کێشەکەمان.

بەلأم لە ڕاستیدا دەستکەوتێکی ئەوتۆمان بە دەست نەهێنا، جگە لەوەی UNHCR بەڵێنیدا کە گوایە بە هەموو توانایەکی خۆیەوە هەوڵمان بۆ بدات و هەڵبستێ بە ڕێک خستنی کۆبوونەوەیەک لە نێوان نوێنەرانی هەندێ لە باڵوێزخانەی ئەو وڵاتانەی کە پەنابەر وەردەگرن و نوێنەرانی ئێمە و بە ئامادەبوونی خۆیان بۆ ئەوەی بتوانین لە ڕێگای نوێنەرەکانمانەوە ڕاستەوخۆ باسی بارودۆخی میللەتی کورد بکەین و لە ئێش و ئازارەکانمان ئاگاداریان بکەینەوە.

هەر چەندە لە یەکەمین شەوی مانگرتنەکەماندا کەوتینەبەر هەڕەشەیەکی زۆری پۆلیس و کاربەدەستانی حکومەتی پاکستانی. بەلأم ئێمەش پشت ئەستور بە خۆمان بریاری مانەوەمان دا. کاتێ کە حکومەتی پاکستان بۆی دەرکەوت کە ناتوانی بە هەڕەشە و ترساندن بلأومان بکەن ئیتر وازیان لێهێناین. بۆ ڕۆژی دوایی دەستمان کرد بە دروست کردنی ژمارەیەک (کەپر) لەبەر دەرگای UNHCR . مانگرتنەکەمان بارێکی ئاسایی وەرگرت تاکو ڕۆژی ١٩٨٩/٥/٢٨.

ئەوەی شایانی باسە لەم ماوەیەدا لێژنەی ڕاگەیاندنمان ڕۆلێکی گەورەی گێڕا. لە گەیاندنی مەسەلەکە بە هەردو ئاستی (ناو خۆیی و دەرەوە). کە بەمەش دەنگی گەلەکەمان بە گشتی و ئێمەی پەنابەری کوردی عێراقی بە تایبەتی گەیاندە زۆربەی گۆڤار و ڕۆژنامە و ئاژانسەکانی دەنگوباسی جیهانی.

لە شەوی ١٩٨٩/٥/٢٩-٢٨ (کە ڕێکەوتی گەرانەوەی سەرەک وەزیرانی پاکستان بوو لە عێراق) لەلایەن کاربەدەستانی حکومەتی پاکستانیەوە پێمان ڕاگەیێنرا کە بەیانی لە کاتژمێری ٨/- لێژنەی گفتوگۆمان بچێت لەگەڵ پارێزگاری ئیسلام ئاباد کۆببێتەوە.

لە کاتی کۆبوونەوەکەدا لێژنەی ناوبراومان ئاگادار کرانەوەکە پێویستە ئەمرۆ کۆتایی بە مانگرتنەکەتان بهێنن. بەلأم ئێمەش بەڕەنگاری ئەو داواکاریە بوینەوە. بۆیە تادەهات زیاتر فشاریان دەخستە سەرمان. تا لە کاتژمێری ١١/-ی ئێوارەدا بە تەواوی ئابلۆقەیان داین ئەویش بە هێنانی ژمارەیەکی زۆری پۆلیس.

بە پێویستمان زانی (لێژنەی ڕاگەیاندنی دەرەوەمان) مانگرتنەکە بەجێ بهێڵێ و خۆی بگەیێنێتە ڕۆژنامەنووس و ئاژانسەکانی جیهانی و توانیان ژمارەیەک لە ڕۆژنامەنووس، وێنەگر، پەیامنێری ئاژانسە جیهانیەکان بگەیێنن شوێنی مانگرتنەکە، ئەم کارەش بووە هۆی هێزێکی گەورە بۆ مانگرتنەکەمان.

پاش ئەوەی بە تەواوی بۆمان دەرکەوت کە



لە رەچاوکردنی ئەو دوو خاڵەی سەرەوەدا بۆمان دەردەکەوێ کە ماندووەمان لە وڵاتێکی وەکو ئەم وڵاتەدا دووچاری دوارۆژێکی نادیار و ترسناک دەبین.

بۆ بەرگری کردن لەم مەترسیانەی رووبەرومان دەبنەوە و بۆ پێکهێنانی یەکێتیەکی تەواو لە نێوان پەنابەرەکاندا، لێژنەیەکمان هەڵبژارد کە لە (١٢) کەس پێک هات کە بریتی بوون لە (١٠) کورد و (٢) عەرەب بۆ سەرپەرشتی کاروباری پەنابەری عێراقی لە پاکستاندا.

بە پێی نەخشەیەکی رێک و پێک و داڕێژراو لە ١٩٨٩/٤/٢٣ دەست کرا بە مانگرتنێکی ئاشتیانە لەبەر دەرگای UNHCR. دوو داواکاریان خستە بەرچاوی ئەم رێکخراوەیە کە بریتی بوون لە:-

ا- ئازادکردنی بەندکراوە عێراقیەکان لە بەندیخانەی کوەیتە.

ب- مەسەلەی Resettlment مان لە وڵاتی سێهەم.

بریار درابوو لەسەر ئەوەی کە هیچ پەنابەرێک لە فەرمانەکانی لێژنەی سەرپەرشتی دەرنەچێت، بەڵام بە پێچەوانەی بریارەکانی لێژنەوە، برا عەرەبەکانمان سەر پێچی بریارەکانیان کرد و هەڵسان بە ئەنجام دانی ئەم کارانەی خوارەوە:-

١- هێنانی هەندێ دەزگای راگەیاندن بۆ مەبەستی (استغلال) کردنی مان گرتنەکەمان، بۆ بەرژەوەندی خۆیان.

٢- بڵاوکردنەوەی نووسراوەیەک کە تێیدا پەنجەی تاوانیان بۆ UNHCR درێژ کردبوو. (والەگەڵ راپۆرتەکەماندا بۆتانی رەوانە دەکەین).

٣- لە سەرەتای مانگرتنە ئاشتیانەکە مانەوە دەستیان کرد بە (هتاف) لێدان بە مەبەستی تێکدانی مانگرتنەکەمان. بەمە دەرکەوت کە ئەمە پلانێکی پێش وەختیە. هەر لەبەر ئەوە بریارمان دا جیابینەوە و بە ناوی (پەنابەری کوردەوە) درێژە بە مانگرتنەکەمان بدەین گەرچی لەلایەن پۆلیس و کاربەدەستانی پاکستانەوە بە چەندین شێوە هەڕەشەیان لێ کردین کە بڵاوە بە مانگرتنەکەمان بکەین. ئێمەش هەر سووربوین لەسەر بەردەوام بونمان. بەڵام عەرەبەکان کە ژمارەیان نزیکەی (٢٥) کەس دەبون، لە کاتژمێری (٦) ئێوارەدا بڵاوەیان کرد و گەرانەوە.

لە ئەنجامی گفتوگۆمان لەگەڵ UNHCR و حکومەتی پاکستان گەیشتینە ئەم ئەنجامانە:-

١- دەربارەی بەندکراوە عێراقیەکان لە بەندیخانەی کوەیتە، حکومەتی پاکستانی ئەرکی ئازادکردنیانی گرتە ئەستۆی خۆی.

٢- دەربارەی Resettlment مان لە وڵاتی سێهەم UNHCR بەڵێنی دا زیاتر هەوڵ بدات وتێبکۆشێ بۆ ئەم مەبەستە. بەشێوەیەکی ئاشتیانە لە کاتژمێری ٩/٣٥ شەو کۆتایمان بە مانگرتنەکەمان هێنا.

لە ١٩٨٩/٤/٢٦ (لێژنەی گفتوگۆمان) کۆبوونەوە لەگەڵ لێپرسراوانی UNHCR پێیان راگەیاندین کە وڵاتانی Resettlment وەرتان ناگرن جگە لە (سوێد، نرویج).

لەسەرەتای مانگی (٥) دا وەفدێکی هۆڵندی هات بۆ وەرگرتنی پەنابەرە ئێرانیەکان لە پاکستان. ئێمەش بە پێویستمان زانی وەکو بەڵگەیەکی زیندو خۆپیشاندانێک ئەنجام بدەین. بۆیە لە ١٩٨٩/٥/٣ خۆپیشاندانێکی ئاشتیانەی تایبەتیمان کرد بۆ ئەم مەبەستە. لێژنەکەمان لەگەڵ ئەم وەفدە و نوێنەرانی UNHCR دا کۆبوونەوە. باسی بارودۆخی نەتەوەی کورد لە عێراقدا بەگشتی و بارودۆخی پەنابەری کورد لە ئێران و پاکستاندا بە تایبەتی کرا. توانیمان سەرنجی وەفدەکە بەلای خۆماندا رابکێشین. هەروەها بەڵێنیان دا راپۆرتێ لەم بارەیەوە بۆ حکومەتەکەیان بەرز بکەنەوە. لە ئەنجامدا حکومەتەکەیان (بەپێی وەلامی UNHCR)) بریاری داوەکە وەفدێکی تایبەتی لە ئاستێکی بالاتر بنێرێت بۆ (جنێف، تورکیا، پاکستان) بۆ لێکۆڵینەوە لە بارودۆخی پەنابەرە کوردەکان.

لە ١٩٨٩/٥/١٧ کۆبوونەوەیەک لە نێوان UNHCR و ژمارەیەک لە نوێنەرانی هەندێ لە بالۆێزخانەکان کرا، لێژنەی گفتوگۆمان لە ١٩٨٩/٥/٢١ بۆ جارێکی تر لەگەڵ UNHCR دا کۆبوونەوە، لە ئەنجامدا گەیشتنە ئەم خاڵانە:-

١- هیچ وەلامێکی (ئیجابی) نەبوو بۆ وەرگرتنمان لەلایەن وڵاتانی Resettlment ەوە.

٢-دەربارەی ئەو کۆبوونەوەیەی UNHCR لەگەڵ نوێنەرانی بالۆێزخانەکانی (سوێد، هۆلەندا، هیند، سعودیە، کەنەدا، ئەمریکا، فەرانسا، نوێنەری حکومەتی پاکستان وژمارەیەکی تر لە نوێنەرانی هەندێ لە وڵاتانی رۆژهەلاتی ناوەراست).

کۆبوونەوەکە کۆبوونەوەیەکی ئاسایی بوو تێیدا باسی گیروگرفتی پەنابەری (ئەفغانی، ئێرانی و عێراقی) کرابوو. ئەم وڵاتانەش بە زۆری بریتی بوون لەوانەی کە لە دامەزراندنی UNHCR دا بەشداریان کردوە، پشتگیری دارایی دەکەن.

بەمە بۆمان روون بۆوە کە پێویستمان بە جۆلانەوەیەکی بەتێن‌تر هەیە بۆ ئەوەی دەنگە کزەکەمان بگەیێنێتە جیهانی پێشکەوتوو. بۆیە بۆ جاری سێهەم بە گشتی دەنگ بریارمان دایەوە کە دەست بە مانگرتنێکی ئاشتیانەی درێژخایان بکەین.

((ئامانجی مانگرتنەکەمان))

١- گەیاندنی دەنگی مرۆڤی کوردی لێقەوماو بە گشت وڵاتانی جیهان و پەردە هەڵدانەوە لەسەر رەفتارە فاشیەکانی رژێمی بەعس لە عێراقدا.

٢- بانگەوازێکی گشتی ئێمەی پەنابەری کوردی عێراقی لە پاکستان بۆ UNHCR و گشت ئەو وڵاتانەی پەنابەر وەردەگرن. و بۆ هەموو رێکخراوە مرۆڤایەتیەکانی جیهانی بۆ ئەوەی دەستی یارمەتیمان بۆ درێژ بکەن و لەم ژیانە ئالوزە رزگارمان بکەن.

٣- سووربوون لەسەر ئازادکردنی بەندکراوە عێراقیەکان لە بەندیخانەی کوەیتە.

«شێوەی رێکخستنی مانگرتنەکەمان»

لێژنەی سەرپەرشتی گشتی لە ١٠ کەس پێک هاتبوو. لەم لێژنەیەشەوە چەند لێژنەیەکی تری ناوەندی پێک هاتبوو، کە بریتی بوون لە:

ا- لێژنەی گفتوگۆ: لە چوار ئەندامی لێژنەی سەرپەرشتی پێک هاتبوو و ئەرکی

www.arsivalkurdi.org



چالاکیەکانی پەنابەری کوردی عێراقی لە پاکستان

لەگەڵ نزیک بوونەوەی یادی تێپەڕبوونی ساڵێک بەسەر کارەساتە دڵتەزێنەکەی (هەڵەبجەدا)، بە ئەرکی سەرشانی خۆمانمان زانی کەوا ئێمەی ئاوارەی کورد پێویستە یادی ئەم کارەساتە بکەینەوە. بۆیە سەرەتا چەند جارێک کۆبوونەوە بۆ ئەوەی کە بەرنامەیەکی ڕێک و پێک ئەنجام بدەین. بەم بۆنەیەوە توانیمان لە ڕێکەوتی ١٩٨٩/٣/١٦ لە نزیک (Y.M.C.A).

لە ئیسلام ئاباد یادی (ساڵڕۆژی)ماتەمینی (هەڵەبجە) بکەینەوە... بەرنامەکانمان بەم شێوەیەی خوارەوە بوو:-

١- هەر (یەکەمان) پارچەیەکی ڕەشی لە یەخەی خۆی دابوو نووسرابوو (HALABJA).

٢- پیشاندانی هەندێ پۆستەری هەڵەبجە.

٣- دەقەیەک وەستان، بۆ گیانی پاکی شەهیدانی کوردستان بە گشتی و شەهیدانی کارەساتی کیمیایی هەڵەبجە بە تایبەتی.

٤- خوێندنەوەی وتارێک بەم بۆنەیەوە.

٥- خوێندنەوەی چەند پارچە هەڵبەستێک.

٦- کۆتایی پێهێنانی ماتەمینیەکە بە سرودی ئەی ڕەقیب.

لە ئەنجامی ئەو کۆڕ و کۆبوونەوانەی پێشوماندا، لێژنەیەکی کاتیمان هەڵبژارد کە پێک هاتبوون لە (٣) ئەندام، دوو ئەندامی کورد و ئەندامێکی عەرەب.

لە ١٩٨٩/٣/٢٢ دا لێژنەی ناوبراو لەگەڵ UNHCR کۆبوونەوە و ئەم داواکارییانەیان خستە ڕوو:-

١- پاراستنی باری ئاسایشی پەنابەرە عێراقیەکان لە پاکستان.

٢- ئازادکردنی بەندکراوە عێراقیەکان لە بەندیخانەی کوەیتە. (کوەیتە شارێکە دەکەوێتە بلوجستان. نزیک سنووری ئێرانە)

٣- مەسەلەی Resettlement مان لە ولاتی سێهەم.

٤- چاکردنی باری ئابووری پەنابەرە عێراقیەکان لە پاکستاندا.

بەپێی نامەیەکی گەیشتوو لەلایەن بەندکراوەکانی کوەیتەوە، گوایە، (٣٥) بەندکراوی عێراقی لە بەندیخانەی کوەیتەوە گوێزراونەتەوە بۆ جێگایەکی نادیار.

پاش تێپەڕبوونی چەند ڕۆژێک بەپێی نامەیەکی گەیشتوو لە بەندیخانەی شاری کەراچیەوە نووسرابوو ئێمە بریتین لەو (٣٥) بەندکراوەی کە لە بەندیخانەی کوەیتەوە بە کە لەپچەکراوی گوێزراوینەتەوە بۆ کەراچی بە نیازی بە زوو تەسلیم کردنەوەمان بە ڕژێمی عێراق. ئێستا ژیانمان زوو لە مەترسیدایە.

بە گەیشتنی ئەم نامەیە لێژنەکەمان بۆ دڵنیابوون لە ژیانی ئەم بەندکراوانە لەگەڵ نوێنەرانی UNHCR دا کۆبوونەوە. دانیان بەوەدا نا کە ڕێکەوتنێکی نهێنی بوە لە نێوان ڕژێمی عێراق و حکومەتی پاکستان. هەروەها دڵنیایان کردین بە هەوڵدانی خۆیان توانیویانە بیانگەڕێننەوە بۆ بەندیخانەی کوەیتە و لەو مەترسیە ڕزگاریان کردون.

ئەم ڕووداوە وای لێکردین بگەینە ئەو بڕوایەی کە نەک تەنها ژیانی ئەو بەندکراوا نە لەمەترسیدابوو!، بەڵکو ئەوە هەنگاوێکی سەرەتاییە بۆ چەندەها هەنگاوی تری ترسناک. واتە ژیانی هەر پەنابەرێکی عێراقی بە گشتی و پەنابەری کورد بە تایبەتی لە مەتر سیدایە.

ئەمە لە لایەکەوە، لە لایەکی ترەوە هەنگاوەکانی UNHCR ئەوەندە خاوە بۆ مەبەستی (Resettlment مان لە ولاتی سێیەم لەوانەیە چەندەها ساڵ بخایەنێت. ئەوەی شایانی باسە تاکو ئێستا تەنها دوو ولاتە پەنابەری عێراقی وەرگرتوە کە بریتین لە (سوێد، نەرویج)

لە ساڵی ڕابردوودا بە هەردوولایان نزیکەی (٥٠) کەسیان وەرگرت، ژمارەی ئێمەش بەپێی زانیاری UNHCR گەیشتۆتە (٥٠٠) کەس لە ئیسلام ئاباد و ڕاوڵپندی جگە لە کوەیتە.

کەواتە ئەگەر پڕۆگرامی Resettlment مان لە ولاتی سێیەم بەم شێوەیە بڕوا ئەوا سەفەر پێ کردنی ئەم ژمارەیە (١٠٠) ساڵ دەخایەنێت ئەمە جگە لەو ژمارەیەی کە بەردەوام لە ڕێگای ئێرانەوە دێن.

نامەی کوردە ئاوارەکانی پاکستان

** دەنگمان بگەیەنن بە ڕێکخراوە مرۆڤایەتییەکانی جیهانی.*
** دەنگمان بگەیەنن بە هەموو لایەن و ڕێکخراوە کوردییەکان.*

لە ژمارەی پێشوودا بە ناونیشانی «لە پاکستان چ باسە» بە وتارێکی کورت باسی ژیانی ئەو کوردانە کرابوو کە ئێستا ئاوارەی وڵاتی پاکستانن و مەترسی ئەوەیان هەیە کە پۆلیسی پاکستانی بە زۆر ڕەوانەیان بکاتەوە بۆ ژێر دەستی ڕژێمی فاشیستی عێراق.

دوای ئەوەی توانیمان بەنامە پەیوەندییان پێوەبکەین و داوای زانیاری زیاترمان لێکردن ئەم نامەیەیان بۆ ناردین..... کە لێرەدا بە تەواوی بڵاوی دەکەینەوە، بەو مەبەستەی خوێنەرانی ئەم گۆڤارە، بە تایبەتی ئەو کوردانەی لە وڵاتانی ڕۆژئاوا دەژین ئاگاداری ژیان و گوزەرانی ئەو هاوخوێن و هاو ڕەگەزانەیان بن، هیوادارین کۆمەڵە و ڕێکخراوە کوردییەکانیش لە دەرەوەی وڵات هەرێەکە لەلای خۆیەوە کارێک بکا بۆ ڕزگارکردنیان لەو دەردەسەرییە.

شایانی باسە کە لەگەڵ گەیشتنی نامەکە، فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکان بەپێی توانای خۆی دەستی کردوە بە پەیوەندی کردن بە دەزگا ڕەسمی و ڕێکخراوە مرۆڤایەتییەکانی سوێد.

بۆ دەستەی نووسەرانی گۆڤاری بەرەنگ

خۆشحاڵین بەوەی کە سەڵامەتی خۆمان و هەموو ئەو پەنابەرە کوردانەتان پێ ڕابگەینین کە لە پاکستاندا دەژین. هیوای سەرکەوتنی هەمیشەیی بۆ بەرێزتان و تەمەن درێژیش بۆ گۆڤارەکەتان دەخوازین.

جێگای فەخروشانازیە کە ئێوە لە ڕوانگەی دڵسۆزیتانەوە لە ژیانی ئێمەی ئاوارە دەپرسنەوە و هەستی کوردانەی خۆتان دەردەبڕن بەرامبەرمان کە مایەی سوپاسێکی بێ پایانمانە. ئەمەش ئەو زانیاری و داواکارییانەیە کە داواتان کردوە:-

١- ژمارەی پەنابەرە کوردە عێراقییەکان لە پاکستان:

لە ئیسلام ئاباد ١٤ خێزان، ٨٣ ڕەبەن، هەمووی ١٥ کەس.

لە ڕاولپەندی ٦٤ خێزان، ١٦ ڕەبەن، هەمووی ٣٢١.

لە پیشاور ٤ خێزان، ژمارەیان ٣٧ کەس.

لە کوێتە ٣٠٠ کەس «خێزان و ڕەبەن».

لە گلگت یەک کەس کە لە زیندانداید.

٢- دەربارەی ژمارەی پەنابەری کوردی تورکیا و ئێران. زانیارییەکی ئەوتۆمان بەدەستەوە نییە. ئەوەی کە ئێمە ئاگادارین لێی تەنها یەک پەنابەری کوردی ئێرانی هەیە لە (ئسلام ئاباد) دەژێت. و پەنابەرێکی کوردی تورکیا لە کەراچی دەژێ.

٣- دەربارەی باری ئابووریان: ئەو یارمەتییەی کە لە (UNHCR) وەری‌دەگرین بەم شێوەیەیە:

یەک کەس ١٠٠٠ ڕوپیە
ژن و مێرد ١٥٢٠ ڕوپیە
ژن و مێرد و دوو منداڵ ٢٢٢٠ ڕوپیە
لە منداڵی سێهەمەوە تاکو منداڵی نۆهەم ١٧٠ ڕوپیە
منداڵی نۆهەم ٥٠ ڕوپیە
خێزانی (٦) کەسی ٢٥٦٠ ڕوپیە
خێزانی (٩) کەسی ٢٨٥٠ ڕوپیە

* هەر منداڵی (٣٥٠) ڕوپیە وەردەگرێت. لە دوای دووەم منداڵەوە بۆ هەر منداڵێکی تر (١٧٠) ڕوپیە زیاد دەکات تاکو منداڵی نۆهەم. لە منداڵی (٨) مەوە (٥٠) ڕوپیە زیاد دەکات. لە (٩) وە موچەی دەبڕێت.

تێبینی:-

هەر دۆلارێک = بە نزیکەی ٢٠ ڕوپیەی پاکستانییە.

٤- دەربارەی داواکاریەکانمان.....

ئێمە لێرەدا حەزدەکەین ژمارەیەک داواکاریتان ئاراستە بکەین، بەو هیوایەین کە بەپێی توانەتان یارمەتیمان بدەن و بۆ مان ئەنجام بدەن.

ا- بڵاوکردنەوەی بانگەوازێک دەربارەی ژیانی ئێمەی ئاوارە لە پاکستاندا بۆ وڵاتانی Resettlement و هەموو ڕێکخراوە مرۆڤایەتیەکانی جیهان، کە بە هۆی گۆڤارەکەتانەوە ئاگاداریان بکەنەوە و بارودۆخی ئێمە ڕوون بکەنەوە تا حیسابی ئەوەمان بۆ نەکەن کە وڵاتی یەکەمی لجوئمان کە (ئێران)ە بەجێهێشتوە. چونکە لە ئێران (UNHCR) هیچ دەورێکی نەبو.

هەروەها تادەتوانن پارێزگاری لە ڕاستی مەسەلەکەمان بکەن کە ئێمە (پەنابەری سیاسین) نەک پەنابەری ترا

ب- ئەگەر لە تواناتانا هەیە وەکو یارمەتیەکی ئێوە بۆ ئێمە مانگانە پێویستمان بە ژمارەیەک لە گۆڤارەکەتان هەیە. هەروەها ئەگەر لاتان دەست دەکەوێت پێویستمان بە چەند سەرچاوەیەکی میژوویی میللەتی کورد هەیە بە تایبەتی بە زمانی ئینگلیزی بێت.

ج- گەیاندنی دەنگی ئێمە لە ڕێگای خۆتانەوە بە هەموو لایەن و ڕێکخراوە کوردییەکانی تر لە دەرەوەی سوێد.

هەر سەرکەوتوین

لێژنەی سەرپەرشتی کاروباری پەنابەری کوردی عێراق لە پاکستان

www.arsivakurdi.org

با!! با!! کوردی زمانه!!

حەسەنی قازی

ماوەیەک لەمەوبەر شاعیرێکی فارس سەری لە سوێدێدا و لە کۆرێکی هونەرێدا چەند پارچەیەک لە هۆنراوەکانی خۆی بۆ ئامادەبووان خوێندەوە. بۆ شەوێ ناسیاوێکی من کە خانەخۆی ئەو هونەرمەندە بوو بە حورمەتی کابرای میوان چەند کەسێکی بانگهێشتنی ماڵە خۆی کرد و لە نێو میوانان دا یەکیان نووسەر و تیاتورکارێکی ناسراوی ئێرانی بووکە هێشتا خەڵک نەحەسابوونەوە مەجلیسی کردە ئی خۆی و سەری قسەی نەدەدا بە کەسی دی. کابرا زۆری گوت و لە خۆرا نەیان گوتووە ئەوەی زۆربێ چاکیش دەڵێ و خراپیش، چونکوو لە پڕ بێ ئەوەی باسێکی تایبەتی لەمەڕ زمان لە گۆڕێ دابێ کابرا بە رووەڵماڵاوییەکی جەختەوە هەڵێدایە، درۆیە کە دەڵێن کوردی زمانە. ئەمن کەتا ئەو کاتە بەشداری دەمەتەقەکە نەبووم خۆم پێڕانەگیرا و دەستبەجێ بە دەمیدا داچوومەوە و پێم گوت: فلانەکەس بڕیا ئێستا کتێبێکی کوردیم پێبایە و لەبەر دەمتم دانابا، ئەو دەمی دەمانزانی چەندەی لێ تێدەگەی و ئەوانەی لە مەجلیس دان راست و ناراستیان بۆ دەردەکەوت. کابرا زانی چاکی نەگوتووە و هەر خەریک بوو لە باسەکە خۆی ببوێرێ بەڵام ئەوجار من مەجالم نەدەدا وبەبەڵگەی حاشا لێنەکراو تێم دەگەیاند کە ئەوەی ئەودەیڵێ نیشانەی نەزانی و گێژ و وڕبوون بە ئیدێۆلوژی «ئێرانی مەزنە» کە چ تەوفیرێکی ئەوتۆی لەگەڵ «ئیسلامی مەزن»دا نییە.

بە خۆشیەوە چەند حەوتوو لەمەوبەر لە گۆڤاری «آدینه» ژمارەی ۳۳دا کە لە تاران بە زمانی فارسی دەردەچێ، وتوێژێکی دوور و درێژم خوێندەوە کە لەگەڵ ئەحمەدی شاملوو، یەک لە هەرە شاعیر و ئەدیبە مەزن و بەرچاوەکانی ئەو سەردەمەی ئێران کرابوو. شاملوو زیادتر لە سی ساڵە کە لەگەڵ کۆکردنەوەی فۆلکلۆر، مەتڵۆکە، داب و شوێن، قسەی نەستەق و پەندی پێشینیانی فارسی خەریکە و تاکوو ئێستا پێنج بەرگی لەو کارە گەورەیەی خۆی بە نێوی «کتاب کوچه» - کتێبی کووچە- بڵاو کردۆتەوە. وا چاوەڕوان دەکرێ ئەو کتێبە دەیان بەرگی دیکەشی تێ بێ. نووسەری گۆڤاری آدینه لەو وتوێژەی خۆی دا لە شاملوو دەپرسێ:

ئایا لە داهاتوو دا دەکرێ جۆرێک بەرنامە دابڕێژرێ کە «کتاب کوچه» - کتێبی کووچە- تەواوی گۆیش «لەهجه» کانی



شاملوو

ئێران وەبەر بگرێ؟

شاملوو لە ولاّم دا دەڵێ:

- هەڵبەت لەم بابەتەوە ناکرێ خۆمان بە وشەی «گویش»- لەهجە-وە ببەستێنەوە. مانا و دیوی دەرەوەی ئەم وشەیە لەسەر و بەندی حوکمی رابردوو ڕا بە شێوەیەکی خراپ شێواوە، چونکوو «کاریەدەستانی دەوڵەت» لە خۆرا زراویان چووبوو کە ئەگەر کوردی یان تورکی و تەنانەت مازەندەری و گیلەکی بە زمان دابنێن لەوانەیە بۆ سەربەخۆیی خوازی بیانوو بدەنە دەست کورد و تورک و مازەندەرانی گیلەکی یەکان.

ئەمن لێرەدا پێوەنیم زیادتر لە بەڕەی زانستی خۆم پێ ڕاکێشم، بەڵاّم گوێش مانای لەحن و ئاهەنگە. واتە ئەگەر کەسێک «میخورم» بە «مخورم» گۆ بکا دەتوانین (لانی کەم بۆ هاسانتر کردنەوە) بڵێین فلانکەس گوێشی خوراسانیانەی هەیە، بەڵاّم ئەگەر لە جیاتی «بیا» بڵێ «بۆرۆ»یان لە جیاتی «پێدەرەم» بڵێ «مەپەر» ئیتر ئەمن پێم وانییە ئەمە گوێش بێ، لێرەدا هەم قاموس جوێیە، هەم ڕێزمان و داڕشتنی زمان بە شێوەی بنچینەیی ئالۆگۆڕی بەسەردا هاتووە و دەکرێ وەک زمانێکی دیکە چاولێ بکرێ، نەک گوێش، چونکوو ئەگەر وای بۆ نەچین دەکرێ ئالمانیش بە یەکێک لە گوێشە ئێرانیەکان دابنێین و بۆ یەک لاکردنەوەی کێشەکە ڕوولە دەرکەی دیوانی داوەری لاهە بکەین!! دەنا ئالمانیەکانیش بە ڕستەی «نام دختر من مریم است» (واتە: نێوی کچی من مریم- نووسەر) دەڵێن:- MEIN TOCHTERS NAME IST MARIAM کە لە ڕستەکەدا تاک تاکی وشە فارسی و ئالمانیەکان جیاوازییان لەگەڵ یەک هەر لە لەحن و ئاهەنگ دایە. کەوابوو، ئەوە مەسئەلەیەکە کە دەبێ کۆڕی زانایانی زمانناس لێی بکۆڵێتەوە و ئەوەی لەو بابەتەوە بیرورای من چییە لێرەدا گرینگ نییە.

لە ولاّمی پرسیارەکەتان‌دا دەتوانم بڵێم کە بەڵێ دەکرێ لە پێشدا فەرهەنگی گەلی شوێنەکان و گوێشەکان یان زمانەکانی دیکە بە شێوەی «کتاب کوچه»- ئەگەر پێوانەیەکی لە بار بێ- تەنزیم و کۆبکرێنەوە (وەک ئێستا کە خێزانی من هەر بەو شێوەیە خەریکی کۆکردنەوەی فەرهەنگی جەماوەریی ئەرمەنیەکانی ئێرانە) و پاشان هەموو ئەوانە لە «کتاب کوچه» زیاد بکرێن و.....»

وەک دەردەکەوێ زانایەکی وەک شاملوو ئاوا بە ساکاری بەڵاّم بە بەڵگە هێنانەوەی پتەو ولاّمی شۆڤێنیستە فارسەکان دەداتەوە. ئەمن بڕیارم داوە فۆتۆکۆپی ئەو وتوێژەی شاملوو بۆ کابرای نووسەری کە پێشتر باسم کرد بنێرم. بێگومان ئەگەر گیرۆدەی زانست بێ ڕۆژێک لەو بۆچوونە ناهەوەی خۆی پاشگەز دەبێتەوە. هێمن دەڵێ: مەپرینگێنوە لە ئاگر و ئاسن، تێدەگەی چۆن بە گەلت ناناسن.

۱۹۸۹-۶-۷

www.arsivakurd.org

مرۆڤ، تا چ ئەندازەیەک کورد مافی مرۆڤی هەیە. لەو رێگەوە بتوانین رای گشتی جیهان بەلای خۆماندا راکێشین. پێمان وایە لە ماوەی سالْ و نیوی رابردوودا کاری باشمان کردووە لەو بوارەدا بۆ ئەوەی کە مەسەلەی کورد بە دنیا بناسێنین. پێشتر ئێمە لە خەباتی دیبلۆماسی خۆماندا، هەندێ سنووردمان دانابوو، لەو سنوورانە تێپەڕ نەدەبووین. بۆ دۆست و دوژمن سنووردکمان دانابوو. لە چوارچێوەیەکی دیاریکراودا ئیشمان دەکرد. ئێستا ئێمە لە سەرتاسەری دنیادا ئیش دەکەین جگە لە ئیسرائیل، واتە جگە لەوەی کە ئێمە ناچین بۆ ئیسرائیل و ئامادە نابین لەگەلْ ئیسرائیل هاوکاری بکەین. لە سەرتاسەری دنیادا لە رۆژهەلاتەوە بۆ رۆژئاوا لە باکوورەوە بۆ باشوور، لە هەر جێگایەک بۆ ئێمە هەلێک برەخسێ و بتوانین ئیشی تیابکەین بۆ روونکردنەوەی مەسەلەی خۆمان، بۆ دەرخستنی عەدالەتی خواستەکانی میللەتەکەمان، بۆ ڕیسواکردنی دوژمنەکەمان، دەچین. واتا ئێمە خەباتی چەکداری، خەباتی سیاسی، خەباتی ئیعلامی و خەباتی دیبلۆماسی وەک چوار ئەلْقە پێکەوە گرێدەدەین بۆ ئەوەی کە لە عێراقدا وەزعێکی وا بێتە پێشەوە. وەزعێکی داخلی، وەزعێکی ئیقلیمی لە رۆژهەلاتی ناوەڕاست، وەزعێکی جیهانی لە دنیا بێتە پێشەوە کە حکومەتی عێراق ناچار بکا بۆ ئەوەی کە کۆتایی بە چەوساندنەوەی میللەتی کورد بهێنێ و ناچار بێ چارەسەرێکی عادیلانە و ئاشتیخوازانە بۆ مەسەلەی کورد لە عێراقدا بدۆزێتەوە.

بەڕێنگ: *باشە، ئێستا لە کوردستانی عێراقدا، ڕایەکی وا دروست بووە، وەک مەسعود بارزانی لە کۆڕەکەی خۆیدا لەم ڕۆژانەدا لێرە (لە ستۆکهۆلْم) دەیگوت کە کێشەی کورد، لە کوردستانی عێراقدا هەرگیز بە چەک چارەسەر ناکرێ، دەبێ ڕێی ئاشتییانە پەیدا بکەین. ئەگەر حکومەتی عێراق ئێستا ئێوە بانگ بکا بۆ گفتوگۆکردن ئایا هەلْوێستی بزوتنەوەی کوردستانی عێراق چۆن دەبێ؟ ئەگەر ڕازی بن، بە چ مەرجێک دەڕۆن؟*

نەوشیروان: ئێمە هیچ شتێ ڕەت ناکەینەوە، پێمان وایە گفتوگۆکردنیش خۆی لە خۆیدا جۆرێکە لە خەباتی سیاسی. کۆنیش ڕای یەکێتی نیشتمانی وابووە پێمان وایە ئەگەر چەندین سالْیش شەر لەگەلْ حکومەتی عێراقی بکەین، کۆتاییەکەی هەر ئەوەیە کە دەبێ بە گفتوگۆ، بە ڕێی سیاسی مەسەلەکە چارەسەر بکرێ.

ئەگەر عێراق بۆ گفتوگۆکردن لەگەلْ بەرەی کوردستانی بێتە پێشەوە، دیارە لە پێش هەموو شتێکا مەرجی بەرەی کوردستانی ئەوەیە کوردستان وەک خۆی لێبێتەوە ئەو ڕاگواستنەوە و کوشتن و بڕینەی کە ئێستا لە کوردستانی عێراقە نەمێنێ، ڕێگا بە جوتیاری کورد بدەن بگەڕێتەوە بۆ سەر خاکی باوباپیرانی خۆی و لە کوردستاندا هەلْ و مەرجێکی وا بێتە پێشەوە کە کورد خۆی حوکمی خۆی بکا، واتە حوکمی زاتی

> ڕەنگە یەکێ لە هەلْەکانی شۆڕشی کورد ئەوە بووبێ کە تائێستا لە مالْی خۆماندا شەرمانکردووە. واتا شەرمان نەخستۆتە مالْی دوژمنەوە.

دەستکاری بکرێ، کورد مافی بەشداربوونی هەبێ لە حکومەتی مەرکەزیدا بە ئەندازەی خۆی، واتە لە بریاری سیاسی حکومەتی مەرکەزی. ئازادی و دیموکراتی بۆ حیزب و ڕێکخراوە دیموکراتیەکان، خواستەکانی خۆیەتی کە بە شەر داوای کردوە، بە ئاشتیش داوای دەکا و چۆنی بۆ بکرێ جێبەجێی بکا؟ ئەوە بەستراوە بە هەلْ و مەرجی ئەو زەمانەوە.

بەڕێنگ: *ئایا لە ڕێی بەڕێنگەوە چ وتەیەکتان هەیە ئاراستەی کوردی سوێد و ئەورووپا بکەی و چ داخوازییەکیشتان هەیە لە فیدراسیۆن؟*

نەوشیروان: تکای من ئەوەیە کە کوردەکانی سوێد لەناو خۆیاندا بتوانن هاوکاری بکەن بۆ پشتیوانی کردن لە جوڵانەوەی میللەتەکەیان، بە تایبەتی لەم کاتەدا کە لە کوردستانی عێراقدا بە قۆناخێکی زۆر دژواردا تێپەڕ دەبێ و لە بەردەم مەترسییەکی گەورەدایە. لە بەردەم مەترسی ڕاگواستن و لە دەست دانی خاک و ئاوی کوردستان.

بێگومان کوردیش وەک هەموو میللەتی دنیا جیاوازی بیروباوەری سیاسی تیایە، جیاوازی جۆراوجۆری تیایە ئەوەی کە ئومێدی ئێمەیە ئەوەیە کە کورد بتوانن چوارچێوەیەکی گشتی بۆ کاری هاوبەش لە دەرەوە بدۆزنەوە و قازانج بگەیەنن بە جوڵانەوەی میللەتەکەی خۆیان و پشتیوانی لێبکەن، بێن بە قورساییەک بۆ جوڵانەوەی کورد لە خەباتی خۆیدا لە بەرامبەر دوژمنەکان و ناحەزەکانیدا.

ئومێدم وایە فیدراسیۆنیش هەر هەمان کار بکا.

بەڕێنگ: *دوا پرسیار، ئایا بزوتنەوەی ئازادیخوازی کورد دەتوانێ بەرەیەکی یەکگرتوو یان ڕێکخراوێکی فراوان وەک ڕێکخراوی ئازادیخوازی فەلەستین دابەزرێنێ بۆ ئەوەی کورد یەک دەنگ بن لە کوردستان و لە دەرەوەی کوردستان.*

نەوشیروان: ئەوە وەک تیوریی کارێکی باشە، بەلاْم ڕەنگە لە ڕووی عەمەلیەوە زۆر تەگەرەی بێتە پێشەوە. ئێمە سەبارەت بە کوردستانی عێراق ئەو بەرە کوردستانییە جێگای ئومێدە کە ببێ بە ڕێکخراوێکی لەو بابەتە بە یەک دەنگ دەنگمان بگەیەنین بە دنیا. ئەوە بۆ کوردستانی عێراق. ئومێدمان وایە لە پاشە ڕۆژدا کوردیش بتوانێ شتێکی وا دروست بکا، بەلاْم پێمان وایە حاڵی حازر قابیلی جێبەجێ کردن نییە.

ئامادەکردنی
س.ڕیڤینگ
ستۆکهۆلْم
١٩٨٩/٦/٢٧

www.arsivakurdi.org

و جگە لەوەش کە چەکی کیمیایی و بەکتریۆلۆجیشی پەیدا کردوە. لە شەڕێکی وادا ئینسان هەرچی‌یەک بکا ناتوانێ لە بەرامبەر چەکی کیمیایی، لە بەرامبەر چەکی بەکتریۆلۆجی و لە بەرامبەر ئەو ژمارە زۆرەی عەسکەر و دەبابە و تۆپ و تەیارەدا رابوەستێ، واتە مەسەلەکە ئەوەنیە کە ئێمە خۆمان ئامادە نەکردبوو، یان شەرمان نەکردبوو. ئەگینا شەری زۆر بوو لە سەرتاسەری کوردستان، هیچ جێگایەک بێ شەر و بێ مقاومەمە چۆڵ نەکراوە و شەهیدی زۆریش دراوە. ساڵی ١٩٨٨ ئەوەی لە کوردی عێراقی کۆژراوە بە پێشمەرگە و مەدەنی لە ناوچەی هەڵەبجە و سلێمانی و کەرکوک و هەولێر و بادینان زەنگە ژمارەیان بگاتە ٢٠٠٠٠/... بیست هەزار شەهید. ئەوە خۆی لە خۆیدا بەڵگەی ئەوەیە کە مقاومەمە کراوە.

بەڕێنگ: *باشە ئێستا بێینە سەر باسێکی تر. پێش ماوەیەک پرۆفیسۆر لازارێف لە چاوپێکەوتنێکدا باسی کوردستانی عێراق و کوردستانی ئێرانی کردبوو. گوتبووی لە شەری عێراق و ئێراندا کورد هەڵێکی باشی لە دەست خۆی‌دا، دەبوایە لەو کاتەدا کوردستانی سەربەخۆیان دابمەزراندایە. ئایا رای ئێوە چۆنە؟*

نەوشیروان: نازانم، لازارێف وای گوتووە؟

بەڕێنگ: *بەڵێ.*

نەوشیروان: لەبەر ئەوەی خۆم بەشدار بوو بووم لە جوڵانەوەی کوردا، پێم وایە ئیمکانی ئەوە نەبووە.

بەڕێنگ: *ئێوە وەک بەرەی کوردستانی و وەک یەکێتی نیشتمانی کوردستان بۆ باری ئێستای کوردستانی عێراق چ ڕێگایەکی نوێ دەگرنە بەر.*

نەوشیروان: بۆ هەڵ و مەرجی ئێستای ئێمە، بە هەرچی شێوەیەک خەباتمان پێبکرێ و لە هەر مەیدانێکدا خەباتمان پێبکرێ، درێژە بە خەباتی خۆمان دەدەین. ئەوەی کە لەبەر چاومان گرتووە ڕەنگە ئێمە بە شێوەی سێ ساڵ لەمەوپێش نەتوانین خەبات بکەین، مەبەستم خەباتی چەکدارییە بەوەی کە ئێمە دەیان هەزار کیلۆمێتری ئازادکراومان هەبێ و پێشمەرگە تیپیان هەبێ و مەڵبەندیان هەبێ و مەسئولەکانیان هەموو ناسراوین. ڕەنگە ئێمە بە شێوەی وەک جاران نەتوانین درێژە بە تێکۆشان بدەین. ئەوەش لە ڕاستیدا هۆیەکەی دەگەڕێتەوە بۆ ئەوەی کە کوردستان چۆڵکراوە و پێشمەرگە و خەڵک وەک ماسی و ئاو وان، شەری پێشمەرگایەتی، واتە پارتیزانی، لەناو میللەتا دەکرێ، لە شوێنی چۆڵەوانی ناکرێ، جگە لەوەی کە توانای عێراق ئێستا زۆر زیادی کردوە. چەکی کیمیایی هەیە و بەبێ گوێدانە هیچ یاسایەک بە کاری دەهێنێ دژی خەڵکی مەدەنی.

بەڵام لەگەڵ ئەوشدا، ئێمە چوار جۆرە خەباتمان لەبەرچاو گرتووە کە پێمان وایە پێکەوە کۆشکی سەرکەوتن مسۆگەر دەکا. ڕەنگە لەمەوپێش، لە بیست و حەوت ساڵی ڕابردوودا جوڵانەوەی کورد لە کوردستانی عێراقدا تەنیا تەرکیزی کردبووە سەر خەباتی چەکداری، ئەوەش شێوەی سەرەکی و محوەری خەباتی ئێمە بوو، شێوەکانی تر هەموو لە خزمەتی ئەودا بوون، بەڵام ئێستا ئێمە هەوڵ دەدەین لە نێوان ئەو چوار جۆرەی خەبات دا پارسەنگێک ڕاگرین، بۆ ئەوەی وەک یەک بایەخدارین، ڕەنگە لە هەندێ قۆناخدا یەکێکیان گرنگی لە وانی‌تر زیاتر بێ، بەڵام پێمان وایە کە هەر چواری پێویستە و سەرەکین و دەبێ هەر چواریان محوەری خەباتی ئێمەبن. یەکێک لەو چوارە، وەک جاران خەباتی چەکدارییە. بەڵام وەک گوتمان خەباتی چەکداری بەشێوەی زەمانی کۆن ناتوانین درێژەی پێ بدەین. لێرە بە دواوە، ئێمە جگە لەوەی مەفرەزەی بچوک بچوکمان ماوە لە ناوچە شاخاوییەکانی کوردستان و ناوچە دەشتاییەکان کە تا ئێستاش درێژە بە خەباتی خۆیان دەدەن و تاقیکردنەوەی سااڵ و مانگی ڕابردوو و ئاشکرای کرد کە توانا هەیە لە ناوچەی چۆڵەوانیشدا پێشمەرگە بمێنێتەوە و ئیدارە بکا و بژی.

لەمەولا ئێمە هەوڵ دەدەین کە خەباتی خۆمان بخەینە ناو شارەکانەوە، چونکە دێهات نەماوە و کوردستان هەمووی بووە بە شار. واتە لێرە بە دواوە خەباتی چەکداری لە شارەکاندا دەکەین مەرجیش نییە لە شارەکانی کوردستانی عێراقدا بکرێ. ڕەنگە یەکێ لە هەڵەکانی شۆڕشی کورد ئەوە بووبێ کە تائێستا لە ماڵی خۆماندا شەرمانکردووە. واتا شەرمان نەخستۆتە ماڵی دوژمنەوە. هەر لە ماڵی خۆماندا شەرمان کردووە و ماڵی خۆمان وێرانکردووە، لەمەودوا ئەگەر شەرمانکرد لە ماڵی دوژمندا دەیکەین بۆ ئەوەی ماڵی دوژمن وێران بێ. بۆ ئەوەش شانەی چەکدارمان دروستکردووە، هێشتا نەکەوتونەتە سەرئێش. بەڵام ڕێکخستنەوەی چەکدارمان لەسەر ئەساسی دروستکردنی شانەی چەکدارە لەناو شارەکانی عێراقدا بۆ درێژەپێدان بە خەباتی چەکداری.

جۆرێکی تر لە خەباتی ئێمە بریتی‌یە لە خەباتی سیاسی، کە بایەخدانە بە ڕێکخستنی ناو شارەکان. ئێمە توانیومانە لە هەموو جێگایەکی عێراقدا کە کوردی تێدابێ ڕێکخستنی سیاسی تیا دروست بکەین و بۆ شەری سیاسی هێزەکانی ئێمە ئامادەن. بەڵکو ڕۆژێ لە ڕۆژان لە عێراقدا هەڵ و مەرجێکی وا بێتەپێشەوە خەباتی سیاسی ببێ بە شێوەی سەرەکی تێکۆشان بۆ ململانێ لەگەڵ دەوڵەت.هەڵ و مەرجێکی وا بێتە پێشەوە بتوانین کە ئێستفادە لە ئازادی بکەین، هێزێکی سیاسی زۆر باشمان هەیە. ئێستا حاڵی حازر یەکێک لەو هۆیانەی کە خەڵک تووشی ورەبەردان و ڕووخان نەبووە ئەوەیە کە ڕێکخستنی سیاسی توانیویەتی کاریگەریەکی زۆر باشی هەبێ لەسەر خەڵک لە بەرامبەر هێرشی ئیعلامی و شەری سایکۆلۆجی دوژمن.

جۆری سێیەمی خەباتی ئێمە بریتی‌یە لە خەباتی ئیعلامی. کە لە ڕێگای ڕۆژنامە و بڵاوکراوە و ڕادیۆ لە ڕێگەی ئەوەی دروشمی ڕاست شان بە شانی خەبات و تێکۆشانی بخەینە ناوخەڵکەوە. لەوەشدا ئێمە توانیومانە بنچینەی ئەوە دابنێین کە بتوانین درێژە بە خەبات بدەین. جۆری چوارەم، بەستراوە بە ئیشی دەرەوە، کە کورد لەم بوارەدا، تائێستا زۆر کەم ئیشی کردوە، ئەویش خەباتە لە بواری دیبلۆماسی‌دا بۆ ئەوەی کە بتوانین زۆرتر دۆست بۆ مەسەلەی کورد پەیدا بکەین، بۆ ئەوەی بتوانین پشتیوانی مەعنەوی دنیا بە دەست بهێنین و بۆ ئەوەی بتوانین دوژمن ڕیسوا بکەین لەو بوارانەدا. لە بواری خەباتی دیبلۆماسی‌دا، بێگومان مەسەلەی تەرکیز کردن لەسەر مافی

رژیمی بەعسی لە عیراقدا بروخێ. بەڵام ئەو گرەوەش دیسان سەری‌نەگرت. کورد نەیتوانی قورسایی خۆی وا بەکار بهێنێ بۆ ئەوەی لە ماوەی شەردا عیراق بروخێنێ، ئەویش هۆزەکەی دەگەڕێتەوە بۆ هۆزی ناوچەیی و هەرێمی و نێودەوڵەتی. واتە نەروخاندنی رژیمی عیراق تەنیا ناگەڕێتەوە بۆ ئەوەی کورد لە عیراقدا خەباتی نەکردووە، یان گەلی عیراق خەباتی نەکردووە بۆ روخاندنی رژیمی بەعسی.

دەوڵەتانی رۆژهەڵات و رۆژئاوا پشتیوانیان لە رژیمی عیراق کرد، بۆ ئەوەی لە بەرامبەر هێرشی ئیسلامی و جمهوری ئیسلامی‌دا نەروخێ و بتوانێ خۆی رابگرێ و رابوەستێ. لەبەر ئەوە ئێمە بە داخەوە کە وەک جولانەوەی کورد ئەو دوو رێگایەی لەبەردەماندا بوو، یەکێکیان رێگای ئەوەی کە بچین پێشی تەواوبوونی شەر لەگەڵ حکومەتی مەرکەزی رێکەوین یان ئەوی تر، رێگای ئەوەی هەموو قورسایی خۆمان بخەینە سەر شەرەکە بۆ ئەوەی کە حکومەتی عیراقی بروخێنین لە هەردوو رێگاکەدا سەرکەوتو نەبووین، بوو بە هۆی ئەوەی ئێستا کارەساتێکی گەورە بەسەر کوردا بێ.

بەڕێنگ: *وەک تۆش گوتت ئێوەش دەتانزانی و گەلێک کەسی تریش دەیزانی کە بەم جۆرە یان بە شێوەیەکی تر شەری عیراق و ئێران هەر رادەوەستا. وەک ئێستا باستان کرد کە دوای راوەستاندنی شەری عیراق و ئێران، عیراق بە هەموو هێزی خۆیەوە هێرش دەکاتە سەر کوردستان. واتە پێش راوەستاندنی شەری عیراق و ئێران ئێوە ئەم شتەتان دەزانی. بۆ پاراستنی ئەو ناوچانەی ئازادکرابوون و لە ژێر دەستی یەکێتی نیشتمانی کوردستان و پارتی دیموکراتی کوردستانی عیراقدا بوو، ئایا بەتێکرا بزوتنەوەی کورد بۆ پاراستنی ئەو ناوچانە و بۆ پاراستنی کوردی ئەو ناوچانە چۆن خۆی ئامادە کردبوو.*

نەوشیروان: ئێمە چیمان بکردایە لەوە زیاتر کە کردوومانە؟ واتە ئەگەر ئێوە لە جێی ئێمە بوونایە چیتان دەکرد؟

بەڕێنگ: *پرسیارەکە ئەوەیە کە چۆن خۆتان بۆ ئەو رۆژە ئامادە کردبوو؟ چونکە دەتانزانی ئەو شەرە تەواو دەبێ.*

نەوشیروان: پرسیارەکەی منیش ئەوەیە، ئەگەر تۆ لە شوێنی ئێمە بوویتایە تۆ چۆن خۆت ئامادە دەکرد؟ چ خۆ ئامادەکردنێک هەیە کە ئێمە نەمانکردبێ و تۆ لە جێی ئێمە بوویتایە دەتکرد.

بەڕێنگ: *بەگوێرەی ئەو دەنگویاسانەی لەوێوە دەهاتن و دەمانبیست بۆ پاراستنی ئەو ناوچانە شتێکی بنەڕەتی نەکرابوو. بۆ نموونە دەمانبیست کە ناوچەی واهەیە جاش و جەیشی شەعبی لە ڕەبایەکاندا بوون و پێشمەرگەش لەو ناوانەدا بە ئازادی هاتووچۆیان دەکرد بێ ئەوەی تەقە لەیەک بکەن، چونکە ئەوانیش زۆربەیان کورد بوون دەنگیان لەیەکتر نەکردوە. هەروەها بۆ پاراستنی گوندەکان پلانی بەرگری چەکدارانە دانەنرابوو گەرچی دەشتانزانی کە حکومەت هێرش دەکا. واتە کاتێ کە هێرش کرایە سەر گوندەکان، بە شێوەیەکی گشتی مرۆڤ دەتوانێ بڵێ، بەرگرییەکی، دیار و لەبەرچاو، لە سەرانسەری کوردستانی عیراقدا نەبوو.*

نەوشیروان: نا ئەوە ڕاست نییە. یەکەم بەلاغە عەسکەرییەکانی حکومەتی عیراقی کە خۆی دەری کردوە باشترین بەڵگەیە لەسەر ئەوەی کە کورد لە مێژووی خۆیدا هێندەی ئەم جارە بەرگری نەکردوە.

کە لە مانگی شوبات، کاتێ کە حکومەتی عیراقی هێرشی هێنا بۆ ئەو ناوچانەی کە سەرکردایەتی یەکێتی نیشتمانی لێبوو کە کەوتۆتە نێوان قەزای چوارتا و سەرچنار و دوکانەوە، ماوەی ٢٥ ڕۆژ بە درێژایی ٧٣ کیلۆمێتر شەڕبوو. لەو شەڕەدا لەلایەن حکومەتی عیراقەوە ٢٧ لیوا بەشداری کرد کە ساڵی ١٩٧٤ هەموو سوپای عیراقی بریتی بوو لە ٢٧ لیوا. دوای ٢٥ ڕۆژ شەر ئینجا توانی سەرکەوی بەسەر ناوچەکاندا. پاش ئەوەی کە تۆپخانەی قورسی بە ئەندازەیەکی یەکجار زۆر بەکارهێنا، چەکی کیمیایی لە ئەندازەیەکی یەکجار زۆردا بەکارهێنا و بوو بە هۆی ئەوەی کە ئاسمانی ناوچەکە هەمووی ژەهراوی ببوو. مرۆڤ نەیدەتوانی تیایدا بژی. لە بەرامبەر چەکی کیمیاییدا تۆش دەبێ یان چەکی کیمیاییت هەبێ یان دەبێ ماسکت هەبێ. چەکی کیمیایی وەک چەکی تر نییە، لە ناوچەی قەرەداغیش، دیسان ئەو شەرانەی کە کردیان عیراق بەلاغی لەسەر دەرکرد. ئەوە سوپای عیراقی و بەلاغەکانی خۆی دەزانێ کە لەو ناوچەیەدا بەرد بە بەرد و شاخ بە شاخ و گوند بە گوند شەریان لەگەڵدا کردون. بەڵام کاتێک لە نێوان دوو هێزدا نا بەرامبەری دروست دەبێ. لە ژمارە و جۆری چەکدا لایەکیان هەر دەیدۆڕێنێ. لە کوردستانی عیراقدا نا بەرامبەری دروست بوو لە نێوان هێزی کورد و هێزی حکومەتی عیراقی‌دا. چونکە هێزی حکومەتی عیراقی لە ساڵی ١٩٧٣ بە دواوە کە نرخی نەوت لە جیهاندا بەرزبۆوە سوپای عیراق بە ئەندازەیەکی زۆر زیادی کرد. ساڵی ١٩٧٥-١٩٧٠ سوپای عیراقی بریتی بوو لە نۆ فیرقە، لە ساڵی ١٩٨٨ دا بریتی بوو لە ٥٢ فیرقە.

بەڵام کاتێک لە نێوان دوو هێزدا نا بەرامبەری دروست دەبێ.
لە ژمارە و جۆری چەکدا لایەکیان هەر دەیدۆڕێنێ.
لە کوردستانی عیراقدا نا بەرامبەری دروست بوو بوو لە نێوان هێزی کورد و هێزی حکومەتی عیراقی‌دا.

لە سەرتای ١٩٧٠دا، تۆپخانەی عیراق لە ١٥٠٠-١٠٠٠ تۆپ تێپەر نەدەبوو. لە ساڵی ١٩٨٨ بە گوێرەی ئەو سەرژمێریانەی مەعهەدی ستراتیژی بەریتانی دەری‌کردبوو یان ئەوەی لە ستۆکهۆڵم دەردەچێ لە ٤٥٠٠ تۆپ و ٤٥٠٠ دەبابە و زیاتر لە ٥٠٠ فڕۆکەی شەری هەبووە. جگە لە هیلیکۆپتەر

www.arsivakurdi.org

«ئەنفالیەتێکی ئەقافی» وەک چۆن لە هەندێ وڵاتی کەمایەتی وا هەیە کە خاوەنی خاکی خۆیان نین بەڵام مافی قسەکردن و گۆرانی وتن و رۆژنامە دەرکردنیان هەیە، مافی کارکردنیان هەیە، بەڵام خاکیان نیە. ئەو نەخشەیەی بەعسیەکان لە ساڵانی سەرەتای حەفتاکانەوە گرتوویانەتە بەر تا ئێستا بۆ ئەوەیە کورد والێ بکەن ئەو بڕیارەی کۆنگرەی سی و هەشتی خۆیان جێبەجێ بکەن کە دەڵێ کورد میوانە لەسەر خاکی عەرەب و وەک میوان دەبێ مامەڵەی لەگەڵ بکەن. دیارە لە چەند ساڵی رابردوودا نەیانتوانیوە بە تەواوی جێبەجێی بکەن بە هۆی شەڕی عێراق و ئێران و بە هۆی ئەوەش کە جوڵانەوەی کوردیش لە کوردستانی عێراقدا ببو بە هێزێکی ئەوتۆ، عێراق نەیدەتوانی پشتگوێی بخات بەڵام پاش راوەستاندنی شەڕ و پێش راوەستاندنی شەڕیش، بە ماوەیەک، بە هۆی بەکارهێنانی چەکی کیمیایی، توانی ژمارەیەکی زۆر لە دێهاتەکانی کوردستان ناچار بکا کە شوێنەکانی خۆیان جێبهێڵن و رووبکەنە شارەکان یان بەرە و دەرەوەی کوردستانی عێراق کۆچ بکەن ئەو نەخشەیە، لە راستیدا ئەگەر چی ئێستا بە بەهانەی ئەوەی کە کورد هاوکاری کردوە لەگەڵ ئێران، بەڵام ئەم نەخشەیە پێش هاوکاریکردنی کورد لەگەڵ ئێراندا دەستی پێکردوە. ئەمە لە ساڵی ۱۹۷۲ دەستیان بە تەعریبکردنی بەشێک لە ناوچەکانی سنجار و خانەقین کرد ئەو کاتە هیچ هاوکاریش نەبوە لەگەڵ ئێراندا.

لە ۱۹۷۵دا، پاش هەرەسی شۆرشی کوردستانی عێراق، دەستکرا بە راگوێزانەوەی شریتی حدودی. هەموو ناوچەکانی سەرسنووری ئێران و تورکیا و سوریا چۆڵکران، کە نزیکەی ۱۵۰۰ هەزار و پێنج سەد گوند بوو.

لە ساڵانی ۱۹۷۹ و ۱۹۸۰ و ۱۹۸۱ و ۱۹۸۲ هەر بەردەوام بوون لەسەر راگوێزانەوە. ئەو گوندانەی کەوتونەتە قولایی کوردستانی عێراقەوە، ئەو گوندانەی دەستیان گەیشتبێ رووخاندویانە. لە ساڵی ۱۹۸٤ دا هەموو گوندەکانی دەشتی هەولێر و کەرکوک و بەشێکی گەرمیانیان رووخاند لەگەڵ هەموو گوندەکانی سەرجادەکان، کە ئەوکاتەش ئێمە هێشتا هیچ هاوکاریەکمان لەگەڵ ئێراندا نەبوو.

واتە مەسەلەی هاوکاریکردن لەگەڵ ئێراندا کراوە بە پەردە بۆ داپۆشتنی تاوانەکانی خۆیان ئەگینا ئەو نەخشەیە بۆ راگوێزان و

ئێوە لە جێی ئێمە بوونایە چیتان دەکرد؟

چۆڵکردنی کوردستان لە پێش شەڕی عێراق و ئێرانیشەوە دەستیان پێکردوە بەپێی ئەو بڕیارەی کاتی خۆی حیزبی بەعس لە کۆنگرەکەیدا داببوی.

بەڕێنگ: *جگە لە رژێمی عێراقیش، لە ئەوروپاشدا بۆچوونێکی وا هەبوو کە کوردی عێراق هاریکاری ئێران دەکەن و کوردی ئێرانیش هاریکاری عێراق دەکەن، لەبەر ئەوەش شەڕی کورد لە کوردستانی عێراق و لە کوردستانی ئێرانیش وەک پاشکۆی شەڕی عێراق و ئێران دەبینرا. سەرەڕای ئەوەش دەگوترێ گوایە شەڕ راوەستاندن لە نێوان عێراق و ئێراندا کارێکی کتوپڕی (مفاجیء) بووە بۆ کوردان... ئێوە دەڵێن چی؟*

ئەوشیروان: راوەستانی شەڕی عێراق و ئێران شتێکی مفاجیء نەبوو. پێشبینی دەکرا. چونکە پێشتر کۆمەڵێ ئەتەوەیەکگرتووکان بڕیاری داببو، ئەو بڕیارەش لەلایەن ئێرانەوە ڕەفز نەکرابوو. ئێران داوای دەکرد هەندێ شتی تیابگۆردرێ، ئەگینا ئێران بە مەبدەئی شەڕ راگرتن رازی بوو. لەبەر ئەوە شتێکی کتوپڕ نەبوو. بەڵام ئێمە وەک کورد لە کوردستانی عێراقدا پێمان وابوو لە ماوەی هەشت ساڵی شەڕدا دوو ڕێگا لە بەردەم کورددا هەیە و ڕێگای سێیەم نییە. یەکێکیان ئەوەیە کە لە ماوەی شەڕدا ئێمە سوودمان وەربگرتایە لە شەڕی عێراق و ئێران، بۆ ئەوەی زۆرترین زەغت لەسەر حکومەتی عێراقی دروست بکەین و عێراق مەجبور بکەین لەگەڵ کورد ڕێکەوتن بکا و هیچ نەبێ لایەنی کەمی مافە ئەتەوەییەکانی کورد بە ڕێگای ئاشتی بسەلمێنێ و ئەوکاتە میللەتی کورد لەگەڵ حکومەتی مەرکەزیدا هاوکاری بکا بۆ ئەوەی کۆتایی بەشەڕی عێراق و ئێران بێ. ئەمە یەکێ لەو ڕێگایانە بوو کە ئێمە جارێک تاقیمانکردەوە، بەڵام لایەنەکانی تری جوڵانەوەی کورد هەموو دژی بوون. ئێمە پێمان وابوو پێشی تەواوبوونی شەڕی عێراق و ئێران چاک وایە کورد لەگەڵ حکومەتی عێراقی ڕێکەوێ و بە ئاشتی کێشەکەی خۆی چارەسەر بکا. بۆ ئەوەی خۆی لە شەڕی بەعسی لابدات و بەعسی نەتوانێ بە هانەی پێبگرێ و لە دوای تەواوبوونی شەڕ بڵێ ئێوە هاوکاریتان لەگەڵ ئێران کردوە و ئەوە بکا بە بەهانە بۆ سزادانی کورد. دیارە ئەم ڕێگایە سەری نەگرت، چونکە ئێمە بە تەنیا گرفانەبەر و لایەنەکانی تر پێیان باش نەبوو. چونکە لایان وابوو لە ماوەی شەڕدا بەعسی دەروخێ. ڕێگای دووەم لە بەردەم کوردا ئەوە بوو کە هەموو قورسایی خۆی بخاتە سەر شەڕی عێراق و ئێران بۆ ئەوەی ئەم ڕژێمە بروخێنێ، چونکە هەموو کورد لە کوردستانی عێراقدا دەیانزانی ئەگەر شەڕی عێراق و ئێران تەواوبێ و سەدام حوسێن بمێنێ، ئەوا ڕژێمی سەدام هەوڵ دەدا بۆ لەناو بردنی نەتەوەی کورد لە کوردستانی عێراقدا.

لەبەر ئەوە ئێمە پێمان باش بوو، پێمان ڕەوابوو، پێمان حەلاڵ بوو، کە وەک کورد نەک لەگەڵ ئێراندا، بەڵکو لەگەڵ هەر دەوڵەتێکی تریش کە شەڕ لەگەڵ عێراقدا بکا هاوکاری یەکەین بۆ ئەوەی ئەو ڕژێمە بروخێ، چونکە کورد، بە ڕوخاندنی ڕژێمەکە دەیتوانی پاریزگاری مافی خۆی بکا وەک بە تەجروبە دەرکەوت. ئەمە لەو ڕژێمانە نییە بڵێی پەند لە ڕابووردوو وەربگرێ، یا لە ماوەیەکدا کە سەرکەوتنێک بە دەست دەهێنێ مەعقول ببردەکاتەوە. ئەمە ڕژێمێکە زۆر مەغرورە بە هەر سەرکەوتنێ زیاتر مەغرور دەبێ، ڕژێمێکی حاقدە بەرامبەر بە میللەتی کورد. ڕژێمێکی شۆڤێنیە، ڕژێمێکە دەیەوێ کورد لەناو بەرێ لەبەر ئەوە حەقی مەشروعی کورد بوو بڕوا لەگەڵ دوژمنی عێراقدا هاریکاری بکا بۆ ئەوەی

www.arsivakurdi.org

پێشکەوتووخوازی لوبنانی لە وتارەکەی خۆیدا بە درێژی باسی کوردی کرد.

لە رۆژانی کۆنگرەدا فرسەتێکی زۆر باش بوو بۆ ئەوەی وەفدی کوردی، لابەلا، پەیوەندی زۆر لەگەڵ وەفدە گرنگەکانی ناو کۆنگرەکە بکا و قسەیان لەگەڵ بکەن دەربارەی مەسەلەی کورد بە گشتی و هەل و مەرجی ئێستای کوردستانی عێراقیان بۆ روون بکەنەوە.

لە بریارنامەی دوایی کۆنگرەکەشدا لە ریزی کێشە هەرێمایەتیەکان (النزاعات الاقلیمیه) دا باسی کورد کراوە. ئێمە پێمان وایە کاتێ ئەو موناسەباتانە دێتە پێشەوە کورد ئەگەر بتوانێ وەک جولانەوەیەکی یەکگرتوو پرۆژەی یەکگرتووی خۆی هەبێ پێشکەشی بکا. بۆ ئەوەی پشتیوانی مەعنەوی ئەوانە بە دەست بهێنێ و لە هەمان کاتدا ئەوە دەبێتە هۆی رەنگدانەوە لەناو پارتییەکانی خۆیاندا.

لە ماوەی سەد ساڵی رابردوودا، ئەوە بۆ یەکەم جارە کە لە بریارنامەی کۆتاییدا ناوی کورد بهێنرێ و بچێتە ناو بەرنامەکانیانەوە.

بەڕێنگ: *جگە لە ئێوە، مەسعود بارزانی وەک نوێنەری بەرەی کوردستانی عێراق، د. قاسملو وەک نوێنەری حیزبی دیموکراتی کوردستانی ئێران بەشداربوون. واتا کورد سێ وەفدی هەبووە لە کۆنگرەکەدا. ئایا پێش هاتنتان بۆ ناو کۆنگرە یەکترتان دیبوو یان نەء؟*

نەوشیروان: کە کاک مەسعود لە دەرەوەیە، ئەو بەرپرسیارە لە کاروباری بەرەی کوردستانی. لەم ماوەیەی کە لە دەرەوە دەبێ کاروباری بەرە بەرێوە دەبا، لە هەمان کاتدا سەرۆکی وەفدی بەرەی کوردستانی بوو، بەڵام ئێمە خۆمان، جگە لەوە، بە جیا، وەک یەکێتی نیشتمانی کوردستان دەعوەت کرابووین، پێمان باش بوو ئامادەی کۆنگرەبین، چونکە گەر وەفدی کوردی زیاتر بێ دەتوانین چالاکی زیاتر ئەنجام بدا. پێشتر هەندێ قسەمان لەناو خۆماندا کردبوو، تەنانەت پرۆژەی بریارنکیشمان ئامادە کردبوو دەربارەی مەسەلەی کورد، دامان بەو کۆمیتەیەی کە لێپرسراوبوو لە دارشتنی بریارەکان. بەڵام بە داخەوە ئەوان پرۆژەکەی ئێمەیان قبوڵ نەکرد. خۆیان هەندێ شتی تریان نووسی. ئەگینا ئێمە پرۆژەیەکی سەربەخۆمان ئامادە کردبوو کە پشتیوانی لە مەسەلەی کورد بکەن. ئەوەیان بەلاوە پەسەند نەبوو. هیچ بریارنکی جیاواز نەدراوە، هەموو بریارەکان بە یەکەوە لە بەیاننامەی کۆتاییدا کۆکراونەتەوە پێشتر قسەمان کردبوو لە نێوان خۆماندا، کەچی بکەین و چی نەکەین.

بەڕێنگ: *ئێستا بڕۆینە سەر باسی کوردستانی عێراق. ئایا دەتوانن بە کورتی باسی باری ئێستای کوردستانی عێراق بکەن؟*

نەوشیروان: زۆرفی ئێستای کوردستانی عێراق شتێکی چاوەڕوان کراوبوو کە وای بەسەر دێ، ئێمە پێمان وابوو کە لە عێراقدا دوو شەر هەیە، یەکێکیان شەری حکومەتی عێراقە لەگەڵ نەتەوەی کورد لە کوردستانی عێراقدا. ئەوەی تریان بریتی بوو لە شەری نێوان عێراق و ئێران. لە ماوەی هەشت ساڵی رابردوودا، شەری عێراق و ئێران لەبەر ئەوەی کە تەماسی هەبوو لەگەڵ بەرژەوەندی هەردوو دەوڵەتە گەورەکەی دنیا و لەگەڵ ولاتانی ئەورووپایی. ببوو بە هۆی ئەوەی کە مەسەلەی کوردی لە عێراقدا تا رادەیەکی زۆر شاردبزوە و کردبووی بە ژێر سێبەری ئەو شەرە قورسەوە و ئەو تاوانانەی حکومەتی عێراق دەیکرد بەرامبەر میللەتی کورد لە پەنای شەرەکەدا داپۆشرابوون. بەڵام پاش ئەوەی شەری نێوان عێراق و ئێران وەستا، سوپای عێراقی دەستی بەتاڵ بوو بۆ ئەوەی کە بتوانێ تەرکیز بکاتە سەر کوردستانی عێراق و ئازاری خەڵکی کوردستان بدات و تەنگ بە هێزی پێشمەرگە هەڵچنن.

ئێستا کە عێراق دەستی بەتاڵ بووە و شەری ئێرانی لەسەر نەماوە کەوتۆتە جێبەجێکردنی پاشماوەی ئەو پلانەی کە لە کۆنەوە دەستی پێکردوە. پلانی راگواستنەوە. بەعسیەکان بۆ پاریزگاری «ئەمنی قەومی» خۆیان کە پێی دەڵێن «الامن القومي العربي» پێیان وایە کە مەسەلەی کورد یەکێکە لەو گیروگرفتانەی کە لە ناوەوەی عێراق بە بەردەوامی هەڕەشەیان لێدەکا، هەر کاتێکیش هەڕەشەیەکی خارجی بی بۆ سەر عێراق دیسانەوە پێیان وایە کورد دەتوانی هاوکاری لەگەڵ ئەو هەڕەشەیە بکا و بیێ بە مەترسییەکی گەورە بۆی. لەبەر ئەوە، لە بری ئەوەی کە رێگای چارەسەرکردنی ئاشتی مەسەلەی کورد بگرنەبەر. واتا لە بری ئەوەی رێگای ئەوە بگرنەبەر کە خواستەکانی گەلی کورد لە عێراقدا بهێنن دی، بە پێچەوانەوە رێگای سەرکوتکردنیان گرتۆتەبەر. ئێمە لە کوردستانی عێراقدا رێگای سەرکوتکردنمان بە سێ وشە کورت کردۆتەوە، یەکێکیان «تەرحیل» واتە راگویزان لە جێگایەکەوە بۆ جێگایەکی تر یەکێکی تر «تعریب»ە واتە لە شوێنەگرنگەکان کورد دەردەکەن و عەرەب دەخەنە شوێنیان، عەرەب دەهێنن سەر خاکی کورد و نیشتەجێیان دەکەن، ئەوی تریش «تەبعیث»ە واتە بە بەعسی کردن، هەوڵ دەدەن هەم کوردی لاواز رابکێشن بۆ حیزبەکەی خۆیان و هەم بیرووباوەری حیزبی بەعس لەناو کوردا بچەسپێنن. لە قۆناخی پەروەردەکردنی منالەوە دەست پێدەکا تا دەگاتە قۆناخی دانیشگا. ئەوانە دەست دەخەنە هەموو سوچێکی ژیانی مرۆڤەوە بۆ ئەوەی کە بیرووباوەری بەعسی بچەسپێنن لە ژیانی کوردا، بۆ ئەوەی کورد وەک نەتەوەیەکی سەرەکی نەمێنێ، بە گوێرەی دەستووری عێراقی، عێراق لە دوو نەتەوەی سەرەکی پێک دی یەکێکیان کوردە ئەوی تر عەرەبە. ئەیانەوێ ئەو وەک واقیع بگۆزن، لە بری ئەوەی کورد لە عێراقدا وەک نەتەوەیەکی سەرەکی بێ بیکەن بە

ئێمە پێمان وابوو پێشی تەواوبوونی شەری عێراق و ئێران چاک وایە کورد لەگەڵ حکومەتی عێراقی رێکەوێ و بە ئاشتی کێشەکەی خۆی چارەسەر بکا.

چاوپێکەوتن لەگەڵ
خەباتگێر نەوشیروان مستەفا

بەڕێز کاک نەوشیروان مستەفا، سکرتێری کۆمەڵەی رەنجدەرانی کوردستان، بۆ بەشداری کردن لە هەژدەمین کۆنگرەی ئینترناسیونال سوسیالیست کە لە رۆژانی ٢٠ تا ١٩٨٩/٦/٢٢ لە ستۆکهۆڵم ئەنجامدرا، هاتبوو بۆ سوێد. بە ناوی گۆڤاری (بەربانگ) ەوە ئەم چاوپێکەوتنەمان لەگەڵدا کرد.

بەربانگ: *کاک نەوشیروان، سەرەتا بە خێرهاتنتان دەکەین، وەک دەزانین بە ناوی یەکێتی نیشتمانی کوردستانەوە بەشداری هەژدەمین کۆنگرەی ئینتەرناسیونال سوسیالیست بوون. ئایا دەتوانن بە کورتی باسی سوود و قازانجەکانی ئەم کۆنگرەیە بکەن بۆ بزوتنەوەی ئازادیخوازی کورد؟*

نەوشیروان: ئینتەرناسیونالی سوسیالیست کۆنگرەی هەژدەمینی بەست و لە هەمان کات موناسەبەتی تێپەربوونی سەد ساڵ بوو بەسەر دامەزراندنی ئەم رێکخراوەدا. لەم کۆنگرەیەدا (١٠٠) سەد حیزب بەشداربوون وەک ئەندام و میوان. ئێمە لە میوانەکان بووین، چونکە ئێمە ئەندام نین. لەناو ئەو حیزبانەی بەشداری کۆنگرەکە بوون، حەڤدەیان لەسەر حوکمن لە هەندێ وڵاتانی تریش گەر چی ئەم حیزبانە لەسەر حوکم نین بەڵام لەو وڵاتانەدا حیزبی دووەمن واتە بە هێزترین موعارەزە و ئەڵتەرناتیڤی حکومەتن ئیحتمالی ئەوە هەیە کە حکومەت بگرنە دەست.

ئێمە وەک جوڵانەوەی رزگاریخوازی میللەتی کورد پێمان باشە هەر موناسەبەتێک لە دنیادا بێتە پێشەوە، هەر کۆبوونەوە و جڤینێک کورد بتوانی دەنگی خۆی پێبگەیەنێ و بتوانێ مەزڵومیەت و خواستەکانی خۆی بە گوێی خەڵک بگەیەنێ بۆ ئەوەی پشتیوانی مەعنەوی ئەو هێزانە بە دەست بهێنێ پێمان کارێکی باشە. لە چوارچێوەی ئەم سیاسەتەدا، ئێمە پێشتر لە گونگرەی پارتی سوسیالیستی فەرەنسی‌دا چەند جارێک بەشدار بووین، لە کۆنگرەی پارتی سوسیالیستی ئیتالی چەند جارێک بەشداربووین. ئەوە بووە هۆی ئەوەی چەند جارێک لەلایەن پارتی سوسیالیستی فەرەنسی و ئیتالی و پارتی کرێکارانی بەریتانیا بریاری باش لەسەر مافی چارەنووسی نەتەوەی کورد دەربچێ و ئەوەش دەبێتە هۆی ئەوەی کە لە لایەکەوە پشتیوانی بۆ جوڵانەوەی کورد بەدەست دەهێنێ و لەلایەکی تریشەوە ئەبێ بە هۆی ئەوەی کە ئەندامەکانی خۆشیان هوشیار ببنەوە سەبارەت بە مەسەلەی گەلی کورد و گەلی کورد بناسن.



لەم کۆنگرەیەدا، لە یەکەم دوو رۆژدا، کە رۆژی ئافرەتانی سوسیالیستی دنیابوو، نوێنەری ئێمە لەوێ بەشداری کرد و رێگایان‌دا قسە بکا لەسەر هەڵ و مەرجی ژیانی ژن و منداڵ لە کوردستانی عێراقدا، توانییان تا رادەیەکی زۆر سۆزی ئەوانەی بەشداری کۆنگرەکە بوون بەلای خۆیاندا راکێشن و بوو بە هۆی ئەوەی باشتر باری ژیانی خەڵک لە کوردستانی عێراقدا و ئەو تاوانانەی کە حکومەتی عێراق بەرامبەر خەڵکی کوردستان دەیکا بزانن.

لە رۆژانی کۆنگرەکەدا، وەفدی کوردی کە (١٠) دە کەس بوون لە کوردستانی عێراق و ئێرانەوە، پەیوەندی زۆرمان کرد بە سەرۆکی هەموو وەفدە بەشدار بووەکان. لەناو ئەواندا گەلێ پارتی و رێکخراوی گرنگ بەشدار بوو بوون، لەوانە پارتی کۆمۆنیستی سۆڤیەتی کە وەکو «مراقب» هاتبوون. لەناو کۆنگرەکە پیارموروا کە شەخسیەتێکی بەناوبانگی فەرەنسایە و پارتی سوسیالیستی فەرەنسی‌یە پەنجەی راکێشا بۆ مەسەلەی کورد و وەک تراژیدیا ناوی برد.

سەرۆکی کۆمسیونی مافی مرۆڤ باکۆفیچ کە کابرایەکی نەمساوییە و شەخسیەتێکی بەناوبانگە، ئەویش لە راپۆرتەکەی خۆیدا لەسەر مافی مرۆڤ لە سەرتاسەری جیهاندا، پەنجەی بۆ کورد راکێشا کە بێبەشن لە مافی مرۆڤ و پێویستە کارێکی وابکرێ کە کوردیش مافی خۆی هەبێ. وەلید جەنبولات سەرۆکی پارتی سوسیالیستی

www.arsivakurdi.org

وەلید جەنبولات: من کـــــوردم



* بەڵێ
– *من کوردم!*
* نا!! کرمانجی دەزانی؟
– *نا، بە داخەوە..... باپیرەگەورەم لە زووەوە کۆچی کردووە بۆ لوبنان.*
* لە کوێوە؟
– *لە کوردستانی تورکیاوە لە شارۆچکەیەکی بچووک بە ناوی کلیس.*
* باشە، وەک کوردێک چ جۆرە هاریکارییەک لە ئێوەوە دەگاتە گەلەکەت؟
– *بۆ کوردی لوبنان، چ هاریکارییەک لە دەستم بێ، دەیکەم. لە بارودۆخێکی وادا لە جیهانی عەرەبی‌دا چی لە تواناماندا بێ هاریکاری کوردی تریش دەکەین. خۆ ئەگەر کوردیش نەبوومایە، وەک مرۆڤێک پشتگیری کوردم دەکرد. چونکە گەلی کورد لەبن زوڵم و زۆرداریەکی بەردەوامدان. ئەو زوڵمەی لە کورد دەکرێ لە سەردەمی مۆدێرن‌دا گەورەترین زوڵمە.*
* ئایا تۆ باوەڕت بە ئازادبوونی میللەتی کورد هەیە؟
– *بەڵێ، بەڵام باوەڕم بە کوردستانێکی سەربەخۆ نییە. ئەوە ئارمانجێکی ریالیست نییە. گۆڕینی سنووری ئەو چەند وڵاتە شتێکی ئاسان نییە. دەبێ میللەتی کورد لەناو سنووری ئەم وڵاتانەدا ئازاد بێ.*

ئامادەکردنی ڕەزائالان

ئەم بابەتە بە کرمانجی ژووروو ئامادەکراوە. دەستەی نووسەران کردوویەتی بە کرمانجی خوارو.

جەنبولات لە باسی باری ڕۆژهەڵاتی ناوەڕاست‌دا گوتی: کێشەکانی ڕۆژهەڵاتی ناوەڕاست بە ژماردن تەواو نابن. من تەنیا لەسەر سێ کێشەی بنەڕەتی دەدوێم: لوبنان، فەلەستین و گەلی کورد.

جەنبولات لە پەیانی لوزانەوە دەستی پێکرد، باری کوردستانی عێراق، بەکارهێنانی چەکی کیمیایی، وێرانکردنی گوندەکان، ڕاگواستنەوەی یەک ملیۆن کورد. ئەمانەی یەک بە یەک ڕوونکردەوە.

لە کۆتایی وتارەکەی خۆیدا، وەلید جەنبولات، داوای لە ئینتەرناسیونال سوسیالیست کرد کە ڕۆژی ١٦/مارت/١٩٨٨، ڕۆژی بوردومانکردنی هەڵەبجە بە چەکی کیمیایی بکرێ بە ڕۆژێکی جیهانی لە دژی چەکی کیمیایی.

ئایا لەناو ٨. ئەندام‌دا بۆ بە تایبەتی وەلید جەنبولات بەم جۆرە باسی کێشەی کوردی کرد؟ دەبێ دەردی چی بێ؟ ئێمە ئەم پرسیارەمان لێکرد، لە وەلامدا گوتی:

– *دەردی من چی بوو؟*

لە ٢٠-١٩٨٩/٦/٢٢ دا هەژدەهەم کۆنگرەی ئینتەرناسیونال سوسیالیست لە ستۆکهۆڵم سازکرا. جگە لە ٨. پارتی ئەندام، ٢. پارتی چاودێر (مراقب-مشاور) و میوان ئامادەی بوون، لە ناو ئەواندا نوێنەری بەرەی کوردستانی عێراق بە سەرۆکایەتی مەسعود بارزانی، نوێنەری حیزبی کوردستانی ئێران، د. عەبدولڕەحمان قاسملو و نوێنەری یەکێتی نیشتمانی کوردستان نەوشیروان مستەفا بەشداری کۆنگرە بوون.

وەلید جەنبولات، سەرۆکی پارتی سوسیالیستی پێشکەوتووخوازی لوبنان لە وتاری خۆیدا بە درێژی باسی باری کوردستانی کرد. هەروەها نوێنەرانی پارتی سوسیالیستی فەرەنسا و نەمسا باسی کوردیان کرد.

لە بەیاننامەی کۆتایی کۆنگرەدا بە ڕستەیەک باسی کێشەی کورد کرا کە نووسراوە: «..... زۆرداری لەسەر کەمایەتی کورد وەک ڕاستیەکی تراژیدی بەردەوامە».

نوێنەرانی ڕێکخراوە کوردییەکان لەو باوەڕەدا بوون کە کۆنگرەی ئینتەرناسیونال سوسیالیست «بەڵایەنی کەمەوە» پشتگیری خۆی بۆ بزوتنەوەی نەتەوایەتی کورد پێشکەش دەکات.

دوای دەرچوونی بەیاننامەی کۆتایی کۆنگرە، کە مرۆڤ لە دەرەوەی هۆڵی کۆنگرە چاوی بەو نوێنەرانە دەکەوت، ڕاستەوخۆ نارازی بوونیانی بۆ ئاشکرا دەبوو «بەڵام هێشتا دەیانگوت»: «لە هیچ چاکترە».

لەناو میوانە کوردەکاندا تەنیا کەسێک (لە بەشی ئینتەرناسیونالی ژنان دا) بواری قسەکردنی دەست کەوتبوو. ئەویش هێزۆ تاڵەبانی بوو. هێزۆ تاڵەبانی سێ دەقیقە تەنیا باسی باری ژیانی منداڵانی کوردی کردبوو. هیوادار بوو کە ئینتەرناسیونالی ژنان لە بەیاننامەی کۆتایی خۆیدا باسی ژنان و منداڵانی کوردیش بکا. بەڵام بە داخەوە لە بەیاننامەی کۆتایی‌دا یەک وشەش لەم بارەیەوە نەبوو.

هەروەک نوێنەرە کوردەکانیش باسیان دەکرد، بەشێکی زۆری وتارەکەی وەلید جەنبولات لەسەر کێشەی کورد بوو.

تاوانبار بە کوشتنی ئۆلۆف پالمێ



لەکاتی کوشتنی ئۆلۆف پالمێی سەرۆک وەزیرانی پێشووی سویدەوە، واتە ١٩٨٦/٢/٢٨ تا ئەم دواییە، پۆلیسی سوێدی بێهۆدە بە دوای تاوانباردا دەگەڕا. لەم ماوە درێژەدا زۆر کەس و لایەن تاوانبار کران و گومان لە زۆری تریش کرا. ئاشکرایە پرۆسکی ئەم ئاگری تاوانبارکردنە بە تۆندی بەر کورد کەوت، چونکە پەنجەی تاوان بۆ لایەنێکی کوردستانی درێژ کرابوو.

بەڵام لە ١٩٨٩/٧/٢٧دا، دادگای مەدەنی ستۆکهۆڵم کابرایەکی چل و دووسالی بە ناوی Christer Petterson تاوانبار کرد بە کوشتنی ئۆلۆف پالمێ و حوکمی ئەبەدی دا.

ناوبراو لە رۆژی ١٩٨٨/١٢/١٦دا لەلایەن پۆلیسەوە دەستگیرکرابوو، تا رۆژی دادگایی کردنی بووە هۆی پەیدابوونی گفتوگۆیەکی دوور و درێژی هەمە لایەنە لەناو کۆمەڵگای سویدیدا. ئێستا دوای حوکم دانیشتی نزیکەی دوو لەسەر سێی خەڵکی سوێدی لەو باوەڕەدان کە ئەم پیاوە تاوانبارە راستەقینەکە نییە و کراوەتە قوچی قوربانی بۆ کۆتایی هێنان بە مەسەلەکە، هەروەها هەندێک وەک (دریفوس)ی سوێد لەقەلەمی دەدەن.

هەروەها سەرەڕای ئەوەی کە Lisbeth Palme ی خێزانی ئۆلۆف پالمێ و چەند کەسی تر لە دژی Christer Petterson شاهیدییان داوە،بەڵام خۆی هێشتا نکولی لەو تاوانە دەکا.پارێزەرەکەشی داوای کردوە کە مەحکەمەی ئیستئناف Hovrätt لەم مەسەلەیە بکۆلێتەوە، ئەم داوایە پەسەند کراوەو رۆژی ١٩٨٩/٩/٧ ئەم کارە ئەنجام دەدرێ.گەر لەوێش سەرنەکەوێ، رەنگە مەسەلەکە بگەیەنرێتە دادگای باڵای سوێدی Högsta Dom+stol .ئەگەر لە کۆتاییدا Christer Petterson هەر وەک تاوانبار بناسرێ، ئەوا ئیتر کۆتایی بەو گێرمە و کێشە پڕ سەیر و سەمەرەیەی مەسەلەی کوشتنی ئۆلۆف پالمێ دەهێنرێ و ئەو کەس و لایەنانەی تاوانبار کرابوون دەتوانن پڕ بە سیبەکانیان بە ئازادی هەناسە بدەن. کە ئەمە بە پلەی یەکەم کورد، بە تایبەتی کوردەکانی سوێد دەگرێتەوە، کە مۆری تیرۆریست لە ناوچەوانیان درابوو.

بەربانگ

کۆرێک لەسەر باری ئیمرۆی کوردستانی عێراق

بە سەرپەرشتی فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکان لە سوێد، رۆژی ١٩٨٩/٧/٢٩ خەباتگێڕ سامی عەبدولڕەحمان ئەندامی سەرکردایەتی بەرەی کوردستانی و سکرتێری پارتی دێموکراتی گەلی کوردستان کە بۆ سەردانێکی کورت هاتبوو بۆ ستۆکهۆڵم، کۆرێکی پێشکەشکرد سەبارەت بە باری ئیمرۆی بزوتنەوەی ئازادیخوازی گەلەکەمان لە کوردستانی عێراقدا.

سەرەتا بە دەقیقەیەک ڕاوەستان بۆ گیانی شەهیدانی کوردستان، سەرۆکی فیدراسیۆن کەیا ئێزۆڵ کۆڕەکەی کردەوە و پاشان خەباتگێڕ سامی عەبدولڕەحمان بە دوور و درێژی باسی باری دژوار و ئالۆزی ئێستای کوردستانی عێراق و درێندایەتی ڕژێمی عێراقی کرد.

لە کۆتایی کۆڕەکەشدا وەڵامی پرسیارە ئامادەبووانی دایەوە. پتر لە سێسەد کەس ئامادەی ئەم کۆڕە بوون کە زۆرێکەی سێ سەعات و ئیوی خایاند.

دوای کۆڕەکە بە ناوی (بەربانگ)ەوە چاوپێکەوتنێک لەگەڵ هەڤاڵی ناوبراو کراوە کە لە ژمارەی داهاتوودا دەخرێتە بەردەستی خوێنەران.

شایانی باسە فیدراسیۆن بەڵێنی لە شەهیدی نەمر د. قاسملو وەرگرتبوو کە لە داهاتوویەکی نزیکدا، لەسەر هەمان شێوە سەبارەت بە کوردستانی ئێران لە ستۆکهۆڵم کۆڕێک پێشکەش بکا، بەڵام جێی داخە ئەم ئاواتە نەهاتە دی.

نەمری بۆ شەهید د. قاسملو



نەمری و سەربەرزی بۆ شەهیدانی کوردستان
د. عەبدولڕەحمانی قاسملو، کاک عەبدوڵڵای
قادری، د. فازیل مەلا مەحمود

بەربانگ

لە ڕۆژی ١٩٨٩/٧/١٣ خەباتگێران دوکتۆر قاسملو سکرتێری حیزبی دیموکراتی کوردستانی ئێران و کاک عەبدوڵڵای قادری ئەندامی کۆمیتەی ناوەندی و نوێنەری حیزبی دیموکراتی کوردستانی ئێران لە دەرەوەی وڵات و دوکتۆر فازیل مەلا مەحمود کە نیشتمانپەروەرێکی دڵسۆز بوو، پێکەوە بە پیلانی دوژمنە داگیرکەرەکانی کوردستان لە شاری ڤیەنا شەهید کران.

شەهیدی نەمر، د. عەبدولڕەحمانی قاسملو سەرکردەیەکی مەزنی تێکۆشەر و چالاک و ئازاو جەسوور و کۆڵنەدەری گەلەکەمان بوو کە لە تەواوی ژیانی خۆیدا دڵسۆزانە لە خەباتدا بووە لە پێناوی ئازادی و سەرفرازی کورد و کوردستاندا.

د. قاسملو لە مێژووی پڕ لە خەباتی سەخت و خوێناوی و درێژ خایەنی کوردستاندا، وەک شێخ سەعیدی پیران و شێخ مەحمودی حەفید و پێشەوا قازی محەمەد و مستەفا بارزانی تا هەتایە بە زیندوویی دەمێنێتەوە و لە دڵ و دەروونی چەوساوەکانی گەلە ستەمدیدەکەماندا دەژی.

گەلی کورد ئەم تاوانە لەبیر ناکا، تۆڵەی خوێنی ئەو شەهیدانە لە دوژمنان دەستێنێ. تاوانبار هەر لایەن یان هەر دەوڵەتێک بێ دوژمنی گەلی کوردە، دوژمنی مرۆڤایەتی و ئاشتی و ئازادی و دیموکراسییە، ئەو تیرۆریستانە ڕیسوا و تاوانبار و نەفرەت لێکراون.

دیارە شەهیدبوونی د. قاسملوی نەمر لەم بار و زروفە ئاڵۆزەی کوردستان و ناوچەکەدا زیانێکی مەزن بوو نەک تەنیا بۆ کوردستانی ئێران، بەڵکوو بۆ

تەواوی بزوتنەوەی ئازادیخوازی کورد لە سەرانسەری کوردستانی پارچە پارچەکراوی داگیرکراودا. بۆیە گومان لەوەدا نییە کە پڕکردنەوەی شوێنی چۆڵی ئەو شەهیدە نەمرە و هاورێکانی باشترین یا دواشت بۆ ئەم شەهیدانە و گشت شەهیدانی کوردستان بەردەوام بوون و سوورِبوونە لەسەر خەبات دژی داگیرکەران.

با یادی نەمر د. قاسملو هاندەر بێ بۆ دڵسۆزانی کوردستا بۆ زیاتر لەیەکتر نزیک بوونەوە و خەباتی هاوبەش دوورکەوتنەوە لە ناکۆکییە لاوەکییەکان و دەست بدە دەستی یەکتر بۆ خەباتی ئازادیخوازانە تا گەیشتن بە گشە ئامانجەکانی گەلە چەوساوە و بەشخوراوەکەمان.

www.arsivakurd.org

لەم ژمارەیەدا

بەشی کرمانجی ژوورو:

٣ د. قاسملو هات شەهید کرن.
٤ کوردین سۆڤیەت دۆزا مافێ خۆ دکەن- بابی نازی.
٥ رەوشا کوردان ل ئازربیجانا سۆڤیەت- شاکرۆی محویی.
٨ جەزای موئەبەد ژ بو کریستەر پیتەرشون.
٩ هەڤپەیڤین بە نەوشیروان مستەفا پا.
١٤ سترانا کوردی- محمد عەزیز زەکی.
١٦ لاوژنک ژ دیوانخانا کالێن مە.
١٧ رەوشا کوردان ل ولاتێن سکەندناڤیا، عومەر شێخ موس.
١٩ رەوشا کوردان ل هزلەندا - باران.
٢٠ رەوشا کوردان ل ئەلمانیای رۆژئاڤا- عەلی توکو.
٢١ شیعر - حیکمەت هروری.
٢٢ ترشک - گۆشەی گالتە و گەپ - مامۆستا و مەحمود لەوەندی.
٢٤ بەربانگامە - گۆشەی زارۆکان - ئەحمەد جانتەکی.
٢٦ چیرۆک - لوقمان پۆلات.

بەشی زازاکی

لاپەرە ٢٧-٣٠.

بەشی کرمانجی خواروو:

٥٧ نەمری بۆ شەهید دکتۆر عەبدولرەحمانی قاسملو.
٥٦ تاوانبار بە کوشتنی ئۆلۆف پالمێ.
٥٥ وەلید جەنبولات: من کوردم.
٥٤ چاوپێکەوتنێک لەگەڵ خەباتگێر نەوشیروان مستەفا.
٤٨ با!! با!! کوردی زمانە - حەسەنی قازی.
٤٧ نامەی کوردە ئاوارەکانی پاکستان.
٤١ ئۆتۆبیۆگرافیایەکی کورت- وەرگێرانی سەلاح رێبوار.
٣٩ محەمە ئەمین زەکی و دوو تەقەلای بێ سوود- مەهاباد کوردی.
٣٥ کورتە چیرۆک - کەژاڵ یا لینا - ج. ماڵە.
٣٣ شیعر- دڵم بۆ باخچە دەسوتێ - فەروخی فەروخزاد.

بەربانگ

ئۆرگانی فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکان لە سوێد

بەرپرسیار
کەیائیزول

سەرنووسەر
دارا رەشید

دەستەی نووسەران
ئاسی رەباتی ئاسۆ گەرمیانی
م. مایی میرهەم بەگیت
خەلیل دهۆکی ن. کریف
س. رێنفینگ

تاپوتەی سالانە: ١٠٠ کرۆنی سوێدیە
بۆ دەرگاکان ٢٠٠ کرۆنی سوێدیە

دەستەی نووسەران بەرپرسیار نیە لە نووسین و وتارەکانی فیدراسیۆن و لەو نووسینانەی بە ئیمزای خاوەنەکانیان بلاودەکرێتەوە.

ناونیشان:

BERBANG
Box 45205
104 30 STOCKHOLM

تەلەفۆن:

08- 668 60 60

پۆستگیرۆ:

64 38 80-8

پیتچنینی نووسینگەی تارا

Box 2068
172 02 Sundbyberg

ژمارە ٥٩ ساڵ (٨)
تەموزی ١٩٨٩

www.arsivakurdi.org





کاریکاتیر - هونەرمەند دلاوەر - کوردستانی سوریا.

www.arsivakurd.org

نەوشیروان مستەفا

بەربانگ

ژمارە ٥٩ گۆڤاری فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکانە لە سوید سالْ «٨»

نەمری بۆ خەباتگێڕ د. قاسملو



نامەی کوردە ئاوارەکانی پاکستان

www.arsivakurdi.org